


## Dîyarbekir, şîr û şekir

**BAJARÊ** qedîm ê ku her tim bûye delala ber dilê hov û talankeran û xwedî jê bêpar mane. Bi sedan salan, her carê hinek talankerên ku niha dîroknivîs navê şaristaniyê li wan dikin, bi zora şûrê bajar bi dest xistine û hatine li qesr û qonaxên wê rûniştine.

RÛPEL 06






## Salman Rushdie: Firarê dîn, mehkûmê edebiyatê

**Ez** dibêm sala 2005an bû. Li zanîngeheke li Enqerayê xwendekar bûm. Diviya min lêkolînek li ser romanekê bikira û meqaleyek di heqê wê de binivîsanda. Mamosteyê me yê dersa Romanê lîsteyek amade kiribû...

RÛPEL 12



## Pembûyê Rihayê bi qelîte û paqijbûna xwe balê dikişîne

**Li** bajarê Rihayê çandiniya gelek mehsûlan tê kirin. Cotkarên pembû yên Rihayê destnîşan dikin ku li Rihayê ji ber ku him pirsgirêka avê hinekî çareser bûye him jî cotkarî bi awayê profesyonel tê kirin, her ku diçe cotkariya pembû jî pêş dikeve.

RÛPEL 13



# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 28
24-30 TÎRMEH 2017
www.basnews.com






BIRYAR HAT DAYÎN: S2

# 1Ê MIJDARÊ ROJA HILBIJARTINAN E

### > HILBIJARTIN, MEHEK PIŞTÎ REFERANDÛMA SERXWEBÛNÊ NE

Li Herêma Kurdistanê piştî diyarbûna dîroka pêkanîna referandûmê, roja encamdana hilbijartinên serokatî û parlamentoyê jî diyar bû. Li gor fermana Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî, hilbijartinên serokatî û parlamentoyê wê di 1ê Mijdarê de pêk bên. Hibijartinên Kurdistanê 4 salan carekê pêk tên û herî dawîn di 2013an de pêk hatibûn.

### > HEWLDANÊN BO ÇALAKKIRINA PARLAMENTOYÊ BERDEWAM IN

Herêma Kurdistanê ji aliyekî ve amadekariyên xwe yên ji bo referandûma serxwebûnê û hilbijartinên serokatî û parlamentoyê dike û ji aliyê din xebatên ji bo çalakkirina parlamentoya Kurdistanê dike. Serok Barzanî bi nêzîkbûna referandûmê, bang li hemû aliyên siyasî kiribû ku kom bibin û parlamentoya Kurdistanê çalak bikin.




EKREM ÖNEN >02

Referandûm û Medya I



JAN DOST >06

Pirsgirêka Elifbêyan



FIRAT CEWERÎ >09

Serpêhatiya kitêbxaneyekê


S3 SELMA GÜRKAN:



## Referandûm ji bo dahatûya Rojhilata Navîn girîng e

Seroka Partiya Kedê Selma Gürkan li ser referandûma serxwebûna Kurdistanê û geşedanên li herêmê bersiva pirsên me da. Gürkan dibêje pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê ji bo dahatûya erdnigarya Rojhilata Navîn girîng e.

S4 HOZAN BRADER:



## Miletekî bê dewlet, mîna sêwîyen berdîwar e

Kurd divê mal bi mal bigerin ji bo ku herin ser sindoqên referandûmê û hemû bêjin; 'Erê' em dewleta xwe dixwazin." Kurd divê di warê diplomasîyê de jî nesekin in. Li welatên derve derî bi derî bigerin û piştgiriyê ji dewletan bixwazin.

S07 RAGEŞIYA DYA - ÎRANÊ



## Roj li DAÎŞê ava bibe, dibe ku şerê DYA û Îranê dest pê bike

Li gora Amerîkayê, Komara 'Îslamî' ya Îranê, mezintirîn metirsî ye li Rojhilata Navîn ku gefê li hemû cîhanê dixwe. Rast e Trump piştî ku hate ser kar, gelek ji sozên xwe ji bîr kirin yan jî nermtir bû, lê di mijara Îranê de heman siyasetê bi kar tîne ku propagandeya wê kiribû.



**EKREM ÖNEN**

## Referandûm û Medya I

Înformasyon – Desînformasyon, Propaganda - Kontrpropaganda, Manîpulasyon û Şerê Psîkolojîk

Di van demên dawî de bi aktuelbûna referandûmê pirsa “medya û referandûmê” ket rojeva kurda. Ji bo hemû welatan medya roleke gelekî girîng dileyize her wek adet tê gotin ku medya di welatekî de rola 4emîn dileyize, lê bi ya min di serdema me de rola yekemîn dileyize, evê ya ji bo me kurda di demên derbasbûyî de, her weha di van bûyerên dawî de, bi teybetî di pirsa referandûmê de careke din ji me re da îspat kirin ku rola wê çiqas girîng e. Dema îro xêrnexwazê miletê kurd ku çeka wan a herî mezin medyaye li hember kurda di pirsa referandûmê de bikartinînin, civata kurd manîpule dikin, bi desîformasyonê û propaganda yê şerê psîkolojîk li hember miletê kurd dimeşînin da ku rêjeya erê di referandûmê de kêm be an referandûm bi tevayî çênebe, gelo “Medya Kurdî” çiqas dikare civata kurd bi Kontrpropagandayê li hember propaganda Medya a xêrnexwazê kurda, kurda biparêze? Çi tedbîrên wan hene ku ew bi xwe jî ne kevin bin tesîra propagandaya medya xêrnexwazê kurda? Metodên “Medya Kurdî” bikartînin çiqas dikarin miletê kurd mobilîzeyî referandûmê bikin ku rêjeya erê bilind be? Medya kurdî wê bikaribe raya giştî a kurdî li dor fikreke netewî saz bike û rojeva kurda ew tayîn bike? Ezê bixwazim van pirsa û hinekî din di vê nivîsa ku wê çend beş be şîrove bikim. Weke em dizanin di van demên derbasbûyî de şerekî mezin li hember miletê kurd hat dayîn weke şerê li Şingalê, şerê li Mûsilê “Medya Kurdî” îmtehaneke ne serkeftî dan. Bes pirsa referandûmê ji bo miletê kurd ji hemû pirs û bûyerên derbasbûyî girîngtir e, wê “Medya Kurdî” di pirsa referandûmê de çawa be? Her çiqas niha hinek işaret hene jî lê wê di demên nêzîk de eşkere bibe bê ka wê çawa be? Wek qaîdeyek unîversal li hemû welatan sê qonaxên medyayê hene: 1- Qonaxa medya partîtî, 2- Qonaxa medya profesyonal, 3- Qonaxa medya komersîal (ticarî). Îro li kêm welatan medya qonaxa pêşî a partîtî maye, pir heyf li Kurdistanê hin jî di qonaxa medya partîtî de ye. Medya partîtî di demên berê de roleke gelekî mezin ya pozîtîv di pêşketina rojnamegeriya kurdî, sazkirina şuûra netewî û xurtkirina tekoşîna rizgariya netewî lîstin. Weke mînak rola Radyoya Dengê Komara Kurdistanê (Mahabad) a 30ê Nîsana 1946an bi beyana rehmetiyê Qadî Mihemed dest biweşanê kir. Qadî Mihemed di beyana xwe de behsa girîngiya medyayê di civata kurd de dike, rola radyoya dengê Kurdistana Iraqê a di 28ê Gulana 1963an dest bi weşanê kir, ku studyoya wê di şikefta Gerdareş li nêzî gundê Mayad bû. Di weşana roja yekemîn de rehmetiyê Mistefa Barzanî gotarek xwend û di gotara xwe de destê aştî û biratiyê dirêjî gelê ereb kir her weha doza rewa ya miletê kurd da diyar kirin. Her weha rola radyoya dengê gelî Kurdistan ku di 21ê Adarê de roja Newroza 1979an dest bi weşanê kir. Vê radyoyê jî bi beyana Mam Celal dest biweşanê kir Mam Celal newroza gelê kurd pîroz kir û doza gelê kurdî  rewa da diyar kirin. Em nikarin rola van medya a pozîtîv jibîr bikin. Her weha em dikarin gelek mînakên din bidin ku medya partîtî roleke gelekî mezin di medya kurdî de lîstiye. Kurda çiqas girîngî dida medyayê ewqas jî dijminê kurda girîngî dane medya li dijî kurda, çi doh çi îro. Wek mînak di tifaqa 11ê Adara 1970î de a bi rejîma Iraqê re ku ji 15 benda pêk dihat benda 11 li ser medyayê bû. Hikûmeta Bexdayê ji bo kontrolê xwestiye ku radyoya dengê Kurdistanî Iraq bi radyoya navendî a Bexdayê ve girêdayî be. Divê bê zanîn ku demê berê kurda ne wek niha di studyoyên luks û bi teknolojiya pêşketî weşan dikirin li şikeftan studyo ava dikirin. Lê dikarim bêjim ji medya niha bi bandortir bû her çiqas ew medya jî hizbî bû bes weşanên wan giranî li ser xurtkirina şuûra netewî û sazkirina raya giştî ya kurdî bê desînformasyon bû. Lê medya jî wek qanûnê tebîetê çawa her serdemek protsesek nû bi xwe re tîne, medya jî li gor pêşketina civakî, aborî, kulturî û teknolojî ji qonaxekê derbasî qonxeke din dibe. Ev protsesa li her welatekî di periyodên cuda de derbas dibe. Li Kurdistanê ji bo ji Medya partîtî derbasî medya profesyonal bibe niha asê bûye. Belkî yek ji pirsgirêkê medya kurdî ya mezin ev e. Ji bo ku medya kurdî bikaribe ji medya partîtî derbasî medya profesyonal bibe hewcedarî bi rojnamevanê profesyonal heye. Ji ber nabe mirov bi metodên berê di serdemek nû de kar bike, serdemên nû metod û mirovên nû dixwaze, îro jî civata kurd di qonaxek nû de ye, bi pêşketina civakî, kulturî, aborî û teknolojî, civata kurd hewceyî bi medyake profesyonal ku bersivê civata kurd bide heye.

Nivîs dewam dike.




Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

Biryar hat dayîn:

# 1ê Mijdarê roja hilbijartinan e



“Di 6ê Mijdarê de maweya heyama hilbijartinên parlamentoyê tijî dibe. Ji ber wê yekê beriya xilasbûna maweyê diviyabû dîrok bihata destnîşankirin ku hilbijartin bên  pêkanîn. Hilbijartin him ji bo jinavbirina kêşeyên heyî û him ji bo diyarbûna îradeya siyasî, demokratîk û yasayî ya miletê Kurdistanê encamdana hilbijartinan girîng e û pêdivî pê heye.”



MURAT ÖZDEMİR

Li Herêma Kurdistanê ku 25ê Îlonê referandûma serxwebûnê wê pêk were, biryar hat standin ku di 1ê Mijdarê de jî hilbijartinên serokatiyê û parlamentoya Kurdistanê pêk werin. Xelkê Kurdistanê di sala 2017an de bo sê caran wê biçe  ser sindoqan. Kurdistanî di 25ê Îlonê de ji bo diyarkirina çarenivîsa xwe û pêşeroja dê biçin ser sindoqan û dê referandûma serxwebûnê were encamdan. Bi fermana nû ya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ya li ser destnîşankkirina dîroka hilbijartinên serokatî û parlamentoyê, xelkê Kurdistanê mehek piştî referandûmê, di 1ê Mijdara 2017an de vê carê wê ji bo serokatî û endamên parlamentoyê berê xwe bide ser sindoqan.

Partiyên siyasî yên li Herêma Kurdistanê di bin serpereştiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî de 7 Hezîranê civînek pêk anîbûn. Di vê civînê de partiyên siyasî û Serokê Kurdistanê Barzanî biryar standibûn ku referandûma serxwebûnê ku ev sed sal in miletê Kurdistanê li bendê ye, dê di 25ê Îlonê de pêk bê û demildest dest bi amadekariyan kiribûn. Di vê çarçoveyê de ji bo gotûbêjkirina referandûma serxwebûnê li gel dewletên cîran, dewletên cîhanê û Bexdayê biryara avakirina komîteyan jî hatibû wergirtin. Serok Barzanî ku beriya destnîşankirina dîroka referandûmê jî di nav hevdîtinên girîng de bû, piştî biryara pêkanîna referandûmê asta dîplomasiya xwe ya bilindtir kir û derbasî Ewropayê bû. Serok Barzanî ku di vê serdana xwe de wek serokdewletekê û tenê bi Ala Kurdistanê hat pêşwazîkirin, li Brûksela navenda Ewropayê axaftineke dîrokî kir û di vê gotara xwe de ji welatên Ewropa û cîhanê re ragihand ku ‘serxwebûn mafê rewa yê miletê Kurd e’.

Bi fermana nû ya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ya li ser destnîşankirina dîroka hilbijartinên serokatî û parlamentoyê, miletê Kurdistanê mehek piştî referandûma serxwebûnê, di 1ê Mijdara 2017an de vê carê wê ji bo serokatî û endamên parlamentoyê berê xwe bide ser sindoqan.

**Komsîyona Serbixwe ya Hilbijartinan amade ye**

Komîsyona Bilind ya Hilbijartinan û Referandûmê jî beriya niha eşkere kiribû ku amadekarî û xebatên wan yên ji bo pêkanîna her sê hilbijartinan berdewam dikin û wê her sê hilbijartin jî ku ji bo çarenivîsa miletê Kurdistanê xwedî girîngiyên mezin in, wê bi serkeft û bêkêmasî biçin serî. Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî ji bo pêkanîna referandûm û hilbijartinan, bo komîsyona serbixwe ya hilbijartinan bûdçeyek veqetand.

**“Ji bo jinavbirina kêşeyan pêdivî bi hilbijartinan heye”**

Herêma Kurdistanê ji aliyekî ve amadekariyên xwe yên ji bo referandûma serxwebûnê û hilbijartinên serokatî û parlamentoyê dike û ji aliyê din xebatên ji bo çalakkirina parlamentoya Kurdistanê dike. Beriya niha hatibû ragihandin ku Serok Barzanî bi nêzîkbûna referandûma serxwebûnê, xwastiye ku bi beşdarbûn û pêşniyazên hemû aliyên siyasî paramentoya Kurdistanê were çalakkirin.

Akademîsyen û nivîskar Omer Nuredînî li ser diyarbûna dîroka hilbijartinan û hewldanên çalakkirina parlamentoyê ji Basê re axivî. Nuredînî dibêje Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî li gor yasa û erkên xwe dîroka hilbijartinên serokatî û parlamentoyê diyar kir û axaftina xwe wiha didomîne: “Di 6ê Mijdarê de maweya heyama hilbijartinên parlamentoyê tijî dibe. Ji ber wê yekê beriya xilasbûna maweyê diviyabû dîrok bihata destnîşankirin ku hilbijartin bên  pêkanîn. Di 1ê Mijdarê de wê hilbijartinên serokatî û parlamentoyê bi hev re werin encamdan. Him ji bo jinavbirina kêşeyên heyî û him ji bo diyarbûna îradeya siyasî, demokratîk û yasayî ya miletê Kurdistanê encamdana hilbijartinan girîng e û pêdivî pê heye.” Nuredînî li ser çalakkirina parlamentoya Kurdistanê jî wiha diaxive: “Ji bo çalakkirina parlamentoyê pêdivî bi îradeye siyasî heye. PDK bi hewl û xebatên xwe nîşan dide ku xwedî vê îradeyê ye. YNK jî germ li vê mijarê dinêre. Çalakkirina parlamentoyê wê karîgeriyeke gelekî girîng û erênî li referandûma serxwebûnê jî bike. Divê partiyên siyasî, nemaze jî partiyên di parlamentoyê de ji bo çareserkirina vê kêşeyê li hev bicivin û parlamentoyê çalak bikin. Vebûna parlamentoyê wê bandoreke erênî li ser hemû aliyan bike.”

**“Barzanî aktorê sereke ye”**

Li ser mijara çalakkirina parlamentoya Kurdistanê parlamenterê YNK Dilêr Mawetîm, mercê Goranê yê derbarê Barzanî de bi van gotinan rexne kir: “Mesûd Barzanî di qada siyasî ya Kurdistanê de aktorekî sereke ye. Di vê heyama ku referandûm û mijara serxwebûna Kurdistanê di pêşiya me de ne, divê bêyî şert û merc biryar li ser çalakkirina parlamentoyê bê dayîn. Çalakkirina parlamentoyê bi awayekî bêmerc wê gelek tiştan ronî bike.”

**“Goran naxwaze parlamento çalak bibe”**

Endama Komîsyona Yasa yê PDKê jî di daxuyaniya xwe ya li gel Basê de gotibû ku Goran naxwaze parlamento çalak bibe û wiha pê de çûbû: “Eger armanca Goranê çalakkirina parlamentoyê bûya, wê pêşniyaza PDKê ku hêvîyek ligel miletê Kurdistanê ava kir, red nedikir û wê daxwaza gûftûgoyan bikira.”

**“Wê zelal bibe ka Goran çi dixwaze”**

Parlamenterê Yekgirtu Hacî Karwan jî diyar kiribû ku eger parlamento çalak bibe, wê hemû aliyên siyasî bi hev re yasa derxistana û li ser vê mijarê wiha dibêje : “Lêbelê tê dîtin ku di meseleyê de hincet hene. PDKê ji bo vê meseleyê însîyatîf wergirt û bi vî awayî dê hincetên Goranê ji holê rake. Niha wê bi zelalî derkeve holê ka Goran çi dixwaze.”

**Hilbijartin çar salan carekê pêk tên**

Hilbijartinên Kurdistanê di çar salan de carekê pêk tên û herî dawî di sala 2013an de pêk hatibûn. Di hilbijartinên wê demê de PDK 38, Goran 24 parlementer bidestxistibûn. Paşê her du partiyan peyman danîn û hikûmet ava kiribûn. Li gor vê peymanê serokatiya parlementoyê jî tê de hin wezaret ketibûn para Goranê. Lêbelê di rûniştineke parlementoya Kurdistanê de bi daweta Serokê Parlementoyê yê Goranê Yusif Mihemed berpirsyarekî Îranî tevlî rûniştinê bûbû. PDK, ev yek weke binpêkirina yasayên Kurdistanê nirxand û da zanîn ku ev yek li hember nependa Kurdistanê êrîş e, hebûna berpirsyarê Îranî li parlementoyê, tevlîbûna karên navxweyî yên Kurdistanê ye. Piştî vê bûyerê qrîza siyasî di navbera Goran û PDKê de derket. Di Cotmeha 2015an de ofîsên PDKê li Silêmanî hatin şewitandin, rûxandin. Bi sucdariya li hember derketina karkirina parlementoyê 4 wezîrên Goranê ji berpirsyariyê hatin dûrxistin û herwiha Yusif Mihemed jî ku berpirsyarekî Îranê vexwandibû rûniştina li parlamentoya Kurditanê ji serokatiya parlementoyê hat dûrxistin.

**“Navekî diyar bikin ez ê postê serokatiyê radest bikim”**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî herî dawî eşkere kiribû ku çalakkirina parlamentoyê ji bo referandûmê wê pêngaveke girîng be û diyar kiribû ku Tevgera Goranê di qonaxeke ku şerekî dijwar li dijî DAIŞê dihat birêvebirin de êrişî PDKê kir. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî herwiha bibîr xistibû ku ji bo ku Goran di nava hewldanên ku li ser ewlekariya Kurdistanê metirsî ava dikir de bû, wan tifaqa heyî xera kir. Serok Barzanî ew prose wiha vegotibû: “Di encama hilbijartinên dawîn yên li Herêma Kurdistanê de, ji bo birêvebirin û îstîkrara heta hilbijartinên din (çar salên din) em dikarin çawa konsensûsekê ava bikin, me muzakere kirin û me biryar da ku em lihevkirineke berfireh pêk bînin. PDK weke partiya yekem ji hilbijartinan derketibû û dengên herî zêde bidestxistibûn. Tevî vê yekê jî ji bo hevgirtina nav mala Kurdî me serokatiya parlamentoyê da Goranê. Di rastiyê de li gor yasayan ev ne mafekî Goranê bû, lê ji bo tifaqekê me dev ji mafê xwe berda. Goran li ser çêkirina Destûrê ji aliyê parlamentoyê ve bi rijd bû.”


کۆماری عێراق
هەرێمی کوردستان
سەرۆک

جمهورية العراق
اقليم كوردستان
الرئيس

فەرمانی هەرێمی
ژمارە (١٢٨)

پاڵپشت بە یاسای سەرۆکایەتی هەرێمی کوردستان ژمارە(١)ی ساڵی ٢٠٠٥ی هەموارکراو، بڕیارماندا بە:

١. دیاریکردنی ڕۆژی (٢٠١٧/١١/١) وەک ڕۆژی ئەنجامدانی هەڵبژاردنەکانی پەرلەمانی کوردستان و سەرۆکایەتی هەرێمی کوردستان.

٢. گشت لایەنە پەیوەندیدارەکان پابەند دەبن بە ئەنجامدانی کاری پێویست، و هاوکاری و هەماهەنگی لەگەڵ کۆمسیۆنی باڵای سەربەخۆی هەڵبژاردن و ڕاپرسی بۆ جێبەجێکردنی ئەم فەرمانە.

مسعود بارزانی
سەرۆکی هەرێمی کوردستان

هەولێر
٢٠١٧/٧/١٣

*(Fermana Serokatiya Herêma Kurdistanê ya destnîşankirina roja pêkanîna hilbijartinên serokatî û parlamentoya Kurdistanê)*

**“Daxwaza kudetayê bû”**

Di eslê xwe de ev daxwaza kudetayê li dijî me bû; Di 23ê Hezîrana 2015an de xwastin vê yekê bikin. Di 2015an de careke din xwastin derbeyekê pêk bînin, lê vê carê jî nekarîn zêdebûna dengan di parlamentoyê de bidest bixin û têk çûn. Heta vê radeyê me her tişt bi asayî dît. Lê li ser van bûyeran em neçar man ku tifaqa xwe ya ligel Goranê di Cotmeha 2015an de bidawî bikin. Di heyameke ku em di şerekî tund de bûn li dijî DAIŞê, xwestin asayîşa herêmê jinav bibin, metirsî li ser herêmê ava kirin. Meseleya maweya serokatiya min jî, belê rast e di 2013an de temam bû. Lêbelê parlamentoyê daxwaza min a ji bo hilbijartinê ji ber sedema ku rewş, şert û mercên herêmê ne guncaw in, red kir û maweya serokatiyê 2 salan dirêj kir. Piştî 2 salan dîsa min heman daxwaz kir û min xwest ku partiyên di parlamentoyê de di navbera xwe de bişêwirin û navekî diyar bikin ji bo postê serokatiyê. Lê tevî vê daxwaza min jî ne di navbera xwe de li ser navekî biryar wergirtin û ne jî biryara hilbijartinan standin. Bi vî awayî ev hemû qeyran hatin avakirin û Goranê derî li van qeyran û kêşeyan vekir û bû sedem”



## Ji bo hemû aliyan Banga piştgiriyê bo Komîsyona Hilbijartinan

Li aliyê din di civîna dîrokî ku tê de biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê hatibû standin de danûstandin ji bo hilbijartinan jî hatibûn kirin lê encam nedabûn. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, heftiya borî ji Komîsyona Bilind a Hilbijartinê û Referandûmê re biryara pêkanîna hilbijartinên serokatî û parlementoyê ya ku dê di 1ê Mijdarê de pêk bê şand. Li gor talîmata ku Serok Barzanî şandiye di çarçoveya maddeya 128. de ji hemû partiyan daxwaza diyarkirina endamtiya Komîsyona Hilbijartinê ya Bilind û daxwaza alikariya bi Komîsyona Referandûmê re kir. Barzanî talep dike ku hemû alî û hizb amadekariyan bikin.

Seroka Giştî ya Partiya Kedê Selma Gürkan:

# Referandûm bo dahatûya erdnîgariya Rojhilata Navîn girîng e



"Baweriya rasteqîn bes bi nasîn û teslîmkirina mafan, garantîkirina mafên demokratîk pêkan e. Emperyalîstan û dewletên ku li gor wan tevdigerin li Rojhilata Navîn her tim xwîn rijandine û Rojhilata Navîn ji bo gelan kirine dojeh."



HÎLAL YAĞIZ

Me referandûma serxwebûna Kurdistanê bi Seroka Giştî ya Partiya Kedê (EMEP) Selma Gürkan re nirxand. Gürkan diyar dike ku referandum dê bandorê ne tenê li ser Herêma Kurdistanê, dê li hemû erdnîgariya Rojhilata Navîn bike. Gürkan destnîşan dike ku di serî de jî Îran û Tirkiye divê hemû dewlet serxwebûna Kurdistanê bipejirînin. Biryara 'gelo ez ê çawa xwe bi rê ve bibim' ji aliyê gelan ve li hemû cîhanê divê bi destûra 'diyarkirina çarenivîsa xwe bi destê xwe' bê kirin.

**Hûn referandûma serxwebûna Kurdistanê çawa dinirxînin?**

Di serî de divê ez diyar bikim ku mafê her netewî heye ku qedera xwe bi destê xwe diyar bike. Tekane ew gelên li Iraqê dijîn dikarin bersiva çawaniya îdarekirina xwe bidin. Li herêmê pirsgirêka herî mezin a netewî bêdewletbûna heta îro ya gelê Kurd e. Dê ev referandûm biryardayîna statûya heta îro hatiye derbasî kijan astê bibe wê bide.

**Li hember piştgiriya dewletan ji bo referandûmê helwestên tund ên dewletên herêmî jî hene. Hûn helwesta Îran û Tirkiyeyê çawa dinirxînin?**

Daxûyaniyên dewletên herêmê an jî derveyî herêmê ne li gor bicihanîna daxwaza gelên Iraqê ne. Em di proseyeke wiha de ne ku dewletên zilhêz li ser herêmê, parvekirina bingehên enerjiyê, korîdora belavkirinê û bihêzkirina hêza xwe zeximkirinê de derbas dibin. Di serî de DYA û Rûsya ji bo bicihkirina hêza xwe li herêmê di tekoşîneke dijwar de ne. Ew dewletên ku li aliyê hêzek ji van hêzan de xwe bicih dikin li gor sekna xwe di derheqê referandûmê de helwesta xwe diyar dikin.

Helwesta Tirkiyeyê jî ji wê analîzê ne berî ye. Yekem pirsgirêka Tirkiyeyê ya demokrasiyê çaresernekirina kêşeya Kurdî bi dayîna mafên wekhevî û gelparêziyê ye. Li welatê me desthilatan heta niha polîtîkaya înkar û jiholêrakirinê bi rê ve birine. Doza gelê Kurd ku heta niha meşandiye û rûdanên li herêmê desthilata Tirkiyeyê di sala 2013an de neçar anî ser maseya çareseriyê, lê nexweşiya kevneşopî ya Tirkiyeyê ji bo çareseriyê astengî derxist û dewletê dîsa dest bi înkarkirina Kurdan kir. Em dikarin bibêjin ku siyaseta Tirkiyeyê li Iraq û Sûriyeyê jî vê siyaseta kevneşopî diyar dike.

Polîtîkayên Îranê jî li hember Kurdan weke yên Tirkiyeyê ne. Her çiqas di mijara mezheban de li hember hev bisekinin jî ev her du welat dema mijar dibe mafê gelê Kurd di hemahengiyeke xurt de ne. Divê dewleta Îranê dev ji polîtîkayên xwe ku Kurdan înkar dike, zilm û zordariyê dike berde. Ji bo dayîna mafê gelê Kurd dest bi demokratîzebûnê bike. Yanî baweriya rasteqîn bes bi nasîn û teslîmkirina mafan, garantîkirina mafên demokratîk pêkan e. Emperyalîstan û dewletên li gor wan tevdigerin li Rojhilatanavîn her tim xwîn rijandine û Rojhilatanavîn ji bo gelan kirine dojeh.

**Piştî referandûmê, hebûna dewleteke Kurdî li Rojhilata Navîn dê çi bandorê li herêmê bike? Hûn di vê mijarê de helwesta herêmê û Ewropayê çawa dinirxînin?**

Hesabê her dewleta ku li herêmê danûstandinên wê hene, teqez li ser Hikûmeta Kurdistanê jî hesabên xwe dikin. Piştî referandûmê biryar çi be jî dewlet li gor hesabên xwe dê tevbigerin. Mînak Tirkiye, di wê baweriyê de ye ku statûstandina Kurdên Iraqê dê bandorê li Kurdên Tirkiyeyê jî bike. Û îtîrazên xwe li gor vê yekê dike. Ji aliyê Tirkiyeyê ve Sûriye jî mijara Rojava ne cudatir e. Elbet ev refleks jî girêdayî vê yekê ne.

**Bandora kêşeya Kurdî li Tirkiyeyê nêrîna partiyekê di derheqê demokrasiyê de diyar dike. Him helwesta herêmê him jî ya Ewropa li hember vê mijarê hûn çawa dinirxînin?**

Hikûmeta AKPê bi demokrasî û çareseriyê nêzîkî kêşeyê nebû. Ji ber rewşa heyî neçar ma û li ser masê rûnişt. Lêbelê fikra dê heta hetayê înkar û zordarî dê bidome jî xelet e. Li gor rewşa dozê dê ev rewş jî biguhere.

## "Jinan di guhertinên dîrokî de rolên girîng lîstine"

Hûn rola jinan di referandûm û serxwebûnê de çawa dinirxînin? Di vê rewşê de dê jin berpirsyariya çi hilgirin?

Qet guman tê de nîne ku rola jinan di tekoşînên bidestxistina maf, azadî û dozên civakî de xwedî roleke girîng in. Ji bo pêşketina hizbê jin bandoreke erênî dikin. Li aliyê din jî bidestxistina dozê destkeftiyên jinê zêde dikin. Jinan di Komûna Parîsê de, Şoreşa Cotmehê ku em sedsaliya wê pîroz dikin de gelek guhertin kirine; guhertinan jî destkeftiyên dîrokî yên jinan zexim kirine. Tevgera Kurdî jî rola jinê bi layiqî bicih aniye û îro li Rojhilatanavîn jin bingeha avakirina demokrasiyê ne. Bêguman ev tespît ji bo Herêma Kurdistanê jî derbas dibin.



## SELMA GÜRKAN

Di tekoşîna maf û azadiya sendîkayan de, di BESa girêdayî KESKê de ji berpirsyariya karsazê bigirin heta berpirsyariya navendê di her meheleyê de cih girtiye. Xebatên di Partiya Emekê de di sala 2007an de fermiyet standin. Bi salan Serokatiya Şaxa Partiya Emekê ya Enqereyê kiriye. Ji sala 2011an û vir ve jî ku bi dirûşmeya 'Yekîtiya Hêzê' ketibûn hilbijartinan, weke seroka giştî, xebatên xwe berdewam dike.

"Hesabê her dewleta ku li herêmê danûstandinên wê hene, teqez li ser Hikûmeta Kurdistanê jî hesabên xwe dikin. Piştî referandûmê biryar çi be jî dewlet li gor hesabên xwe dê tevbigerin."

---

Xrîstiyanên Kurdistanê:

# Ji ber ku em ji DAIŞê parastin, em piştgriyê didin referandûmê

ŞIWAN BERZENCÎ

Li dijî DAIŞê hezên Peşmerge -herêmên ku tên nîqaşkirin jî tê de- gelek herêmên Kurdistanê parastin. Di nav hezên Peşmergeyan de, ji ol û nasnameyên ji hev cuda yên ku li Herêma Kurdistanê dijîn jî pitşgirî tê dayîn. Bajarê Mûsilê di sala 2014an de ketibû destê DAIŞê. Piştî vê, ji bo rizgarkirina Mûsilê di meha Cotmeha 2016an de peşmerge digel artêşa Iraqê operasyoneke hevpar li dar xistibû û peşmergeyê di sînorê bajarê Misilê de operasyon bi dawî kiribû. Xrîstiyanên ji herêmên ku ketibûn destê DAIŞê yên Mûsilê di nav peşmergeyê de yekîneyên leşkerî ava kirin û bi vî yekê re wek Deşta Ninovayê wê herêmê xwe biparêzin. Xrîstiyan, piştgiriyê didin bo referandûma serxwebûnê ya di 25ê Îlonê de.

Sekreterê Giştî yê Partiya BêtNehrên, Romîo Hekarî, nêrînên Suryanî, Keldanî û Asûriyan ên di derheqê referandûmê, ji Basê re rave kir; " Hemû partî û aliyên me yên sîyasî biryara referandûmê ya ku Serokê Herêma Kurdistanê Birêz Mesut Barzanî di civînê de girtibû, erêkirin û pejirandin. Em piştgiriya Kurdistana Serbixwe dikin." Hekarî dibêje, Gelê me baş dizane bê kê xwast ku em ji axa me derxe û kê malen me şewitandin. Dîsa em baş dizanin ku kê deriyê xwe ji me re vekir û alikariya me kir. Hekarî axaftina xwe wiha didomîne; "Ji ber vê sedemê ji bo ku referandûm bi ser keve emê hemû alikariyan bidin. Nûnerekî me di komîteya referandûmê de jî heye û em dixwazin em zêdetir mafên xwe bi dest bixin. Bo Kurdistana Serbixwe em dengan berhev dikin. "



Hekarî bo pêşeroja Nînovayê ya piştî DAIŞê jî axivî û wiha pê de çû; "Hikûmeta Iraqê bo deşta Nînovayê senaryoyên ji hev cuda anîn ziman. Lêbelê fikrekî me yê cuda heye. Em wek gelê Suryanî, Keldanî û Asûrî dixwazin bila Deşta Nînovayê bibe parêzgeheke serbixwe." Hekarî sedema vê yekê jî wiha tîne ziman, "Çimkî ev yek bo parastina gelê me û pêşeroja me, bi tenê yek çare ye. Ger em bibin parêzgeh wê demê emê ji karesatên ku li herêmê tên serê me xilas bibin. Deşta Ninovayê ji navçeyên Hemdaniye, Şêxan û Telkefê pêk tê. Li van herêman Xrîstiyan, Şebek, Êzidî, Kakeyî û Misliman dijîn.

Wek herêma Xristiyanan tê zanîn. Xwişk û birayên me yên ku li van herêman dijîn dema DAÎŞ di sala 2014an de êrişî vir kir, heta operasyona 2016an zilmek mezin dîtin. Her wiha Lijneya Wezareta Hikûmeta Iraqê di sala 2014an de erêkiribû ku deşta Ninovayê dê bibe parêzgeh. Me xwest ku ji Deşta Ninovayê re wek parêzgeh bo gelên Keldanî, Asûrî, Êzidî û Şebek terxanî bê kirin. Ev yek di çarçoveya makeqanûna Iraqê de nabe sedema pirsgirêkan. Dibe ku piştî DAIŞê li herêmê nakokî çêbibin. Hêzên ku Mûsil rizgar kirin divê Deşta Ninovayê biparêzin. Wekî din divê neyê jibîrkirin ku hin hêzên Keldanî Asûrî ku girêdayî Wezareta Peşmerge û Wezareta Navxweyî ya Herêma Kurdistanê hene. Peywira hejmara van hêzên ku bi qasî 3 hezar kesan ev e ku van herêman biparêzin."

HOŞENG OSÊ

Îdolojiya Baasê çawa kete nava PKKê?



"Bi xwîn bi can em bi te re Öcalan" ev diruşime, berî salên 1986an, di nava çalakî û xwepêşandanên PKKê de ne dihat gotin. Ev diruşime, ya Baasiya ye, ji ber endamên partiya Baas li Suriyê û Iraqê vê diruşimê ji bo Hafiz Esed û Sedam Husên re digotin. Baş e, ev diruşima Baasî, çawa û kengî kete nava PKKê?

Rast e, berî Öcalan were girtin û revandin, PKKê gelek rexneyên tund li Kemalîstan û li kemalîzmê dikirin. Lê mirov nikare bêjê: PKKê ji %100 xwe ji kemalîzmê şuştibû û paqij kirbû. Çima? Ji ber ku hemû damezirênerên PKKê di dibistanên Tirkiyê de ku li gorî rêbaz û sîstema kemalîzmê dihatin birêvebirin, xwendine û perwerde bûne. Her kes dizane bê Kemalîstan çawa û bi çi şêweyî kemalîzmê bi rêya metod û rêbazên perwerdê "dibistan, peymangeh, zanko", medya, tv, radyo, rojname, kovar...û hwd di mêjiyê giştî yê civakê de çandine. Ne tenê wisa, kemalîzmê xwe berdabû nava tevgerên çepgir yên Tirkiyê jî. Ango ji sala 1923an heta 1978an civaka Tirkiyê li ser hemû rade û asteyan di nava kemalîzmê de gevizî bû, ija çawa mirov dikare bêje; bandora kemalîzmê li ser PKKê tune ye? Ji bilî vê jî, Öcalan piştî hate revandin û girtin, êdî dest bi pesnê Atatürk kir. Öcalan di gelek cihan de Atatürk weke ku ne dijminê kurda ye, bi nav kiriye û gotiye; "Atatürk baş bû lê yên li dora wî xerab bûn".

Em vegerin mijara xwe, şêwe, metod û rêbazên ku Kemalîstan di warê belav kirin û çandina kemalîzmê di nav civakê de bikaranîne, her wisa rejîma Baasê li Sûriyê û Iraqê pêkaniyê û bikaraniye. Ji sala 1985-1986an ciwan û xwendevanên kurdên Sûriyê yên tevlî PKKê bûn, li ser tiliyan dihatin hejmartin. Lê di sala 1987-1988an de êdî xort û keçên binxetî bi sedan tevlî PKKê dibûn. Her wisa, heta em gihiştin salên 1990-1991-1992an ku salên teqîna cemawerî ya PKKê li Sûriyê bûn. Di van salan de bi hezaran xort û keçên binxetî tevlî refên PKKê bûn. Ev kadro û şervan di dibistan, peymangeh û zankoyên Baasiyan de xwendin. Ango çawa kemalîzmê bandora xwe li ser serxetiyan kiribû, her wisa rejîma Baasê bandora xwe li ser binxetiyan kiribû. Dêmek bi hezaran kadroyên kurdên Sûriyê yê tevlî PKKê bûn, bi xwe re piçek ji kultura Baasê birin nava rêxistinê. Mînak û nîşanên vê diyardeyê pir in, lê mirov dikare çend ji wana hilbijêre:

1- Divê mirov tu carî jibîr neke ku Öcalan 18-19 salan li Sûriyê di bin bandor û deshilatdariya rejîma Baasê de maye. Ji bilî vê jî, Öcalan û PKKê gelek caran pesnê Hafiz Esed dane û min di nivîsên berê de ev yek da nîşandan.

2- Stranên li ser seroka, ev jî kultura Baasiyan e, ku bi hezaran stran li ser Hafiz Esed, Beşar Esed û Sedam Hûsên hene. Lê dema mirov li arşîva "Koma Berxwedan" ya PKKê vedigere, dibîne ku yekemîn stranên li ser Öcalan di sala 1987an de hatiye gotin û yê gotiye hunermend Cemal Tîrêj e ew û xwediyê têksta helbestê jî binxetî ne.

- Di sala 1993an de "Koma Berxwedan" qasetek derxist, têde hunermend Xemgîn Birhat strana "Serok Apo, mezin Apo, bilind Apo, apê me" gotiye. Lê ev stran, têkst û awaz, ya "Koma Agirî" ye ku di sala 1991ê de xwendiye. "Koma Agirî" jî, ji Amûda binxetê ye.

- Strana "Hoy hoy apê me.. hoy hoy şêrê me" hunermend Peywan Arjîn di sala 1990î li Qamişlo xwendiye û di sala 1995an de li Europa di gel Koma Berxwedan dîsa dubare kiriye.

- Strana "Can apê me... serdarê gelê me" ya hunermend Comerd, di eslê xwe de, ev stran tekst û awaz ya xwendin ya "Koma Agirî" ye.

- Strana "Serokê min" a hunermend Bengîn tekst, awaz û xwendin tev yên kesên binxetî ne.

Ango, endamên Koma Berxwedan yên serxetî ji hunermendên Apocî yên binxetê hînî vê kultura Baasiyan ku stranan li ser Öcalan çêkin, bûne. Lewma piştre, Dilgeş, Diyar, Beser Şahîn...û hwd stran li ser Öcalan gotine.

3- Ji sala 2000î û vir de, hêzeke bi navê "Fedayiyên Öcalan" li çiyayê Qendîlê hate damezrandin. Bargehên "kamp"ên vê hêza taybet bû û çênedibû ku endamê PKKê yê temen mezin derbasî nav wan bibin, da ku bi mêjî û aqilê endamên vê hêzê nelîzin û wan ji rê derxînin, ji ber ku endamên vê hêzê temenên wan 14-16 salî bûn. Belkî kurdên me yên serxetê, yên bakurî, vê hêzê normal bibînin, li kurdên binxetê "başur-rojava" baş dizanin ku rejîma Iraqê ya berê di sala 1994an de hêza "Fedayiyên Sedam Husên" çêkiribû û di sala 2003an de ev hêz hate rawestandin. Ango ev şêwe jî bi nav kirin hêzên leşkerî, ew jî ji kultura partiya Baas e.

Bi kurtî, di nava çanda PKKê de mirov dikare tenê hin nîşanên bandorên kemalîzmê yan jî stalînîzmê dikare bibîne, lê dikare nîşanên bandora kultura partiya Baasê jî bibîne.

Berdevkê PDK-Bakur Hamit Kılıçaslan:

# Kurd dê nîşan bidin ku dikarin bibin dewlet



NÛJÎN ONEN

Roja referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ya 25 Îlonê her ku diçe nêz dibe. Bi nêzbûna vê rojê piştgirî û nîqaşên li ser vê mijarê jî zêdetir dibin. Dema em bala xwe didin helwesta dewletên cîhanê em dibînin ku Ewropa û Amerîka bi qasî welatên herêmê bertekên hişk nîşan nadin. Bertekên hişk bêhtir ji welatên cîran tên. Tirkiyeya ku yekparçebûna Iraqê diparêze û vê yekê bi lêv dike, di encama Lijneya Ewlehiya Neteweyî ya Tirkiyeyê de got "Biryara referandumê ku Herêma Bakurê Iraqê standiye ji aliyê hiquqî û fîilî ve nikarin pêk bînin" Berdevkê HDPê Osman Baydemir jî wiha rexne li van gotinan kiribû "Em wek HDP vîna Başûrê Kurdistanê qebul dikin. Serxwebûn ji bo te tiştekî bêveger e çima ji bo Kurdan ne tiştekî bêveger be? Berdevkê PDK-Bakur Hamit Kılıçaslan derbarê referandûma serxwebûnê de ji Heftenameya Basê re got "Mafekî ku ji aliyê hiquqî ve hatiye naskirin kes nikare bi sedemên siyasî derengî bixîne, ev ne helwesteke exlaqî ye."

**"Kurd dê nîşan bidin ku dikarin bibin dewlet"**

Hamit Kılıçaslan helwesta partiya xwe ya li hember referandûma serxwebûnê wiha vedibêje:

Partiya me xewna Kurd û Kurdistaniyên li aliyê azadî û serxwebûnê ne vê rojê weke mafekî rewa dibîne û piştgiriya vê yekê dike. Wext hatiye ku êdî Kurd li Rojhilatanavîn bibin dewlet. Wext hatiye ku Kurd jî weke milletên din li Neteweyên Yekbûyî, li platformên navneteweyî û Yekîtiya Ewropa bibin xwedî maf. Heta Kurd van mafan bidest nexin kes nikare li Rojhilata Navîn behsa aşitî, demokrasî û mafê mirovan bike. Li gel hemû astengiyên derve û hundir li parçeyekî Kurdistanê jî be ev referandûm dê vê nîşan bide: Kurd êdî hatine asta serxwebûnê saz bikin û bibin dewlet. Ev referandûm mafê herî rewa yê Kurdan e.





Yek ji nîqaşên li ser serxwebûna Herêma Kurdistanê jî ev e ku dê bandoreke çawa li ser Rojhilatanavîn bike? Kılıçaslan derbarê vê mijarê de wiha axivî: "Ji sala 1991 vir ve nispî be jî tecrûbeyên Kurdistana azad, heta niha pirrengî, xweşbînî, bêyî ku cûdahiyê têxe navbera ol û nijadan hemû pêkhate naskirine. Vê yekê nîşanî dinyayê daye ku Kurd li Rojhilatanavîn dikarin demokrasiyê pêkbînin. Di heman demê de sîstema pir partiyayetî, çanda rexnekirinê êdî bûye parçeyek ji jiyana Kurdistanê. Ji ber vê, li Herêma Kurdistanê, jiyana civakî û polîtîk li gor nirxan tê birêvebirin. Desthilatdarên Rojhilatanavîn ji nirxên dinyaya modern dûr in, di heman demê de li ber pêşveçûna civakî jî dibin asteng. Dema Herêma Kurdistanê weke dewleteke serbixwe derkeve holê dê li gor rastiyên zanistî dê bandorê bi awayekî erênî li civakên Rojhilatanavîn bike û ji bo pêşketinê dê bibe mînak.

**"Dema serxwebûnê ye"**

Berdevkê PDK-Bakur Kılıçaslan, rexne li kesên ku dibêjin 'Ji bo biryargirtina referandûmê zû ye' girt û wiha berdewam kir, "Konjonktura dinyayê û herêmê ti carî ji bo Kurdan ewqas guncaw nebibû. Dinya êdî hatiye astekê ku dikare bersiva daxwaza serxwebûnê ya gelên bindest bide. Mafekî ku ji aliyê hiquqî ve hatiye naskirin, bi sedemên siyasî tunehesibandin û derengxistin ne helwesteke exlaqî ye. Plebisita Self Determinasyonê çavkaniya xwe ji hiquqa navneteweyî distîne. Biryara serxwebûnê dê bibe encama vî mafî, bi sedemên siyasî nikarin paş bixin. Pêşmerge bi dîrayet û îradeya xwe rêxistineke mîna DAIŞê ku bûye bela serê cîhanê têkşikand. Nabe ku Herêma Kurdistanê girêdayî hikûmeta navendî ya paşdemayî bimîne ku benda 140an jî di nav de, berpirsyariyên xwe bicih nayîne. Em wek partî dipirsin; Li dinyayê kîjan dewlet ji bo îlankirina dewleteke serbixwe li benda şertên guncaw yê mêtingerê xwe maye. Li vir wexta herî guncaw ya li gor pêdivî û daxwazên wan e. 25ê Îlonê jî wexta herî guncaw e."

## "Kurd di Rojhilatanavîn de aktorekî sereke ne"

Kılıçaslan helwesta Tirkiye û Îranê ya li hember referandûma serxwebûnê wiha nirxand: "Enqere, Tehran, Bexda û Şam di mijara li hemberderketina polîtîkayên Kurd û Kurdistanê de her tim wek hev difikirin. Konjonktur bi awayekî guhertî bandorê li rêveberiyê dike. Dîktatoriya Şamê di şerê heyîn û tunehiyê de ye. Stratejiya Enqereyê ya 'bi cîranan re jiyaneke bêproblem' îflas kiriye, serê wan bi hemû dinyayê re ketiye belayê. Tehran jî ku dijberiya referandûma serxwebûnê dike, ew jî mîna Tirkiyê him ji ber kêşeya wan a li gel mafên demokratîk û gotina 'parastina yekperçebûnê', di fikara rêvebirina beşeke mezin a Kurdistanê li gor sîstemên xwe yên mêtingerî de ne. Tehran jî mîna Enqerê serê wê bi cîhanê re di belayê de ye. Tecrubeya Kurdistanê ya bi demokrasiyê re meşa Kurdan ya azadî û serxwebûnê helbet dê ji bo wan tiştekî nû be. Kurd êdî di Rojhilatanavîn de jêveneger in û aktorekî polîtîk ê sereke ne û wê di qada navdewletî de vê belgeya xwe ya aktoriyê jî di 25ê Îlonê de bidest ve bînin. Herwiha referandûm ji bo ku hemû Kurd werin ser hemdê xwe û ji bo dîtina şaşiya di rêya netewbûnê de wê bibe parzûnek. Kongreya Neteweyî wê nîşan bide ku krîterên nirxên neteweyî ne li gor şexs û rêxistinan, lêbelê li gor ziman, çand, dîroka Kurdistanê û bi xwedîderketina li axa xwe ve girêdayî ne."

## "Hinceta kuştina sivîlan nîn e!"

DARA DIRBÊŞÎ

Mamosteyê bi navê Necmettin Yilmaz ku li Sîwereka Rihayê mamostetî dikir, ji bo vegere bajarê xwe Gümüşhanê, 16ê Hezîrana îsal li Pilemûriya Dersîmê li ser rê rastî êrîşeke çekdarî hatibû û demekê tu agahî jê nehatibûn standin. Malbata Yılmaz ku ji kurê xwe agahî nedistand serî li Komeleya Mafên Mirovan dabû. Lê baskê çekdarî yê PKKê ragihand ku Necmettin Yılmaz ji aliyê wan ve hatiye kuştin û termê Yılmaz 12ê Tîrmehê li ber çemê Pilemûriyê hatibû dîtin.

**"Bêyî teredut ez kuştina mamoste Yılmaz şermezar dikim"**

Kuştina mamosteyê dibistanê Necmettin Yılmaz rastî bertekan hat û nerazîbûn hatin nîşandan. Yek ji van kesên ku nerazîbûn nîşan da û ev kiryar şermezar kir Hevserokê HDPê Selahattin Demirtaş bû ku ji 4ê Mijdara 2016an ve di Girtgeha Edîrneyê de ye. Demirtaş li ser kuştina Yılmaz daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniya Demirtaş de wiha hat gotin: "Bêyî teredut ez kuştina mamoste Necmettin şermezar û lanet dikim. Tu sedemên exlaqî û rewa ji vê hovitiyê re nîn in. Ez sersaxiyê ji malbata wî re dixwazim û dixwazim bînim ziman ku em bêdengiya li hember van kuştinan qebûl nakin."

**"Em li hember hemû binpêkirinan disekinin"**

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) jî di daxuyaniya xwe ya li ser kuştina Yılmaz wiha gotibû: "Em weke ÎHD destnîşan dikin ku mafê jiyanê, mafekî ku divê ji bo her kesekî di bin garantiyê de be. Em him ji 'Hiqûqa mafên mirovan' him jî 'Hiqûqa mirovahiyê' bingeh distînin. Ji ber vê yekê jî em ne tenê li hember binpêkirinên dewletê lê li hember binpêkirinên hêzên di dest da çek heye jî derdikevin. Bingeha hiqûqa mirovahiyê xala 3. û protokola 2. a girêdayî vê xalê ya Peymana Cenevreyê çalakiyên qedexekirî rêz dike. Li gor vê, rehîngirtin, işkencekirin, miamaleya xerab, tundiya li hember kesên derveyî pevçûnan, çalakiyên di van belgeyan de li dijî sivîlan hatine qedexekirin, zarokan, çalakiyên li hember nexweş û birîndaran, bikaranîna çekên qedexekirî, xwezayî, tahrîbata li hember deverên dîrokî û çandî, binpêkirina hiqûqa mirovahiyê ne. Em weke ÎHDê ji ber çi be jî, li hember înfaza mafê jiyanê derdikevin û şermezar dikin; em di wê hêviyê de ne ku careke din ev kiryar rû nedin."

**Ji bo kuştina sivîlan lêborîna 'bi şaşî'**

Li aliyê din ne cara yekem e ku sivîlek tê kuştin. Di destpêka qedexeya derketina derve di Tebaxa 2015an de bijîşkek û zarokekî 14 salî ji aliyê PKKê ve hatibûn kuştin. Di 30ê Tebaxa 2015an de PKKê êrîşî çêkirina rêya bendava Farqînê kiribû û Firat Simpilê 14 salî hatibû kuştin. Di 31ê Tebaxa 2015an de di dema qontrola rê ya ji aliyê PKKê ve trimbêlek nesekinîbû û êrîşî trimbêlê hatibû kirin. Di encamê de Bijîşk Abdullah Biroglu hatibû kuştin. Piştî kuştina Simpil û Biroglu Endamê Konseya rêvebirinê Murat Karayilan di daxûyaniyekê de gotibû ku 'Bi şaşî' hatine kuştin. Karayilan dibêje, "Bila malbatên Firat Simpil û Abdullah Biroglu bizanibin ku ev bi xeletî hatiye kirin. Em weke HPGê lêborîna xwe dixwazin, xemgîniya xwe tînin ziman. Me di derbarê van bûyeran de lêkolîn daye destpê kirin."



# Miletekî bê dewlet, mîna sêwîyen berdîwar e



CESÎM İLHAN

**Hûn weke hunermendekî Kurd ê navdar, Kurdistaneke serbixwe ya çawa dixwazin?**

Milleteki bê dewlet, mîna sêwîyen berdîwar e. Kî rabe tepekê li serê wî dide. Heta ew milet serbixwe nebe, ji binê esaretê rizgar nebe û nebe dewlet, ew millet iflah nabe. Ev sed sal e di ser Sykes Picot re derbas bûye yanî ev sed sal e ku Kurdistan di navbera çar dewletan de hatiye parvekirin. Edî hûkmê Seykes Picot nema derbas dibe. Ger dewleta Kurdistanê çêbibe wê aramî û aştî were herêma Rijhilata Navîn jî. Milete Kurd ji 40 milyonê bêtir e. Mafê wî ye ku bibe dewlet. Dereng maye jixwe.

**Ji bo serxwebûna Herêma Kurdistanê di 25ê Îlonê de dê referandûm pêk were. Gelo Kurd xebatên çawa bikin baş e?**

Kurd gerek e mal bi mal bigerin ji bo ku herin ser sindoqên referandûmê û hemû bêjin; "erê, em dewleta xwe dixwazin." Kurd gerek e di warê diplomasîyê de jî nesekinin. Li welatên derve derî bi derî bigerin û piştgiriyê ji dewletan bixwazin.

**Hûn dizanin ku di navbera hinek partî û rêxistinên Kurdan de alozî hene. Dîroka referandûma serxwebûnê jî nêzîk dibe. Ji bo armanca serxwebûna Kurdistanê peyama we çiye?**

Îro ne ew roj e ku partî li ser kêmasiyen hev rawestin. Hemû parti gerek li ser têgeha serxwebûn û dewletbûnê dest bidin hev û hêvî bidin miletê Kurd. Fersendeke dirokî ye. Trêna serxwebûnê her sal di her welatî re derbas nabe. Kesên li vê trenê siwar bibin wê bigihêjin armanca xwe û navê xwe bi başî li dîroka Kurdistanê binivîsîn. Kesên siwar nebin wê li pey hevalên xwe rezîl û riswa bibin û navekî xerab ji xwe re li dirokê binivîsin.




**Gelo hunermendên Kurd dikarin navbeynkariya partiyên Kurdî bikin?**

Hunermendên Kurd mixabin nikarin vê rola xwe bilizin. Parti û siyaseta Kurd her dem xwestiye hunermendan ji xwe re bike zirne û bi kar bîne. Loma ji xeynî hinek istisnayan hemû hunermendên Kurd nikarin bi dengeki bilind rexneyan li partiyan bikin. Halbuki huner di ser partî û siyasetê re ye. Îro gerek e hemû hunermendên Kurd beriya partî û rexistinan doza serxwebûn û dewletbûna Kurdistanê bikirina. Lê em dibînin piraniya hunermendên me ku dikarin ji bo stranekê canê xwe bidin guleyên neyaran, lê ji ber tekiliyên xwe yên siyasî nikarin bi dengekî bilind bêjin em Kurdistaneke serbixwe û dewleteke Kurdistanê dixwazin. Bêdengiyek heye.

**Dewletên cîran dibêjin ku 'Kurdistana Serbixwe' bo sînorên me metirsî ye û li dijî dewletbûna Kurdan derdikevin. Armanca wan çi ye li gor we?**

Halê hazir dewletên cîran tune. Dewletên dagirker hene û Kurdistaneke bindest û parçekirî heye. Lê dema Kurdistan bibe dewlet wê çaxê ew dewletên dagirker dibin cîranên me û em dikarin bi aştiyane cîrantiya xwe berdewam bikin. Di dirokê de Kurdan ti carî zilm li kesekî nekiriye û wê neke jî.

**Piştî diyarkirina dîroka referandûmê dijminên Kurdan bi aşkere li hember referandûmê derketin. Di navbera hin aliyên siyasî yên Kurdî de jî kêşe hene. Îhtîmal e ku ji serxwebûnê re astengiyan derxin. Peyama we ji bo Kurdan çi ye?**

Trêna serxwebûnê bi rêketiye. Kesek nikare bisekinîne. Kesên bixwazin astengiya derxin wê bibin cahşên neteweyî heta hebin ji vê rûreşiyê xelas nabin. Wê bikevin refên wan dewletên dagirker ku dibêjin em nahêlin dewleta Kurdan çêbibe.

**Ji bo ku serkeftineke zelal di referandûmê de encam bide, li bajarên Herêma Kurdistanê festîval bên lidarxistin baş e an hewce nake?**

Ez û karmendê welatparêz emê li bajarê Hewlêrê jî konsereke mezin ji bo piştgiriya referandûmê li Hewlêrê li darxin. Em difikirin serê îlonê em vî karî pêk bînin. Bawer im wê gelek çalakiyên din jî çebibin li Kurdistanê.

## Gelo hunermendên weke we, Şivan Perwer, Nîzamettîn Arinç, Ednan Kerîmî, Homer Dizeyî û hwd. ji bo mafê rewa yê Kurdan dikarin bi yekdengî palpiştî bikin?

Min sala 2016an karekî aktîv di nava xebata mitînga Kolnê de kir. Û di meha Gulanê de jî xebateke bêhempa li Ewropa dimeşe û heta ez jî piştgiriya wan dikim bi her awayî. Di vê gerindeya xebatê de min û çend hevalan li Amedê jî bingeha komiteya çalakiyekê avêt ji bo 26ê tebaxê li Koln û Amedê û Hewlerê dengê piştgiriya serxwebûn û referendûmê wê bê bilindkirin. Xebata Ewropa gihîştiye asta herî bilind û di bin sîwana konseyekê de hemû komiteyên bajar û welatan ji bo ku Kurdan 26 tebaxê li bajarê Kolnê binîn ba hev di nava xebateke mezin de ne.

> Huner di ser partî û siyasetê re ye. Îro gerek e hemû hunermendên Kurd beriya partî û rexistinan doza serxwebûn û dewletbûna Kurdistanê bikirina.



# Ala Kurd

**Di dema îro em tê de dijîn de, ala netewî ya Kurd hemî Kurdan temsîl dike. Îro 45 milyon Kurd ne bê al e. Di nav alên cîhanê de alên bi sê rengan gelek pir in. Ji bo ku sê reng, rengên serkeftin, pêşketin û şoreşê hatine pejirandin.**

**ABUZER BALI HAN**

Dema em li ser ala Kurd agahî bidin, pêwist e ku em gotina “Al“ bidin nasîn. Peyva gotina “al, ala“ bi Farisî “beyrak“ bi Erebî jî bi gotina “alem“ tê binavkirin. Dema mirov li ser ala Kurdistanê raweste, beriya wê, ma wateyê gotina ‘al’ ji ku tê? Bi hezaran sal e ku ‘al’ di nav netewan de tê bi kar anîn. Lê kes nizane heya îro cara yekem kê û kîjan netewî ‘al’ çêkiriye? Berî baweriya ‘yek Xwedêvandiyê’, pût û pûtperestî hebûye. Mirovan pûtên xwe yên çêkirî, bi reng û bi şerîtên cuda dixemilandine. Paşê qral, şah û hikûmdaran ji xwe re sembol, nîşan danîne. Ew sembol dem bi dem bi guhartinan pêş ve çûne û dawiya dawîn ciyê wan alên îro bi kar hatine. Ji civatên kevn û heya roja îro alan her dem di nav civatan de hebûna xwe parastiye.

Dema em tê de, her al, netew û dewletekê temsîl dike. Ji bo vê jî her al, nîşana (sembola) netewbûnê ye. Di nav welêt de li ciyên fermî û li derveyî welêt, di nav ciyên navnetewî de ala her miletî wî miletî temsîl dike. Ji bo vê sedemê jî, al ji aliyê her miletî ve pîroz û bimbarek tê pejirandin. Dema du dewlet li dijî hev şer bikin, li pêşiya hêzên xwe, alên xwe radikin. Dema ala hêzekê ket erdê, ew tê wê wateyê ku wan şer winda kiriye. Hêza ku ala wê ket erdê, êdî ew ji aliyê moral ve têk diçe.

Algirên (beyreqdar) artêşan ji kesên bejn û bala xwe bilind û yên bi hêz û quwet tên hilbijartin. Di şer de ala hêzekê kêt destê hêza din, tê wê wateyê ku dîl hatiye girtin.

**“Ala netewî ya Kurdan hemû Kurdan temsîl dike”**

Împaratoriya Romiyan bi sembola ‘qertal’ xwe nîşan didan. Napolyon jî semboleke wisa bi kar aniye. Îro li Dewletên Yekgirtî ên Amerîkayê, li Almanyaya Federal li gel alên xwe sembolên qertalan dewlet û hêza dewletê temsîl dike. Ne tenê welatên rojava, piraniya welatên Hîndo-Ewrûpî jî rêzê ji qertal re digirin. Îro li Başûrê Kurdistanê, Dewleta Federal a Kurdistanê li gel ala Kurdistanê, PDK di nav nîşana partiyê de sîmgeya serê qertal jî bi kar tîne. Bi kurtahî qertal sembola azadî û serxwebûnê ye. Li aliyê din qertal bilindfirînê, hêz û quwetê temsîl dike...

Di dema îro em tê de dijîn de, ala netewî ya Kurdan hemî Kurdan temsîl dike. Îro 45 milyon Kurd ne bê al e. Di nav alên cîhanê de alên bi sê rengan gelek pir in. Ji bo ku sê reng, rengên serkeftin, pêşketin û şoreşê hatine pejirandin. Yên di vê baweriyê de dibêjin cara yekemîn di sedsala 16an de, di şerê navbeyna Spanî û Holandiyan de, Holandiyan sê reng wek mişmişî, spî û şîn bi kar anîne. Wê demê Holand û gelê Holandî di bin nîrê Spanyolan de bûye. Paşê di ala xwe de li ciyê mişmişî rengê sor bi kar anîne. Di şoreşa Fransiyan de ew rengên ber bi pan, wek ber bi jor Fransiyan di tevgera xwe de nîşan dane û paşê jî, ji xwe re kirine ala netewî ya Fransayê.

Wisa xûya dibe ku kesê ala Kurdistan çêkirî, ew jî li geşedanên ku li jor hatine nivisîn agahdar bûye. Rengê alên pir welatan jî rengên xwe wek ala Kurdistanê ye. Lê şikil û sembolên alan, wan hev cuda dike. Dema cihê rengên ala Kurdistanê bên guherandin, rengên ala Îranê pêk tîne. Reng û şirîtên ala Macaristanê (Ungar, Mecar) bi her awayî dişibe ala Kurdistanê ye.



Di jiyana gelan de rol û wateya alan girîng e. Di dîroka Kurdan de cara yekem navê ala Kurd di efsaneya Kawayê Hesinkar de derbas dibe. Kawayê Hesinkar bi pêştemala xwe ya pê kar dike wek alê berjor radike û pêl pêl badike. Li dijî Dehaqê xwînrij ew serê xwe radike. Bi tevger, têkoşîn û raperîna xwe, ew bi ser dikeve. Tê gotin ku Kawa, Kurdan azad dike û dibe serokê Kurdan. Wek hikumdarekî dadmend welatê xwe bi rê ve dibe û pêştemala xwe jî wek ala Kurdan bi kar tîne.

Dema îro em li ser ala Kurdistanê rawestin, nêrîna ciranên Kurdan a li ser ala Kurdan qet ne baş e! Ji ber ku Kurd bindestin, ew bi çavekî neyartî li ala Kurdistanê dinêrin. Dixwazin bi nirxekî piçûk wê bê wate bikin. Lê Kurdên ku bi ala xwe re wek devê neyaran qise dikin re em ê çi bibêjin? Nezanîna kor, mirovan ji neyaran bêtir dike neyarê nijada xwe!..

**Gelo di jiyana mirov de al çi ye?**

Ez dixwazim hebûna alê cara yekem di jiyana min de çawa çêbû û min ew çawa nas kir, wê ji we re mînak bidim: Heya heft saliya xwe di jiyana min û di jiyana rojane ya şahiyên gundê me de wateya alê wisa bawer im ku tunebû. Heya salên 1950î li bakurê rojavayê welatê me tesîra şoreşa Kurdistanê gelek hindik bû. Ne navê Kurd û Kurdistanê, ne jî şiklê ala Kurdistanê di mejûyê Kurdên li wir dijîn de tunebû. Bes Kurdî diaxivîn û bi xwe re jî “Kurmanc“ digotin. Bi gotineke din, dema mirov ne di xizmeta neteweyê xwe de be, ew dibe pêyayê xelkên biyanî. Li rojavayê welat her ku dem diborî wek roja îro Kurd ber bi pişaftinê ve diçûn. Di wê demê de şerê di navbeyna kapîtalîzma cîhanê bi sîstema sosyalîzmê re hebû. Di navbeyna Koreya Bakur û Koreya Başur de jî şer derketîbû. Di şerê Kore de ji gundiyên gundê me jî yek tê de beşdar bûbû. Wî bi xwe re ala Koreya Başur jî anîbû. Wê demê wexta ku berbû diçûn bûkan bînin, digotin “Biçin ala Xalê Hesen bînin!“ Ew ala Koreya Başur pir salan li gundê me, di şahiyan de wek alan bi kar dihat.

**Di jiyana gelan de hebûnên girîng çi ne?**

Di jiyana netewan de gelek hebûnên girîng hene. Ji wan sê sembol pir girîng in. Ji wan girîngiyan yek ala netewî, duwem sirûda netewî û ya sêyemîn jî nexş û sînorên welat in. Sirûd û ala Kurdistanê îro baş xûya ye. Li ser wan qet ti guftugo nabin. Gotina ji rûspiyan hatî û dibêjin ku: “Her giya li ser koka xwe şîn dibe!” Her sazî, partî û komeleyên Kurd nîşaneke xwe heye. Her nîşan wê saziyê, an jî wê partiyê temsîl dike. Lê ala Kurdistanê hemû sazîyên Kurdan di bin siya xwe de li hev dicivîne. Pêwist e ku hemû sazî û partiyên Kurd jî, ew wek neteweyên din li ala xwe ya netewî xwedî derdikevin. Ew rêzik ne ji bo Kurdan tenê, ji bo hemû neteweyên cîhanê derbas dibe. Di hebûna sêyemîn de, yanê di sînorên nexşa Kurdistanê de, di mercên îro em tê de dijîn de mirov dikare bêje û rê heye ku li ser sînoran jî li hev neke. Ew ne di destê me Kurdan tenê de ye! Kesê kor dixwaze çavekî ronî, lê Xwedê du çavên ronî bidê, hîn çiqas xweştir jî dibe! Kurd sînorên tê de dijîn dixwazin wan hemûyan bi dest bixin. Xwestin tiştek e, lê xwedî derketin, bi dest xistin û paşê lê hikum kirin, ew tiştekî din e!..

**Di dîroka Kurdan de cara yekem navê ala Kurd di efsaneya Kawayê Hesinkar de derbas dibe. Kawayê Hesinkar bi pêştemala xwe ya pê kar dike, wek alê berjor radike û pêl pêl badike. Li dijî Dehaqê xwînrij ew serê xwe radike.**

## “Kurdên birûmet “Pêşmerge” qet tu caran çek ji destê xwe bernedane”

Paşê rêyek dirêj li ber min vebû û ez jî tevlî rêwiyên rêya têkoşîna azadiya Kurdistanê bûm. Di wê rê de hêdî hêdî qasî ji destê min dihat bi rêhevalan re, ez jî wek nîv sedsal e ku dimeşim. Lê ez îro li zaroktiya xwe ya wê demê dinêrim û difikirim ku mirovên wek min yên wê demê îro jî jimara wan ya di nav Kurdan de, ji jimara wê demê ne kêmtir e! Şaîrê Kurd, Nabî (1642-1712) bi eslê xwe Kurdê Rihayê ye û bi Kurdiya îro wiha dibêje: “Ew mahîna (masî) ku di nav deryayê de dijîn û lê nizanin ku ew deryaya tê de dijîn heye!“ Demên borî ne tenê li gundê me, dema mîritiyên Kurdan de jî hin mîrên Kurd bi neyarên Kurdan re şer kiriye. Hinek mîrên Kurdan jî li şer seyr kirine, an jî aliyê neyaran girtine!.. Sedsal wisa borîne. Di nîvê sedsala bîstan de Kurd ji xewa sedsalan ya reş şiyar dibin û li Rojhilatê Kurdistanê li Mahabadê (1946) Komareke Kurdan ava dikin. Lê komar zû hildiweşe. Alîkariya Kurdên li Rojavayê Kurdistanê dijîn bila li aliyekî bimîne, kes ne ji çêbûna wê, ne jî ji têkçûna wê haydar dibin. Li Başûrê Kurdistanê Kurdên bi rûmet “Pêşmerge” qet tu caran çek ji destê xwe bernedane. Paşê li Bakurê welat jî di destpêka salên 1970yî pê de dengê çekan careke din dest pê dike. Çi Başur, çi li Bakur, Rojhilat û Rojava li her derê Kurd li benda roja azadiya xwe bûn! Lê di dawî de li Kurdên Başur roj hilat û wê jî şewqa xwe daye hemû welat! Ew roja zer, tîrojên xwe avêtin her derê.

Wê bidome...





**MURAD CIWAN**



## ‘Ferman e, ferman e, fermana mîrên kurdan e!’

KUŞTINA MÎR ŞEREF XANÊ BEDLÎSÎ

Mîr Şeref Xanê Bedlîsî yek ji navdartirîn mîrên kurdan e. Ew wek mîrê Bedlîsa mîrekiyeka Kurdistanê ya girîng, xwedan roleka berbiçav e. Lê, ew bi şexsiyeta xwe ya alimî, hunermendî û tovavêjê bîrûbaweriya neteweyî jî derdikeve pêş.

Ew li sirgûnê li Îranê jidayik bû (1543), li malbateka xwedan ilm û îrfaneka bilind û hê ji piçûktiya xwe de li qesra Şah Tahmasp; bi mîrzayên Şah re mezin bû, perwerdeyeka pir alî a dînî, ilmî, siyasî, eskerî û hunerî girt. Wî Şerefname nivîsî ku li hundur û derve bû çavkaniyeka girîng a dîroka kurdan û a gelên deverê. Şerefname bi agahî û ramanên xwe yên neteweperwerî kitêbeka sereke ya kitêbxaneyên kurdan e.

Heta du sal berê, zanîn ew bû ku Şeref Xan di 1012 (1603-1604)ê de bi hemdê xwe miriye. Di 2015an de, du lêkolêrên bi navên M. Dehqan û V. Genç bi du meqaleyên* bi belge zanîna derbareyê awa û tarîxa mirina Şeref Xan a berê pûç kir. Belge, ji arşîvên ermenî û yên osmanî ne. Belgeyên ermenî tarîxa mirina Şeref Xan di navbera salên 1007 (1598-1599) û 1009 (1600-1601) de nîşan didin**. Li gor yên osmanî jî zelaltir dibe ku Şeref Xan di 1008 (1599-1600)ê de hê sax, di 7ê Şabana 1009 (11ê sibata 1601) ê de jî êdî mirî ye. Li gor vê, tarîxa mirina Şeref Xan 1600 yan jî hema destpêka 1601ê ye.

Belgeyên wan lêkoleran pêşkêşkirî her wiha derdixin ku Şeref Xan bi hemdê xwe nemiriye, di encama şerekî li gel Ahmed Paşayê beglerbegiyê Wanê de hatiye kuştin. Bi kuştinê re hecmeka zêde, xezîne, mal û milkê Şeref Xanî hatiye talan kirin, kurê wî yê heşt salî; Tatar û muhtemelen navmaliyên wî hatine revandin. Li gor arşîva osmanî, talana hezar bar akçe û xezîneyên Şeref Xan û sê hezar mal, alav û kincên malbat û merivên wî hatiye kirin û li Wanê, li malen radayî yên ketxudayê Ahmed Paşa; Mehemed, merivê wî Silêman û hinên din, di sindoqên kilîtkirî de hatine veşartin.

Ahmed Paşa, bi kêmasî ji sala 1007 (1598-1599) ê bi wir de beglerbegiyê Wanê bû. Çavkaniyên ermenî bi kêmasî du seferên wî yên ser Bedlîsê qeyd dikin. Yek jê sefera 1007 (1598-1599)ê ya din jî ya 1009 (1600-1601)ê ye. Muhtemelen Şeref Xan di vê seferê de hat kuştin.

Ahmed Paşa zû ji beglerbegîtiya Wanê hatiye stendin. Di 1602yê de ew beglerbegiyê Rumê (Sêwasê) xuya dibe.

Pirsgirêka êrîşa Ahmed Paşa ya li ser Şeref Xan, kuştina wî, talankirina mal û revandina maliyên wî, piştî çûna wî ya ji Wanê jî her dewam kiriye. Çimkî ew talan, muhtemelen hemî yan qismek girîng jê, li pey wî li wê derê, li nav lepên ketxuda Mehmed, Silêman û merivên din mane.

Belge nîşan didin ku xelkê Bedlîsê ji vê zilma mezin a Ahmed Paşa gelek bêzar e. Yek ji wan belgeyan nameya çend alimên dînî û rêberên civakî yên bilind ên Bedlîsê ye. Xwediyên nameyê lavayiyê li Sultan Mehemedê IIIyemîn dikin da zilma heyî bide rakirin û xelkê Bedlîsê ji ezayê xelas bike.

Yeka din jî nameya Xelef Begê birayê piçûk ê Şeref Xan e (ku di belgeyan de wek Xelef Xan tê binavkirin. Ew piştî mirina birayê xwe, demeka qasî 8 mehan bûye mîrê Bedlîsê) ji Sultan re, behsa kuştin, talan û revandinan dike û daxwaz dike ku ew, neheqiya li wan buyî rake, tawanbaran ceza bike.

Piştî Ahmed Paşa begêbeganekî bi navê Mustafa Paşa tayînî Wanê buye.

Li gor belgeyan, Padîşah tehqîqatekê li ser vê buyerê vedike û yekî bi navê Abdullah Axayê ‘kapicubaşî’ (serdergevan)yê Dergahê Alî (axayekî pilebilind ê yeniçeriyan ê dergahê Sultan bi xwe) dişîne Wanê. Encama tehqîqatê ne diyar e. Lê li Wanê eşkere dibe ku merivên Ahmed Paşa bi dizî ketine malên sindoq lê veşartî, kilît şikandine û hemî xezîne, mal û milk revandine. Heta ji fermanên Sultan ên şandî eşkere dibe ku Mustafa Paşayê xelefê Ahmed Paşa jî di revandin û veşartina wan talanan de rol leyistiye. Sultan vê di fermana şandî de li ruyê wî dixe û tehdîda cezakirinê didiyê.

(Hefteya bê ‘SEDEMÊ KUŞTINA ŞEREF XANÎ’)

## “Pêwîst e ku hemû Kurd li ala xwe xwedî derkevin”

Yekî dîn kevirekî davêje bîrekê, lê çil kesî baqil nikarin wî kevirî ji wê bîrê derxin!.. Di salên borî de li ser ala Kurdistan û sirûda netewî “Ey Raqîb” hin gengeşî dibûn. Lê ew gengeşî ne rast û ne di ciyê xwe de, ji aliyê welatparêzan ve zû hate vemirandin. Ji bo ku ala Kurdistan îro li ser erdekî azad ya bi navê Kurdistan li ser pênc milyon Kurd pêl dide. Ji xeynî neyarên Kurdan, gelo ma kî dikare li dijî rewşeke wisa û li dijî Ala Kurdistanê rawest e?.. Çend salan berê mirov dikarî li ser mijarên wisa biaxive. Lê di rewşa îro de dijmin bi dilê xwe bixwazin, an jî nexwazin ew Ala Kurdistanê dipejirînin. Dema xêrnexwazên Kurdistanê bi mêvanî diçin Kurdistanê bi gotina sirûda netewî “Ey Raqîb” bejna xwe li ber Ala Kurdistanê ditewînin. Ji bo vê jî pêwist e ku hemû Kurd ala xwe ya îro bipejirînin, lê xwedî derkevin û bejna xwe li ber wê bitewînin. Ew jî erka ser milê her Kurdî an jî her Kurdê ye!..

Lê ez dixwazim mijara alan bi çavekî zanistî bikolînim. Gelo ma roja em tê de dijîn, Kurdek dikare li dijî ala Kurd derkeve? Ez ne di wê baweriyê de me ku bi zanîna xwe Kurdek bêje: “Ez li dijî wê ala îro heyî me!“ Rengên ala Kurdan kesk û sor û zer, li navçeya wê de roja wek gewher, ma ji van rengan xweştirîn li cîhanê kîjan al hîn heye? Lê li gor her netewî ala xwe çiqas pîroz e, ala Kurdistanê jî, ji bo Kurdan ewqas pîroz e!..

# Kurdistan ji serok û hizban mezintir e



ŞEFÎQ PÊŞENG

Tîr ji kevanê derketiye. Miletek û dinya şahidê vê pêvajoyê ye, her tişt zelal e. Dîrok wê binivîse bê bexîl û dexs û rêgirên serxwebûna Kurdistanê kî ne.

Her kesê ji nifşa me ku têkiliyeke wî bi xebata birêxsitinî re çêbûye, heta her yekê ku pêvajoyên siyasî û civakî şopandiye, bi caran bûye şahidê gotinên: ''Em di demeke dîrokî re derbas dibin" an ''Biryarên vê civînê, komcivînê dîrokî ne." Dibe ku gelekan ji me jî ji bo vê an wê rûdanê, vê an wê biryarê, pênaseya 'dîrokî' bikaranîbe. Ku em bikaribin tebîeta mibalexe û girîngnîşandana tiştên em dibêjin deynin alîyekî jî bêşik, roj û mehên li pêşîya me dîrokî ne. Îtiraz û dudiliyên derbarê referendûma ku van rojan dike dîrokî, bi tu awayî nikarin vê binavkirinê sivik bikin.

Piştî tîr ji kevanê derket, bêfêde ye em bêjin: Ma ne zû bû? Xwezî beriya tîr ji kevanê derketa, derfeta bê zû ye an dereng e, derfeta tesbîta şida wê û hedefa wê bi zelalî û bi şêwra hemû pisporên şerê tîr û kevanê bihata minaqeşekirin. Rastî ev e: Tîr ji kevanê derketiye û em ne dikarin wê bisekinînin ne jî berê wê biguherînin.

Helbet behs, behsa referendûma Başûr e û helbet ji bo metirsiyan têra xwe sebeb li ber me hene. Roj bilez derbas dibin, ew roj nêzîk dibe lê hê jî em bi dilekî rihet nikarin bibêjin bê çi li pêşiya me ye.

Bêguman sebebê sereke yê vê rewşa ne zelal jî bicîneanîna lihevkirineke heta mimkin ya netewî wêdetir ji şêweya wergirtina vê biryarê tê. Bi gotineke din; Qelsiya vê biryarê û vê meşê ji qelsiya serweriyê tê. Li welatekî parlamento û hikûmetek lê hebe, birêveberiya welêt, ne di destê partiyan, di destê hikûmet û axirê parlamentoyê de ye. Loma jî zeafiyeta mezin ji aliyê parlamentoyê ve wernegirtin û nepejirandina biryareke wilo dîrokî ye.

Tê zanîn ku biryara referandûmê ji aliyê PDK û YNKê ve hat wergertin. Piştî hewldan, civîn û hevdîtinên demeke ne dirêj ji bilî Goran û Komelî Îslamî ya Kurdistanê, hemû hêzên din bûn xwedî û hevparên vê biryarê. Lê vê lihevhatina berfireh jî pêşî li ber minaqeşeyên meşrûîyeta referendûmê negirt.

Divê bê destnîşankirin; ya ku şuxilê me zehmet dike ne dijberiya Goran û Komelî Îslamî ya Kurdistanê ye, qelsî û heta tunebûna birêveberiyeke bêminaqeşe ye. Ev zeafiyet, dê heta roja referendûmê weke mûyekî di çavê me de be.

Lê li aliyekî pêvajoyeke biqisûr û beşer bûne sebebê wê, li aliyê din siberoja beşek ji milet û parçeyeke ji welatê me, tercîhekê li ser me ferz dike. An em ê ji vê qisûra hevalê xwe dîwarên rêgir li pêşiya serxwebûna welatê xwe ava bikin, an em ê mafê xwe yê rexneya li qisûrê deynin aliyekî û di ber vî barî rabin û vê karwanê birêketî bi silametî bigihînin cîhê wê.

Helbet naxwazim îdîa bikim ku van her du hêzên îro dijberiya referendûmê dikin û hewl didin miletê me jê sar bikin, ji tu kesî kêmtir ji milet û welatê xwe hez dikin. Lê rastiyeke din jî heye: Eger em li dora xwe, li helwest û livên van roj û mehên dawî binêrin, bi zelalî tê dîtin ku dijberê herî tund yê referendûmê Komara Îslamî ya Îranê ye. Helwesta Îranê ji ya Iraqê ku rasterast mixatabê encamên referendûmê ye, çend qat tundtir e. Û mixabin têkiliyên Îranê bi van her du hêzan re jî di asteke bilind de ne ku metirsiya fişarê li ser van hêzan zêde dike.

Axirê li gel kul û kêmasiyan, li gel qisûr û zeafiyetan, beşek ji miletê me di temamê dîroka xwe de dê cara yekemîn di mercên azad û bi şêweyeke demokratîk û tevî gel û civakên li wî parçeyên welatê me dijîn, bi refenedûmê ragihîne dinyayê bê çi dixwaze û dixwaze çawa bijî. Di vê pêvajoyê de erka dikeve ser milê her Kurdekî li hundir, bilindkirina rêjeya beşdariyê û li derve daxwaza rêzgirtina encama referendûmê û îradeya gelê(n) Kurdistanê ye.

Cîhê şanaziyê ye ku Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê û gelek welatan diyar kirine ku ew dê çavdêrên xwe ji bo referandûmê bişînin. Ev yek di heman demê de nîşana pênasîn û rêzgirtina ji encama wê re ye jî. Ji niha ve gelek welatên Ewropî qenaeta xwe ya ku Kurdistaneke serbixwe wê ji herêmê re aramî û aştiyê bîne û bibe keleheke demokrasiyê, diyar dikin. Hejayî gotinê ye ku heta niha ji Îran û Tirkiyeyê pê ve ti welatî nerazîbûna xwe ya li hember referendûmê eşkere nekiriye.

> Tê zanîn ku biryara referandûmê ji aliyê PDK û YNKê ve hat wergertin. Piştî hewldan, civîn û hevdîtinên demeke ne dirêj ji bilî Goran û Komelî Îslamî ya Kurdistanê, hemû hêzên din bûn xwedî û hevparên vê biryarê.

Eger em hemû qisûr û kêmasî û sebebên rexneyên xwe têxin ser hev jî, têra sebebeke rewa ya hewldanên pûçkirina referendûmê nakin. Di demeke ku derfeteke dîrokî derketiye pêşiya me de, nabe ku em ji bo jidestdana vê derfetê li hincetan bigerin, hincetan biafirînin û stratejiyan li ser dijberî û nakikoyên hizbî ava bikin. Divê tercîha Kurdan ne di navbera bergeha vê an wê hizbê, tercîha di nava statûyeke bi tayekî xav girêdayî û statûyeke qayim be. Divê tercîh di navbera Kurdistaneke di navbera hizban de û li ser rantê parvekirî an Kurdistaneke yekser be. Divê tercîh di navbera dewletokên hizba û dewleteke Kurdistanê be. Divê tercîh di navbera jiyaneke bi metirsiyan rûbirû û jiyaneke ewle de be. Divê tercîh di navbera Hewlêrê û Bexdayê de be.

### Imtîhan a milet e

Îmtihana pêşîya me, îmtihana miletê Kurd e. Çawa serkeftina vê îmtihanê wê ne serkeftina vê an wê hizbê, vî, an wî serokî be, wê ya miletê Kurd be, wilo jî dê têkçûna wê, têkçûna miletê Kurd be. Em dikarin li ser serkeftinê jiyaneke azad, aram, hevdem û di qada navnetewî de serbilind ava bikin, lê kes nikare li ser tekçûna miletê xwe jiyaneke bi rûmet ava bike.

Miletek û dinya şahidê vê pêvajoyê ye, her tişt zelal e. Dîrok wê binivîse; bê bexîl û dexs û rêgirên serxwebûna Kurdistanê kî ne.

Û axirê divê em jî bîr nekin, Kurdistan, doza Kurdistanê ji hemû serok û hizban mezintir e.

---



JAN DOST

## Pirsgirêka Elifbêyan

Nizanim çima gelek, ez jî pirê caran di nav de, dibêjin„ alfabe" û dev ji "elifbê" ya ku bi sedê salan e di nav me kurda de tê bikaranîn, berdane! Mirov bikaranîna peyveke girêdayî teknolojiya nûjen, têgeheke felsefîk... hdw, ku dibe hemwateya wê di kurdî de nebe, fam dike, lê ya ku nayê famkirin ew e, peyvên me yên ku ev bûne sedê salan di ferhenga me de hene, werin şemirandin û em rabin dest bavêjin „bêrîkên" cîran û rojavayiyan!

Hin ji elifbêya latînî aciz dibin û dibêjin ku ew ya tirkan e. bi rastî ev ergument qet ne di cih de ye. Ev tîpên ku niha em pê dinivîsin tu carî ne jî îcada tirkan e ku em wî qasî nefretê jê bikin. Tew em bibêjin ku ew berhemeke kemalîzmê be jî, em dikarin –gava ku bi kêrî me û zimanê me bê- bi rihetî ji xwe re bikin elifbê. Bikaranîna tîpên latînî ji zû de derbasî warê nivîsandina peyvên kurdî bûye, ji bo fonetîkên kurdî, kurdnasên rojavayî mecbûrî elifbêya latînî bûne û gelek tekstên kurmancî pê nivîsine.

Di kitêba Hugo Makas de (Kurdische Texte und Kurdische Studien) ku sala 1897an li St-Petersburg bi almanî çap bûye hin tekstên kurdî hatine ku hemû bi tîpên latînî ne, ji xwe Hugo Makas di destpêka kitêba xwe de wek elifbêyekê daniye da ku xwendina wan deqên kurdî ji xwendevanan re hêsan bike. Di kitêba Peter Lerch de jî (Forschungen über die Kurden und die Iranische Nordchaldär) ku sala 1857an cara yekem ew jî li St-Petersburgê bi almanî çap bûbû, gelek tekstên kurmancî, heta di dawiyê de ferhengek jî, bi herfên latînî hene. Yanî ewan lêkolîner û kurdnasên ku li ser tekstên kurmancî xebitîne, qet Mustefa Kemal nas nedikirn (ji xwe mêrik hîn ji dayik jî nebûbû) lê ewan dîtibûn ku tîpên latînî belkî jî bêhtir li peyvên kurmancî û fonetîkên wan tên. Ji bo vê jî nabe mirovek rabe navê elifbêya me ya kurmancî bike elifbêya Mustefa Kemal.

Lê li aliyekî jî hin hene dixwazin elifbêya kurdiya başûr ji holê rabe. Li başûr, çi bi biryara siyasî be çi jî bi tercîha xwendevan û rewşenbîr û nivîskaran be, divê yek elifbê hebe. Tu dewlet, qebûl nake ku kaos û tevliheviyeke wisa serî hilde. Ev pirseke stratejîk e û têkildarê avakirina hişekî netewî yî yekker e.

Ew çawa li hev dikin bila bikin. Bi zeman re wê ev pirsgirêk çareser bibe bêguman. Îca çima hinek ji me, ji kurdên bakur û rojava divê bibin berdevkê kurdên me yên başûr, ên ku em dibêjin qey tiliyên wan şikestîne nizanin binivîsin û zimanê wan şewitî ye nikarin biaxivin! Nivîksar û rewşenbîrên Duhok, Akrê, Amêdyê û Zaxoyê doza vê yekê bikin dikarin, ew mafê wan e. Lê ku em rabin serkêşiyê bikin, ew êdî destêwerdan e û neheqî ye. Ew parçe ji Kurdistanê bi kêfa xwe ye, çi elifbêyan bo xwe baş dibîne, kîjan zaravayî bo xwe minasib dibîne, ew azad e û biryara derbarî vê pirsgirêkê li zanayên wê derê vedigere.

Divê me realîteya ku kurd dabeşkirî nenas bikin û bipejirînin! Jixwe her parçeyek taybetmendiyên wî hene û ji parçeyên din cuda ye. Xwezî kurd ji hev ne cudabana lê cuda ne. Xwezî Kurdistan yek parçe baya lê ne wisa ye. Em nikarin xwe di ser van rastiyên geopolîtîkî re biqevêzin, em nikarin rastiyên tarîxê bikin qurbana xewnên xwe yê neteweperest.

Pirseke dawî :

Gelo çima rewşenbîr, zana, lêkolîner, nivîskar, akademîsyen û xwendevanên bakur xwe fêrî herfên aramî/erebî û xwendina berhemên «soranî» nakin û xwe ji ewqase berhemên nazik û şêrîn bêpar dikin. Eynî pirsê ji rewşenbîr, zana, lêkolîner, nivîskar, akadimîsyen û xwendevanên başûr û rojhilat jî tê kirin, gelo çima ew xwe hînî elifbêya latînî nakin û hayê wan ji pêşveçûna kurmancî nîne!

---

# Dîyarbekir, şîr û şekir



RECEB DILDAR

Bajarê qedîm ê ku her tim bûye delala ber dilê hov û talankeran û xwedî jê bêpar mane. Bi sedan salan, her carê hinek talankerên ku niha dîroknivîs navê şaristaniyê li wan dikin, bi zora şûrê bajar bi dest xistine û hatine li qesr û qonaxên wê rûniştine. Ji bo ewlekariya xwe jî serayên xwe û xelkê nav bajêr bi sûrekê ji hev qetandine. Aha ew ciyê ku her tim zordar hatine lê bi cî bûne, niha ji aliyê şêniyên bajêr ve wek "seray" tê bi nav kirin ku di nav keleha hundir de cî digire.

Ji xwe ciyê avabûna bajêr jî li dora Girê Wêran dest pê kiriye ku niha di nav "Seray"ê de dimîne. Her çiqas 5000 sal berê bajar bi destê Hûrriyan hatibe avakirin jî zêde di destê niştecihan de nemaye. Serdestên bajêr ji bo ewlekariya xwe, berê li dora derdora Girê Wêran kelehek ava kirine. Bi mezinbûna bajêr re, her çûye sûra derdora bajêr jî fireh bûye. Lê di firehbûna sûrê de qonaxeke gelek girîng heye. Piştî ku bajar dikeve destê împaratoriya Romayê, li dora bajêr sûreke fireh ava dikin. Sînorê sûrê yê rojava li ser Cadeya Gazî ya niha bûye. Yanî sûr ji Deriyê Çiyê yê niha rasterast diçû ser Deriyê Mêrdîn ê niha.

Kurdistan wê demê di navbera Roma û Sasaniyan de qada şer bûye. Gava Împaratoriya Sasanî bajarê Nuseybînê bi dest dixe, Îsewiyên wê derê tên li rojavayê Diyarbekirê bi cî dibin. Ji bo ewlekariya wan, waliyê wê demê sûra rojava dide xerakirin û wek ku kon jî di nav bajêr de bimînin, sûra îro niha li piyaye ava dikin.

Ji wê çaxê ve ye, desthilatdar û karmendên wan her tim yan di nav Serayê de yan jî li taxên derdora Serayê rûniştine. Bazirgan û dewlemendên Cihû û Ermen jî xwe spartine wan û heta Xançepekê berjêr hatine. Li taxên din ên derdora navenda bajêr jî xizan û belengaz rûniştine. Ji ber ku di nav wan de yên herî belengaz Kurd bûne, ji Xançepekê berjêr û heta Deriyê Mêrdînê û li hêla Rojavayê bajêr belav bûne. Kurdên li derdora Diyarbekirê berî ku bibin misliman bi piranî Êzîdî yan jî bi gotineke din Şemsî bûne. Perestgeha Şemsiyan heta salên 1900î jî di navbera Deriyê Mêrdînê û Goristana Deriyê Mêrdînê de bûye.

Perestgeheke din a Şemsiyan jî di nav birca Şemsiyan de ye ku di nav bircên sûra Diyarbekirê de ji bircên herî berbiçav yek e ku îro hinek rewşenbîrên bi ser Tirkî ve asîmîle bûne navê "Birca Keçî" lê kirine. Êdî nizanim ev nav ji bo wendakirina navê Şemsî lê hatiye kirin, ji ber tiştekî din lê hatiye kirin, ciyê lêpirsînê ye. Îcar hinekên din jî ji navê "keçî" dixwazin navê "Keçik" li bircê zêde bikin. Yanî herkes li gorî daxwaza dilê xwe, li ser çand û dîroka bajêr kab diavêje, êdî mîr ji kê re hat.

Nifûsa bajêr zêde bûbû û êdî di nav sûrê de hilnedihat. Di salên 1930î de dewlemendên bajêr xwestin ji nav gel derkevin û ji bo xwe ciyekî ewletir ava bikin. Ev cî ew bû ku îro em jê re dibêjin "Yenîşehîr." "Yenîşehîr" li rasta rojavayê bajêr hatibû avakirin ku di dema Sasaniyan de bi dehan car ev der di navbera wan û Romayiyan da bûbû qada şer. Ji ber ku ev hêl bi tenê rast bû, kîjan artêş bihata konên xwe li rojavayê bajar datanîn. Di van şerên hovane de Sasaniyan gelek caran bi xwe re fîl jî dianîn û Diyarbekirî derdiketin ser sûran û di nava tirs û xofeke mezin de li wan heywanên ecêb mêze dikirin.

Helbet nifûsa bajêr di ciyê xwe de nedisekinî, bi taybetî jî di her maleke xizan de heft-heşt heta neh-deh zarok hebûn. Ji ber wê, hewcedarî bi taxên nû hebû. Di salên 1960î de dewlemend û yên halê wan xweş her li "Yenîşehîra" xwe man, xizanan jî ji xwe re taxên wek Rezan( Bağlar), Şehîtlîk û Seyrantepe ava kirin û ji nû ve dor li dewlemendên bajêr girtin.

> Diyarbekir ji aliyekî ve bi lezûbezeke gelek ecêb qalikê xwe diguhere, li gorî derfetên nû taxên nû ava dike û di nav bajarên modern de ciyê xwe digire. Lê ji aliyekî din ve jî bajarê xwe yê qedîm winda dike.

Ji ber ku teknolojiyê derfetên nû derdidixist holê, dewlemendan jî dixwestin li gorî van derfetên nû ji bo xwe avahiyên nû ava bikin. Loma "Yenîşehîr"a ku êdî kevn bûbû di cî de hiştin û berê xwe dan Dîclekentê. Yanî careke din dewlemendan bajar li rojhilat hiştin û li rojavayê Rezan bajarekî nû ava kirin. Helbet dewlemendên ji xwe gelek razî êdî qîma xwe bi Dîclekentê neanîn û vîllabajarên wek Hamravat û Dîcle Vadî Evlerî ava kirin.


Diyarbekir ji aliyekî ve bi lezûbezeke gelek ecêb qalikê xwe diguhere, li gorî derfetên nû taxên nû ava dike û di nav bajarên modern de ciyê xwe digire. Lê ji aliyekî din ve jî bajarê xwe yê qedîm winda dike. Taxên di nav Sûrê de, malên ji bav û kalan mabûn yeko yeko tên hilweşandin û ew dîroka qedîm ya bi hezar salan tê tunekirin. Bajar bi hêlên xwe yên qedîm ji bajarên din vediqetin, bi wê çanda ku li ser bajarê qedîm ava bûye, dibe xwedî nasnameyeke cuda. Mixabin dagirker wezîfeya xwe baş dikin, bi hemû enerjiya xwe hewl didin ku qedîmiya ku mora xwe li nasnameya bajêr dixe winda û tune bikin.

Ew xaniyên ku bi kevirên bazalt ên ji Qerejdaxê pekiyabûn hatibûn avakirin, li ber devê bûldozeran yeko yeko hildiweşîn. Hinek jê bi kevirên nêr hatibûn lê kirin, şehkirina wan kevirên sert karekî gelek zehmet e. Kevirên nêr ji yên mê saxlemtir in. Lê xaniyên bi kevirên mê dihatin avakirin li gorî kevirên din hêniktir bûn. Berî dewr û dewrana ceyran û sarincan, jêrzemînên van xaniyan wezîfeya sarincan didîtin.

"Saray" ji xwe bi projeyekê, bi temamî hatiye vala kirin û niha wek muzeyekê kar dike. Lê muze jî bi heman awayî dixebite. Perdeyek li ser avahiyên qedîm ên ku di dîroka Kurdan de rol lîstine hatiye kişandin û dixwazin ew avahî bi awayekî din bên naskirin. Navenda zilm û zorê ya îşkenceyan, niha bi perdeya "Tematik Sergi Salonu," hepisxaneya kevn a di nav Serayê de jî niha wek depoya berhemên kevn tê bikaranîn û hewl didin ku şopên berê ji ser wan biguherin.

Ji bilî goristanan, Diyarbekir niha di nav bêdengiya berî tofanê de radize. Bi tenê Goristan zindî ne. Her rojên êvara înê, danê êvarê şêniyên bajêr diçin goristanên Deriyê Mêrdîn û Yenîkoyê bi ser kuştiyên xwe de digirîn. Bi Kurmancî û Zazakî kela dilê xwe bi ser kuştiyên xwe de dilorînin.

Bajar bêdeng e lê goristanên wê zindî ne.



# Roj li DAÎŞê ava bibe, dibe ku şerê DYA û Îranê dest pê bike



ESKENDER CEIFERÎ

Rêxistina DAÎŞê hem li Sûriyê û hem jî li Iraqê ber bi lawaziyê ve diçe. Piştî têkçûna wê grûpê, dijberên wê û dewletên navendî yên Bexda û Şamê jî wê hewl bidin bikevin dewsa wê. Amerîka, Hêzên Sûriya Demokrat ku nêzîkî PKKê ne, pirçek dike. Tevî wê, ew hêz qet şerê dewleta Sûriyê nakin. Dewleta Sûriyê jî bi alîkariya Komara Îslamî, hewl dide rojavayê Sûriyê kontrol bike lê Amerîka bi vê gavê dilgiran e. Li heman navçeyê, niha Amerîka mijûlî perwerdekirina dijberên DAÎŞê ye.

Ji aliyekî ve PKK bi daxuyaniyekê, piştgirî daye referandûma Başûrê Kurdistanê û ragihandiye ku heke rewş were guhertin, ew jî amade ne li dijî Îranê şer bikin. Ji aliyekî din ve bi nêzîkbûna PKKê li Amerîkayê û bi daxuyaniyên PKKê, Komara Îslamî ji wê partiyê dudil e û ji xwe re jî bo avakirina hevpeymaniyekê li pey alternatîvekê digere. Belkî bijardeya herî nêzîk ji Komara Îslamî, hêzên Îslamî bin.

Donald Trump berî ku bibe serokkomar, ragihand ku ew bi awayekî rasterast di şerê li Sûriyê û navçeyên din yên Rojhilata Navîn de beşdariyê nakin. Lê niha berovajî wê demê, DYA bûye yek ji wan hêzan ku li wê navçeyê şerekî bi nûneratî li gel eniya Rûsiye û Îranê dike. Ji destpêka hatina Trump ve, DYAyê herî kêm pênc êrîş birine ser navendên serbazî yên dewleta Sûriyê ku armanc jê, piştevaniya şêwirmendên Amerîkî û hêzên di bin bandora wan de hatiye ragihandin. Ev kiryar, zengila metirsiyê ya derketina şerekî mezintir in.

**"Îran mezintirîn piştevana terorê ye"**

Heftiya derbasbûyî, dîsa DYAyê weke 32 salên beriya niha raportek li ser piştevanên terorê belav kir û careke din teqez kir ku Îran mezintirîn piştevana terorê ye. Wezareta Derve ya Amerîkayê vê heftiyê di raporta xwe de ragihand ku Îran, herî kêm li Sûriye, Îraq, Filîstîn û Yemenê piştevaniya terorîstan dike û Sipaya Pasdaran û Wezareta Îstixbarata Îranê, du ji wan saziyan in ku navên wan jî di raportê de hene.





Li gora Amerîkayê, Komara Îslamî, mezintirîn metirsî li Rojhilata Navîn e ku gefê li hemû cîhanê dixwe. Rast e Trump piştî ku hate ser kar, gelek ji sozên xwe ji bîr kirin yan jî nermtir bû, lê di mijara Îranê de heman siyasetê bi kar tîne ku propagandeya wê kiribû.

DYA dibêje êdî DAÎŞ ewqasî lawaz dibe ku dixwaze hêzên xwe vekişîne û di nav axa welatekî din de hêzêke nû ava bike. Bi nemana vî şerî, hincetek namîne ku Beşar Esed li ser kursiya xwe mayînde bibe. Ji ber vê, ji niha ve li bendê ye ku şerekî din yê bi nûneratî dest pê bike. General Rîmond Mak şêwirmendê ewlehiya netewî ya Amerîkayê ragihandiye ku li ser maseya wan bijardeya vî şerî heye û dibe ku ew li Sûriyê li hemberî hêzên Tehranê û yên Şamê derkevin. Êdî dibe ku Amerîka jî plana xwe ya nehêlana DAÎŞê, piştî têkçûna wê grûpê, bike guhertina Esed û lihemberderketina Rûsiyê û hevpeymanên wê.

Li gora Amerîkayê, Komara Îslamî, mezintirîn metirsî li Rojhilata Navîn e ku gefê li hemû cîhanê dixwe. Rast e Trump piştî ku hate ser kar, gelek ji sozên xwe ji bîr kirin yan jî nermtir bû, lê di mijara Îranê de heman siyasetê bi kar tîne ku propagandeya wê kiribû. Ew dixwaze hêla Tehran, Bexda, Şam û Beyrûtê sist bike. General Matîs wezîrê Berevaniyê û General Mak ragihandine ku ew ê gefên Komara Îslamî, bi dawî bînin.

Ew dibêjin, 'em rê nadin navçeyên ku DAÎŞê ji dewletê û ji opozîsyona lîberal ya Sûriyê standine, careke din bikevine destê Şamê'. Ji ber ku di du salên derbasbûyî de hêzên bejayî yên Hizbulla yên Lubnanê û Sipaya Pasdaran ya Îranê bi piştevaniya hêzên esmanî yên Rûsyayê, gelek navçe ji opozîsyonê standine û ev jî, gef in li ser berjewendiya Amerîkayê li herêmê. Lêbelê heke dewleta Sûriyê bikare Dêra Zorê kontrol bike, êdî bi hêsanî heyva şîe ava dibe. Bi van kiryaran jî ne Amerîka razî dibe ne Îsraîl û ne jî Erebistana Siûdî.

Îranê karî di serdema Barack Obama de Rêkeftina Etomî imze bike lê heya niha jî tevahiya dorpêçan nehatine rakirin û hin dorpêçên aborî yên nû jî li ser Îranê zêde bûne. Êrîşa moşekan ya ku Îranê li ser DAIŞê li Sûriyê pêk anî, manora hêzê bû ji bo ku Amerîka dev ji rekeftinê bernede û nekeve fikra şerekî bi nûneratî. Lê bi daxuyaniyên berpirsên bilind yên Amerîkayê xuya dibe ku ew li hemberî Komara Îslamî çiqasî xurt in.

Li gora Amerîkayê, çareseriya kirîza Sûriyê di guhertina Beşar Esed de ye lê li gora Rûsyayê, Îran û Lubnanê, çareser vegerandina tevahiya navçeyan ji bo Beşar Esed e.

# Şûnwarên dîrokî li Sine jinav diçin



Mîratên dîrokî, nasname û çanda her neteweyekî ne ku pêwîst e ji bo parastina hebûna wê neteweyî, ew şûnwarên dîrokî jî bêne parastin. Beşek ji vê berpirsyariyê li ser milê xelkê ye û beşa herî zêde dikeve ser dewletan.

Li bajarê Sine hin şûnwar hene ku ji ber nebûna alîkariyên hikûmî ji bo parastina wan, ber bi jinavçûnê ve diçin û hinek ji wan bitemamî wêran bûne. Kolanên kevn yên Sine, bêhna xemsariyê didin.

Nirxa şûnwarên dîrokî, girêdayî çawaniya avakirina wê û serdema wê ye. Lê ji berpirsên saziya Mîratên Destî û Çandî yên Sine re girîng nîn e kîjan şûnwar ya kîjan serdemê ye. Ji wan re girîng e kîjan şûnwar zêdetir nêzîkî navenda bajêr e ku wê biparêzin û nûjen bikin, lê şûnwarên din paşguh dikin.

Di vê derbarê de Nadir Zendî rêveberê endazyarên Mala Hunermendên Sine, dibêje ji sedî 60 heya sedî 70 malên kevnar yên bajarê Sine, nasnameyeke dîrokî hene û xwediyê taybetmendiyên di warê endazyariyê de ne. Di rîzbendiya avahiyên dîrokî de li wî bajarî, sê desteyên avahiyên dewletî, yên xelkê dewlemend û yên normal hene. Beşeke zêde ji malên kevnar li wir, ji kevirên taybet hatine çêkirin. Saziya Mîratên Destî û Çandî jî ragihandiye ku ew ê hewlên xwe ji bo régirtin li wêranbûna wan avahiyan xurttir bikin lê saziyên pêwendîdar, bûdceya pêwîst nadin wan. Dema ku bûdce tê mezaxtin, ji bo xaniyên kevnar yên dewletê tê xerckirin lê xaniyên normal ji bo parastin û nûjenkirinê, di astên herî dawiyê de ne. Ya rast ev e ku malên kesên normal, dîroka bajêr nîşan didin û pêwîst e ew mal jî bêne parastin.

"Di malên Kurdan de ciyekî taybet ji bo mêvanan tê terxankirin û di hemû malên kevnar yên welatiyan de Dîwanxane û kursiyên zivistanê jî hene lê di malên kevnar yên dewletê de Dîwanxane û kursiyên zivistanê tune ne."

Endazyariya normal, giraniyê dide ser jiyana rojane ya xelkê û Mala Hunermendên Sine jî, ji sedî 90 lêkolînên xwe di vê derbarê de encam dide lê bûdceya karên wan, nîvî tê dayîn ji ber ku giraniyê nadin ser malên kevnar yên dewletê.

Nadir Zendî got ku di malên Kurdan de ciyekî taybet ji bo mêvanan tê terxankirin û di hemû malên kevnar yên welatiyan de Dîwanxane û kursiyên zivistanê jî hene lê di malên kevnar yên dewletê de Dîwanxane û kursiyên zivistanê tune ne. Bi vî rengî nûjenkirina malên dewletê, nikare bibe sedema vejandina wê çandê. Endazyariya modern jî, ji bo pêşxistina civakê pêwîst e lê nabe endazyariya kevnar bê jibîrkirin.



Hin malên kevnar hene ku di destê welatiyan de ne û dewlet jî qet bûdceyekê ji bo kirîna wan terxan nake.

Herwisa ji bo danîna projeya kişandina bala torîstan bi malên kevnar ve karek nehatiye kirin. Beriya niha hatibû ragihandin ku wê di wan malan de karmend bêne danîn ji bo ku torîst bikarin serdena wan bikin û dahata wan ji bo bajar bê xerckirin. Lê hin malên kevnar li Sine hene ku xelk tê de dijîn û kesek jî nizane kevnar in. Tevî ku li Sine gelek malên kevnar û yên bi endazyariya Urusî hene û Mala Hunermendan jî daxwaz kiriye ku radestî ciwanan bêne kirin ji bo ku tevlî torîzmê bikin, lê saziya Mîratên Destî û Çandî, bi hênceta rênedana yasayê, vî karî encam neda.

Ji ber nebûna agahiyên pêwîst ji aliyê welatiyan ve, heya niha gelek avahiyên kevnar hatine wêrankirin û malên modern li dewsa wan hatine çêkirin lê şaredariya Sine, li dewsa ku rê li ber wan bigire, bi rengekî yasayî daxwazên wêrankirina wan malan erê kirine.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Li sînorê Kotolê yê Xoyê kolberekî Kurd ê bi navê Emîr Xalidî bi teqeya rasterast ya hêzên sersînor yên Sipaya Pasdaran hate kuştin û sê kes jî birîndar bûn. Birîndar ji bo nexweşxaneya Xoyê hatine veguhestin.

Li ser riya Riwanser-Ciwanroyê du ciwanên Kurd ên bi navên Hamid Welîmuradî û Welî Xanî di encama teqeya hêzên ewlehî de jiyana xwe ji dest dan û kesekî din jî birîndar bû.

Li nêzîkî gundê Bîwranê yê Serdeştê, komeke kolberan rastî êrîşa hêzên sersînor hatin û di encama teqeya wan hêzan de, herî kêm 25 hespên kolberan sikitîn. Her wisa hêzên sersînor dest danîne ser kelûpelên kolberan. Piştî re pevçûn di navbera kolberan û wan hêzan de derket.



Li girtîgeha Urmiyê, Ferzad Esxerzade, Perwîz Temirîpûr, Ramîn Hinare, Maşella Seyadî û Mihemedriza Sadiqî, bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber hatin darvekirin. Herwisa Birzû Şêxî bi tometa kuştina kesekî hate îdamkirin.

Li girtîgeha Urmiyê, Ferzad Esxerzade, Perwîz Temirîpûr, Ramîn Hinare, Maşella Seyadî û Mihemedriza Sadiqî, bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber hatin darvekirin. Her wisa Birzû Şêxî bi tometa kuştina kesekî hate îdamkirin.


Tahir Qadirzade mamostayê xwendingehekê li Seqizê bi sê salan girtinê hate cezakirin. Tometa wî hewldan li dijî ewlehiya netewî û organîzekirina meşên girseyî yên nerazîbûna mamostayan bû.

Mêhdî Tewekulî wênegirê Sineyî ku salekê beriya niha hatibû girtin, bi du salan girtîgehê hate cezakirin. Tometa wî lidarxistina pêşangeheke wêneyan li ser mijara şerên Şingalê û Kobanê bû.

Elî Mehmûdî kurê Weysî, xelkê navçeya Deştebêlê ji aliyê hêzên Sipaya Pasdaran ve hate girtin. Tometa wî endametî di partiyeke Kurdî de hatiye ragihandin û heya niha nehatiye zanîn ew li ku derê girtî ye.

Hêzên Îstixbarata Îranê li bajarê Şinoyê welatiyekî bi navê Sîrwan Karsaz xelkê gundê Şêxanê, bi tometên siyasî binçav kir û ji bo cihekî nediyar veguhestin. Malbata wî serî li saziyên ewlehî û yên dadê dane lê bersiva wan nehatiye dayîn.

Hesen Emînî endamê rêveberiya Civata Olî ya Sunneyên Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê dadgehê ve hate neçarkirin ku çalakiyên wê civatê bide sekinandin. Çalakiyên wan di demên dawiyê de li ser girtina oldarên Sunne zêde bibûn û ji dewleta Îranê xwastibûn wan çalakvanan serbest berdin.



Dadgeha pêdeçûnê ragihand ku Mesûd Alanî hunermendê Kurd, divê ji bo derbaskirina cezayê girtinê yê neh mehan here zîndanê. Wî hunermendî, salek beriya niha hin helbestên di derbarê partiyên Kurdî de kiribûne stran. Tometa wî pêwendî bi partiyeke Kurdî re hatiye ragihandin.

Heftemîn kes ji malbata Husênpenahî li Sine hatiye girtin û heya niha kesek nizane ew li ku derê têne ragirtin. Tometa wan pêwendî bi partiyeke Kurdî re ye. Ehmed, Zubêr, Ramîn, Ebas, Kêywan, Enwer û Efşîn mehek beriya niha, piştî şerê di navbera pêşmergeyên partiyeke Kurdî bi Sipaya Pasdaran re li Sine hatin girtin.

Jineke Kurd bi navê Şilêr Xusrewî xelkê Bokanê, piştî ku sê sal û nîvan di girtîgehê de ma ji darvekirinê rizgar bû. Ew jina 33 salî bi tometa kuştinê bi cezayê darvekirinê hatibû mehkûmkirin.

Xortekî xelkê Dîwandere bi navê Ebdulla Bişkar ku bi tometa kuştina hevjîna xwe bi navê Ayşê Kerîmiyan bidarvekirinê hatibû cezakirin, bi erêkirina malbata hevjîna xwe ji îdamê rizgar bû. Ebdulla Bişkar tometbar bû ku heft salan beriya niha hevjîna xwe kuştiye.

# Gelo Çîn berê bazirganiyê digûherîne?



DERYA KILIÇ




Her çiqas ev veberhênan û daxwaza piyasa serbest a Çînê, ji aliyê dewletên rojavayî ve baş bê dîtin jî ji ber rîskên dihewîne, wan dixîne nav fikaran.

Lûtkeya Rêya Hevreşîm ku Çînê demeke dirêj danasîna wê dikir, bi beşdariya 29 serok û berpirsên dewletan û nûnerên Banka Cîhanî û Fona Pereyan a Navdewletî di 14-15ê Gulanê li Pekînê hat encamdan. Lûtkeya ku bi navê 'Xelekek, Rêyek: Ji bo xweşhaliya hevpar hevkarî' ji bo projeya Rêya Hevreşîm ya Çînê ku wê li Asya, Afrîka û Ewropayê veberhênanên binesaziyê yên mezin bi xwe re bîne, girîngtirîn kombûn hat dîtin.

**Projeya Rêya Hevreşîm çi ye?**

Projeya Rêya Hevreşîm a Nûjen ku ji aliyê serokê Çînê Şi Jinping ve 2013an de bi navê 'Xelekek, Rêyek' hat pêşkeşkirin, weke pêngavake aboriyê ya Çînê bi rêya bejahî û deryayê bo Ewropayê derket holê. Çîna ku hemû welatên li ser Rêya Hevreşîm a dîrokî cih digirin bo vê projeyê vexwend, armanc dike ku li Asya, Afrîka û Ewropayê veberhênan mezin bike. Pekînê eşkere kir ku heta niha di çarçoveya vê projeyê de zêdetirî 300 milyar dolaran rêkeftin ji bo veberhênanê kirine. Tê pêşbînîkirin ku di heyama pêşiya me de jî di vî warî de salane 125 milyar dolaran veberhênan pêk bîne.

Çînê ji bo vê projeyê di 2014an de Fona Xeleka Aboriyê ava kir û ji bo vê fonê jî 40 milyar dolar çavkanî veqetand. Ji bo piştevaniya projeyê jî di Mijdara 2014an de bi veberhênaneke 100 milyar dolarî Banka Veberhênana Binesaziyê ya Asyayê damezirand.

Ekonomîstê Dezgeha Lêkolînên Siyasî, Aborî û Civakî (SETA) Şerif Dilek, li ser projeya Rêya Hevreşîm a Modern bersiva pirsên Heftenameya Basê dan.

Li cîhanê gelek platform û lûtkeyên aboriyê hene. Armanca vê projeyê çi ye? Wê mîna G8-20 an jî Forûma Aboriyê ya Cîhanê bibe?

Çîn di nava pergala navdewletî de bi hêza xwe ya mezin û bi avakirina saziyên alternatîf tê rojevê. Zêdebûna hêza aboriya Çînê ya li hemberî hêza DYAyê ya navdewletî, weke kaşbûna ekonomî polîtîka cîhanê ji Atlantîkê ber bi Pasîfîkê ve tê nirxandin. Ev geşedan em dikarin weke perçeyekî stratejiya bidestxistina serokatiya aboriya cîhanê ji aliyê Çînê ve ku niha di cîhanê de aboriya duyem e, bibînin. Em dikarin bibêjin ku ev hevsengiyên herêmê yên diguherin biqasî aboriyê wê di warê siyasetê de jî bandora xwe bikin. Projeya Rêya Hevreşîm a Modern em dikarin weke nîşandana hêzê ya Çînê di qada navdewletî de bibînin. Çînê bi projeyên xwe nîşan da ku ev aniye rewşa projeyeke gerdûnî. Ev proje ji G8, G20 û Forûma Aboriyê ya Cîhanê gelekî cuda ye. Ev ji bo wê ye ku Çîn zûtir û hêsantir xwe bigihîne bazarên Asyaya Navîn, Ewropa, Rojhilata Navîn û Afrîkayê. Çîn ku aktorê vê projeyê ye di vê çarçoveyê de projeyên xwe yên din jî bicî dike.



**Naveroka vê projeyê çi ye? Gelo ev proje wê di navbera rojhilat û rojava de bibe pirek?**

Ev projeya ku ji bo ji nû ve vejandina Rêya Hevreşîm a Nûjen e, 2013an de cara yekem ji aliyê Serokdewletê Çînê Şi Cinping ve hat rojevê. Di vê projeya ku aliyên wê yên bejahî û deryayî hene, Çîn dixwaze di serî de welatên Asyayê, Afrîka û Ewropayê jî li xwe bigire û veberhênanên mezin bike. Çînê ji bo vê projeya dîrokî 40 mîlyar dolar veqetand bo Fona Xeleka Aboriyê ya Rêya Hevreşîmê ku 2014an de hatibû avakirin. Di vê çarçoveyê de ji bo alîkariya vê projeyê, di 2014an de bi 100 milyar dolaran Bankaya Veberhênanên Binesaziyê ya Asyayê ava kir.

Çînê di çarçoveya projeya OBORê de zêdetirî 300 milyar dolarî peymanên veberhênanê pêk anîne û ji bo heyama pêşiya me jî salane zêdetirî 125 milyar dolaran rêkeftinên veberhênanê wê pêk bîne. Lingê bejahiyê yê vê projeyê ji Çînê dest pê dike û bi rêzê tê Asyaya Navîn, Îran, Tirkiye û pişt re diçe Ewropayê û herwiha dema ku gihişt Rotterdamê berê xwe dide Vendîkê û li vir bi dawî dibe. Aliyê vê projeyê yê deryayê jî; Ji Deryaya Çînê ya Başûr heta Kalkutayê û pişt re ji Okyanûsa Hîndê diçe Kenyayê û Derya Sor û Derya Spî derbas dike.Herî dawîn jî li Venedîkê herdu aliyên projeyan digihîjin hev. Pekîn bi vê projeya ku tê pêşbînîkirin di navbera rojhilat û Ewropayê de peywira pirekê bistîne, dixwaze ji Asyayê heta Ewropayê û ji Rojhilata Navîn heta Afrîkayê li herêmeke berfireh entegrasyonekê pêk bîne.

**Dema ku mirov li vê projê dinêre vegereke heye bo berê, gelo Çîn berê ticaretê digûherîne?**

Vejandina Rêya Hevreşîm a Dîrokî ji bo vegûhastina bazirganiya ji Rojhilata Dûr ber bi Ewropayê ve wê bibe destpêka proseyeke karîger û bilez. Ji xwe Rêya Hevreşîm jibilî ticaretê ji bo vegûhastina bawerî, şaristanî û ramanan jî peywîreke girîng li xwe girtiye. Çîn jî bi vejandina û modernîzekekirina Rêya Hevreşîm cudahiya vîzyona xwe nîşan dide. Wê Asya ji bo rêyên aboriyê yên navdewletî bibe navend û di her warî de danûstandinên di navbera rojhilat û rojava de wê zêde bibin.

**Dema ku me li projeyê nêhêrî, serketî û binketiyên vê projeyê kî ne?**

Dema ku mirov li welatên li ser vê rêyê nêrî mirov dibîne ku hemû ew welat in yên ku ber bi pêşveçûyînê ve. Mezinahiya van welatan bi qasî 21 trîlyon dolar e û ev jî girîngî û potansiyela projeyê nîşan dide. Ev bi taybet jî ji bo wan welatên ku ji Sowyetê veqetiya ne di warê entegrasyona bi bazirganiya cîhanê ve wê bibe destpêka heyameke nû. Welatên Asyaya Navîn bi vê projeyê wê gelek destkeftan bi dest bixin. Dewlemendiya çavkaniyên xwezayî yên van welatan wê hêsantir bigihîjin bazara cîhanê.

**Avantaj û dezavantajên vê projeyê çi ne?**

Ev proje herêmeke berfireh li xwe digire. Bi vê projeya ku Çîn serkêşiya wê dike û navend e, wê ji bo bazara Ewropa û cîhanê vegûhestineke hêsantir û karîgertir pêk were. Her çiqas aliyê vê projê yê aborî derkeve pêş jî di warê siyasî û civakî û çandî de jî entegrasyona van welatan wê zêdetir bibe. Ev proje wê hevkariya di navbera welatan bi xwe re bîne û serkeftina dualî wê pê re were. Entegrasyona di navbera rojhilat û rojava de wê zêde bibe.

## "Dewletên rojavayî ku îddîa dikin Çîn stratejiya hêza xwe ya aborî pêk tîne, li hemberî vê projeyê bi fikar in?

Welatên rojavayî îddîa dikin ku Çîn hêza xwe ya aborî pêk tîne û birêve dibe. Ji ber vê yekê li hemberî vê projeyê bifikar in. Girîng e di heyameke ku di warê aboriyê de polîtîkayên girtî û îzolasyonîst birêve diçin de, Çîn bi projeya ticareta serbest derkeve holê. Ev helbet dewletên rojavayî dixe nav fikaran ku niha kontrola aboriyê di destê wan de ye.

Jibilî vê yekê, tengbûna daxwazan di aboriya gerdûnî de, rîskên herêmî û nediyariyên gerdûnî. Di heyameke ku DYA ya di bin rêveberiya Trump de ku di warê aboriyê de polîtîkayeke tengtir û bi parastin dimeşîne, Veqetîna (Brexit) Îngîltereyê ji YE û heyameke ku di nava YEyê de 'Brexit'n nû tê niqaşkirin, bicîkirina vê projeyê ji aliyê Çînê ve xwedî girîngiyeke mezin e.

---

Georgia:

# Rûdana hişmendiya netewî û serxwebûn

DILŞAH AMEDÎ



Komara Georgia pireke di navbera Ewropa û Asyayê de ye. Her wiha beşek ji 'Rêya Hevrişîmê' ye jî. Gelê Gurcî yek ji şaristaniyên qedîm ên Kafkasyayê ye.

Damezirandina Georgia digihîje serdema 12. beriya mîladê, lê belê ev herêm bi hezaran sal e ne gihîştiye asta dewletbûnê. An di bin dagirkeriya welatên din an jî mîrîtiyên di bin bandora prensan de bû. Gelek caran hewldanên yekbûnê hatibin dayîn jî ev hewldan bi ser neketine.

Dagirkeriyên ku ji aliyê Rûsyayê ve hatine kirin ji bo Georgia bûne mîlad. Gelek caran serî hildane lê ev serhildan bi tundî hatine rawestandin. Ligel vê yekê di 1918an de serxwebûna xwe bi demkî îlan kiribin jî ji aliyê Rûsyayê yanî Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sowyetê ve careke din hatiye dagirkirin. Piştî ku SSCB hilweşiya Gurcîstan çû referandûmê û serxwebûna xwe ragihand.

**Asêmayîna di navbera Osmanî û Îranê de dagirkeriya Rûsyayê**

Dîroka Georgia di navbera sedsalên 15. û 19. de nêzîkî 350 salî di bin dagirkeriya Osmanî û Îranê de derbas bûye. Piştî bidestxistina Stenbolê ji aliyê Osmaniyan ve, têkiliyên Georgia bi Ewropayê re qut bûn. Gurcîstan ji Rojava ve di bin êrîşên Osmanî ji Rojhilat ve di bin êrîşên Îranê de bû. Herêm car caran bûye navenda şerên Osmanî û Îranê jî. Di van şeran de prensên Gurcî carinan aliyê Osmanî carînan jî aliyên Îranî girtine. Bi taybetî mîrên herêmên Ahiska û Acara ku Misilmantî pejirandine û Kirîstiyanên Guria, Îmeretî û Megrelya ketine bin dagirkeriya Osmaniyan. Mîrên li bendava Hezarê ku misilman in û Kartlî û Kakhetî jî ku Kirîstiyan in ji aliyê Îraniyan ve hatine dagirkirin.

Osmaniyan di sedsala 16. de Rojavayêbaşûrê Georgia jî dagir kirin û li vê herêmê Eyaleta Çildirê ava kirin. Artêşa Osmaniyan di sala 1510an de ket axa Kraliyeta Îmeretî û paytexta Kraliyetê, Kutaisiyê dagir kir. Piştî wê, Şahê Îranê Îsmaîlê yekem êrîşî Kartlî kir. Osmanî di sala 1578an de ketin Tiflîsa paytexta Georgia û bi vî awayî Rojavayê Georgia ket destê Osmaniyan, Rojhilat jî ket destê Îranê. Kral Erekleyê duyem (1744-1798) Mîrîtiyên Kartli û Kahetî kir yek û bi vî awayî Rojhilatê Georgia yekalî kir. Di vê navberê de Osmaniyan Mîrê Îmeretê Solomonê yekem ji Îmeretê derxist.

Di navbera salên 1762-1783an de li Georgia doza Osmanî, Îranî û Rûsyayê hebû. Georgia berê xwe ber bi Rûsyayê ve da û di ancamê de, di sala 1783an de Kral Îraklî, bi Çarîçeya Rûsyayê Katerîna duyemîn re li hember nasîna mafên siyasî peyman danî û tevlî Rûsyayê bû. Li gel vê rûdanê di sala 1795an de Şahê Îranê Axa Mehmet Xan bajarê Tiflîsê dagir kir û qismek ji gelê Gurcî sirgûnî Îranê kir. Li hember van êrîşan Rûsyayê Gurcîstan bi tenê hişt. Rûsyayê di sala 1801an de Kartlî û Kahetiyê bidest xist û Gurcîstan kir eyaleteke xwe. Prens û arîstokratên Gurcî bo careke din damezirandina dewletê gelek xebat kirine lê ev xebat bê encam mane. Di nîvê sedsala 19. de serhildanên Gurciyan li hember Rûsyayê têk çûne. Rûsya bo Georgia bi giştî bixe bin qontrola xwe prens û arîstokratên Gurcî sirgûn dike û gelekan ji wan jî îdam dike. Ji bo zimanê Gurcî bê jibîrkirin dibistan û dêrên Gurcî digire. Ev serhildan di salên 1812an de li Kahetî, 1820an de li Îmeretî, 1828an de Guria û di sala 1832an de li seranserê Georgia rû didin û têk diçin.

Gurcîstan di şerê cîhanê yê yekem de ket bin qontrola Almanyayê. Di salên 1915-1916an de komîteya Gurcî, Azerî û Delegeyên Kafkasyaya Bakur di serî de li Berlîn û Viyanayê danûstandinan dikin. Ji bo azadkirina Kafkasyayê xwestin konfederasyona ji Azerbaycan, Ermenistan, Gurcîstan û Şimalê pêk tê ava bikin. Di sala 1918an de Komara Maveray-i Kafkasya ji aliyê Ermenistan, Azerbaycan û Georgia ve hat îlankirin lê belê emrê vê komarê gelek kin bû. Georgia di 26ê Gulana 1918an de serxwebûna xwe îlan kir.

"Ji ber dagirkerî û mêtîngeriyê, di nav Kurdan de hestên netewî kêm in. Ji ber kêmasiya hestên netewî, empozebûna pergala dewletên dagirkeran bi hêsanî pêk tê. Eger referandûma Herêma Kurdistanê bi serkeftî pêk were dê li beşên din fikra netewî jî xurt bibe."

**Piştî êsirtiya hezar salî rûdana hişmendiya netewî**

Pirvelî Dasî( Koma yekem) ji aliyê Îllîa Çavçavadze di sedsala XIX. de dest pê kir. Bi pêşengiya Îllîa Çavçavadze entelektuelên Gurcî dest bi tekoşînê dikin. Banka netewî ya Georgia, navendên çand û hunerê, şanoyên netewî û kovar û rojnameyên hestên netewî di xwe de dihewînin hatin çapkirin. Gurcîstan di warê siyasî û aborî de bi pêş ket. Di encama vê de jî piştî şoreşa 1917an di 26ê Gulana 1918an de Georgia serxwebûna xwe îlan dike.

**Referandûma serxwebûna Georgia û hilweşandina SSCBê**

Di 7ê Gulana 1920an de piştî peymana li gel Rûsyayê, serxwebûna Georgia ji aliyê Rûsyayê ve hat nasîn. Li gel vê yekê jî Gurcîstan di 25ê Sibata 1921an de ji aliyê Rûsyayê ve hat dagirkirin. Di dema Sowyetê de serhildana yekem ji aliyê Gurciyan ve hat dayîn. Di sala 1922an de Svanetî, di 1923an de Mtiluetî, 1924an de Gurcîstan ji bo serxwebûnê serî hilda. Raperîna 6 û 10ê Adara 1956an ji aliyê Rûsan ve bi tundî hat temirandin. Piştî hilweşandina SSCBê di 31ê Adara 1991an de referandum pêk anîn û parlementoya Georgia di 9ê Nîsana 1991an de serxwebûna xwe îlan kir.



## Taybetmendiyên beşerî û erdnîgariya Gurcîstanê

Georgia li kendava Deryaya Reş e û li Başûrê Kafkasyayê ye. Navê wê Komara Georgiaê ye û paytexta wê Tiflîs e. Li Bakur Rûsya, li Başûr Azerbeycan, Ermenistan û li Rojavayêbaşûr Tirkiye û Federasyona Rûsyayê heye. Di nav sînorên Georgiaê de Komara Xweser a Acaran heye. Li hidûdê Federasyona Rûsyayê jî Komara Xweser a Abhazyayê û dîsa Osetyaya Bakur ku girêdayî Rûsyayê ye û Herêma Xweser a Osetyaya Başûr hene. Herwiha li Deryayareş sahîla Georgiaê heye.

Hejmara şêniyên Georgiaê 5 Milyon e. Rêjeya Kirîstiyan li Georgiaê ji sedî %85 e. Misilman jî ji sedî %15 ye. Hejmara şêniyên welêt ji 83,8 Gurcî ye. Yên din jî Ermen, Rûs û Azerî ne.

Zimanê fermî Gurcî ye û zimanên Abhazî û Osetî jî tên nasîn.

Georgia endama Neteweyên Yekbûyî, Konseya Ewropa, Rêxistina Cîhanê ya Bazirganî, Hemahengiya Yekîtiya Karkirinê ya Deryayareş, GUAMê ye. Georgia ji bo endamtiya Yekîtiya Ewropa muzakereyên xwe didomîne. Her çiqas bo endamtiya Ewropayê bi ser nekitibe jî ji ber bicihanîna krîteran bêyî vîzeyê geşta li Ewropayê serbest e.

Åsa Schwarz

# Li Welatê Serhedê



ROHAT ALAKOM

Romana Åsa Schwarz a bi navê Firişteyekî Mirî (En död ängel) di sala 2011an de derketiye. Nivîskar Åsa Schwarz gelek caran romanên xwe li ser agahiyên dîrokî, sîyasî û oldarî ava dike. Heta niha çend romanên wê bi Swêdî hatine weşandin û bi wergera qasî 17 zimanên cihê der çûne. Åsa Schwarz li Stockholmê dijî û pispora teknolojiya înformasyonê ye.

Di romanê de sê serpêhatî bi parelel tên vegotin û dimeşin. Lehenga her du romanan keça 19 salî Nova Barakel wek aktîvîsteke hawirdorê (jîngeh, milyo) kar dike. Endameke Rêxistina Greenpeace ye. Keçeke têkoşer e, xwîna wê hertim hevraz davêje. Gelek bûyer li serê bavê wê Peter Dagon û dîya wê Elisabeth Barakel derbas dibin. Çawa xuya dibe bûyerên ku di romanê de derbas dibin di dora Novayê û endamên malbata wê berhev û tîr dibin. Komîser Kent li pey kesekî ketiye ku paşê derdikeve holê ku ew bavê Novayê ye. Amanda jî polês e. Mêrê Amandayê Moses Hammar tixtor e û carekê xwestiye di Otêla Clarion de ku li taxa Skanstullê dimîne lehenga romanê Novayê bikuje. Tê gotin ku mêrê wê Moses jî endamê mezhebeke veşartî ye. Dê û bavên Novayê jî endamên vî mezhebî ne, mezhebê ku ji kesên Nefîlim pêk tê. Serpêhatiya van hersê kesan (Nova, Kent û Amanda) bi pergaleke edebî gelek xweş bi hev ve hatine girêdan.

Romana bi navê Firişteyekî Mirî jî romaneke Nefiliman e. Xwendevanên ku heta niha bawer dikir firişte (melek, milyaket) tenê jin in û li ezmên dijîn di romana Åsa Schwarz de rastî firişteyên mêrîn jî tên ku li rûbarê dinyayê digerin. Ev "firişteyên ketî" yan jî "bidûrxistî" dema hatine rûbarê dinyayê bi keçên mirovan re zewicîne. Paşê bi vê zewaca Lawên Xwedê û keçên mirovan kesine melez (hybrid) peyda bûne, wek dêwan hêzdar û mezin bûne. Ji van firişteyên ku ji ezmên hatine û ligel jinên şêniyê rûbarê erdê re zewicîne Nefilim hatiye gotin. Di romanê de xuya dibe ku gelek caran ev Nefilim roline ecêb dilîzin, ji nav wan gelek kujer jî derdikevin. Di romana Åsa Schwarz de hejmara wan qasî dused heb tê dayîn. Ew bi salan ketine pey rêça kal û bavên xwe ku berî hezar salan jîyane. Newî û newîçêrkên wan heta niha jî hatine. Dê û bavên lehenga romanê Novayê jî wek Nefîlim tên nasandin û hesibîn. Carekê Nova dikeve şikê wekî ew jî Nefilim e, tîpeke cihê ye.

Di romana bi navê Firişteyekî Mirî de nivîskar Åsa Schwarzê berê xwe dide Welatê Serhedê ku li ser sînorên Tirkiyê, Ermenîstan û Îranê dimîne. Em vê carê lehenga romanê Novayê li coxrafyaya Serhedê deverên wek Agirî, Îdir, Anî dibînin. Di romanê de navê Qersê jî derbas dibe, wek "Balafirgeha Qersê". Berî û piştî birîndarbûna xwe du caran diçe van deverên Serhedê. Di destpêka romanê de nexşeyek (xerîte) heye ku sînorên herêma Agiriyê, navendên wek Anî, Îdir, Yenîdogan (Argurî), Agirî, Rewan û Eçmiadzin nîşan dide.Komeke aktîvîstên Greenpeace diçin dorberê Çîyayê Agiriyê (Ararat) bona ku li wir keştiyeke wek keştiya Nûh çêbikin û bi saya vê keştiyê bala mirovan bikişînin ser hin pirsgirêkên xwezayê û mirovahiyê. Dîrok û xweza di romanê de ketine zikê hev û tabloyeke gelek xweş pêk anîne.

Demekê, Nova dixwaze here aliyê Qersê li wir bajarê kavil, kambax Aniyê bibîne û li wir hin lêkolînan bike. Dixwaze Benjamin jî ligel wê bê. Xuya dibe ku Benjamin ji ber çend sedeman bêdil e. Di dawiyê de mecbûr dimîne bi wê re hevaltiyê dike. Ani bajarê Ermeniyan ê kevn, kavil e ku nêzîkî bajarê Qersê ye. Nova li Aniyê Parêzgeheke Êgir dibîne û ew der gelek bala wê dikişîne. Anî bajarê Benjamin e. Ji devê Benjamîn ev gotin derdikevin: "Anî bajarekî şahane ye. Lê belê dema ez lê mêze dikim ez ji dil ve digîrîm bona mirovan ew çawa wêran kiriye". Di cîhekî romanê de Anî wek navend û paytextê Nefiliman tê navandin. Di romanê de evîn jî heye. Dilê Novayê dikeve xortê Ermenî Benjamin. Li Aniyê gelek bi hev şa dibin. Carekê canê Novayê gelek dixwaze Benjamin dest bavêje wê, nêzî wê bibe "Tu dest li ser qalçeya wê nîn bû. Novayê hîs kir ku bedena wê çawa bi qîrîn hesreta destê Benjamin e" Nova li Aniyê dibe hedefa êrişekê û paşê çavên xwe li Stockholmê di Nexweşxaneya Karolinskayê de vedike. Kê li wê xistiye û çi hatiye serê hevalê wê Benjamin ne dîyar e. Piştî ku tendûristiya Novayê baş dibe, vê carê Nova ligel hevalê xwe yê bi navê Arvid dîsa diçe herêma Agirî û Qersê li pey rêça Benjaminê windabûyî dikeve.

Di romanê de mijareke din ku derdikeve pêş mijara Tofanê û Keştiya Nûh e. Di romanê de tê gotin ku wê demê kesekî Nefîlim jî bi fêlbazî Keştiya Nûh sîyar dibe. Bi vî tehrî koka wan li rûbarê dinyayê nehatiye birîn. Ji ber vê yekê Nefilim li hemberî Tofaneke nû ne û ew zanin ku Tofaneke din wê koka wan jî bîne. Di romanê de carcaran mijara Keştiya Nûh jî derdikeve pêşberî xwendevanan. Di cîhekî romanê de dîyar dibe ku Jacobê ji Nisebînê wek kesê yekem tê zanîn ku li pey rêça Keştiya Nûh ketiye û perçeyekî wê bi dest xistiye. Firişteyek bona meraqa wî hinekî bide sekinandin perçeyekî Keştiya Nûh dide wî. Ew jî tîne vî perçeyî dike du perçeyan. Perçeyekî dide Dêra Eçmiadzinê û perçeyê din dide Manastira Arguriyê. Lehenga romanê Nova çûye ev herdu dever jî dîtine. Dêra Eçmiadzinê li aliyê Ermenîstanê û Manastira Arguriyê li aliyê Tirkiyê dimîne.

Dema Nova tê gundê Arguriyê dibîne ku şêniyê gund zimanekî ku wê heta niha qet nebihistiye deng dikin. Paşê fêr dibe ku ev ziman, zimanê Kurdî ye. Di vê beşê romanê de nivîskar qala mêvanheziya malbateke Kurd dike ku bûye mêvanê wan. Jina malê 12 zarokên wê hebûne ku lehenga romanê ecêbmayî hiştiye û hişê wê tevlihev kiriye. Hemû ev zarok di du odeyan de mane. Nova hatiye ser wê baweriyê ku ji ber anîna evqas pir zarokan ev jina Kurd zû pîr bûye. Paşê nivîskar wiha dibije: "Divê mirov pesinê wê bide bona ku ew heta niha jîyaye".Gundê Argurî (Yenidoğan) bi qezaya Aralixê ve girêdayî ye û dema îro di nav sînorê bajarê Îdirê de dimîne.

Di gelek cîhên romanê de navê Îdirê jî derbas dibe. Jîyana nav bajarê Îdirê, dikan û qawexaneyên wê bala lehenga romanê û nivîskar dikişîne. Hejmara şêniyê Îdirê qasî 200 hezar kes bûye. Dengên hespan, çerçî, maşînên curbecûr tevlîhev dibe, dengê tûtikan ên bêteşe guhan qul dikin. Her aliyên rêyan tijî erebe bûne, kolan û kuçe bûne cîhê parkê. Li Îdirê di nav rojê de pir caran elektrîk qût dibe. Di cîhekî de tê gotin ku qûtbûna elekrîkê li Îdirê tiştekî ecêb nayê hesibîn, nûçeyek nîne! Dema îşiqên trafîkê vênekevin, gelek caran trafîk disekine. Ne tenê trafîk, di nav vê kaosê de jîyan jî li Îdirê disekine. Tiştên ku dilê mirovan xweş dikin jî li Îdirê diqewimin. Di cîhekî de tê gotin Serekê Şaredariya Îdirê xwestiye bi germahî alîkariya van çalakdarên parastina xwezayê, endamên tevgera Greenpeace bike, maşînên wek jîp û traktoran bide wan. Xortên Îdirê yên marangoz jî alîkariyê didin vê tevgera mirovahiyê û xêrxaziyê.

Roman wek romaneke polîsane tenê tirs û xofê nareşîne. Nivîskara romanê herwiha xwestiye qeza û beleyan wek komkujî, ezîyet û zordestiyên li hemberî mirovahiyê hatine kirin û guhartinên av û hewayê jî bîne ziman yan jî bala xwendevanan bikişîne ser van mijarên mirovahiyê yên herî giring. Yek ji van mijaran jî wek mînak komkujiya Ermeniyan e ku di sala 1915an de pêk hatiye. Di romanê de tê gotin êrişkar û zordestan bi mîlyonan mirov mecbûr hîştine ku bibin şahidê mirina hezkiriyên xwe.




## Dawiya romanê

Di dawiya romanê de derdikeve holê ku dema Nova ligel hevalê xwe Benjamin çûye Aniyê û li wir birîndar bûye, çend tiştên ku heta niha wê nizanibûye li serê wê re derbas bûne. Derdikeve holê ku ew kesê ku êriş biriye ser wan Arvid bûye. Benjaminê ku wê demê ligel Novayê bûye çima alîkariya wê nekiriye? Bersîva vê pirsê jî zelal dibe. Benjamin wiha dibêje: "Ez berî te bûm hedefa êrişê. Dema min çavê xwe vekir tu tunebûyî".Wisa xuya dibe her du jî Arvid û Benjamin planên xwe hebûne. Li vir jî koma Nefilim aktîv bûye. Nova êdî baweriya xwe bi kesên li dora xwe nayîne. Piştî vê yekê mirov dikare bêje ku Nova her du hevalên xwe jî - Arvid û Benjamin - winda dike. Êdî ji wan dilsar dibe. Nova tivdarekê xwe dike û dixwaze dev ji herêma Agiriyê berde, berê xwe bide Swêdê. Lê belê Novaya têkoşer hêviya xwe winda nake. Dema bi rê dikeve ji dûr ve reşahiyek li aliyê Agiriyê xuya dike: "Ev, keştiya ku Greenpeace çêkiribû ye. Sembola li ser wê nîşan dide ku hê hêvî heye. Her tiştê ku ez dikarim ez ê bikim, wiha fikirî Nova"

# "Em ê normên kovargeriya cîhanê li Barê dirûst bikin"

DILDAR DÎROKÎ

Li Bakur bazara kovargeriyê di demên xwe yên herî teng de derbas dibe. Gelek kovarên Kurdî hatin girtin, an jî ji neçariyê weşanên xwe rawestandin. Di van heyamên dawî de komek ciwanên Kurd li Stenbolê bi kelecanî dest bi xebatên kovargeriyê dikin. Kovara Bar di sala 2016an de hejmara xwe ya yekem li Stenbolê derxist û pêşkêşî xwînerên xwe kir. Bi naveroka xwe ya balkêş, bi zimanê xwe yê resen bala edebiyathez û xwînerên Kurdî kişand. Vê heftiya borî li Stenbolê hejmara xwe ya sêyem derxistin û li Dezgeha Îsmaîl Beşîkçî guftûgoya danasîna hejmara xwe ya nû kirin. Em weke Heftenameya Basê bi Gerînendeyê Giştî yê Kovara Barê Bilal Ata Aktaş re axivîn.

Bîlal Ata Aktaş xwendekarê zaningehê ye û ji Mûşa Bakur e. Ji me re qala çîroka kovarê dike. Aktaş wiha dibêje: "Em niha hejmara sêyem derdixin. Beriya du salan me dest bi xebatê kir û hejmara xwe ya yekem di sala 2016an de derxist. Bi rastî jî derxistina hejmara yekem rastî gelek zehmetî û zordariyan hat. Îro ez li paş xwe dinêrim û dibînim ku me karekî baş kiriye û em ê her bidomînin jî. Em gelek bi coş in ku hejmara me ya niha di destên me de ye."





**"Em dixwazin xebatên înteraktîf bikin"**

Aktaş axaftina xwe wiha didomîne: "Bi piranî bineciha lijneya me xwe dispêre Mûşê. Em ji Lîseya Anadoluyê ya Mamostetiyê ya Mûşê mezûn bûne. Piştî hejmara duyemîn 3 hevalên me yên Mûşî ji me veqetiyan û em niha 4 kes in. Sê ji me Mûşî ne û niha jî Tofanê ji Şirnexê tevlî lijneya me bûye. Em xebatên xwe bi vê lijneyê didomînin. Em enerjiyeke mezin di xwe de dibînin. Bi giştî jî em dixwazin xebatên înteraktîf bikin. Lêbelê derfet kêm in, platform kêm in lê bêtir em vê kêmasiyê bi rêya medyaya civakî çareser dikin. Em li kovargeriya cîhanê dinêrin û dixwazin ku normên kovargeriya cîhanê li ser kovara xwe jî dirûst bikin da ku têkiliyên di navbera me û xwînerên me de xurttir bikin."

**"Em dixwazin li welatê xwe jî van xebat û çalakiyan bikin"**

Gerînendeyê Kovarê Aktaş di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, "Bi rastî jî em dixwazin çalakî û guftûgoyan li Kurdistanê jî li dar bixin. Lê mixabin ji ber proseya rewşa siyasî ev yek niha ne pêkan e. Em pir dixwazin li welatê xwe van xebat û çalakiyan bikin. Em ji xwînerên xwe li benda xwendin û standina kovarê ne da ku em hejmara xwe ya çarem di demeke nêz de derxin û pêşberî xwîneran bikin.




**Guftûgo li ser Barê...**

Kovarê Barê li Dezgeha Îsmaîl Beşîkçî guftûgoya hejmara sêyem û danasîna kovarê li dar xist. Di guftûgoyê de wergêr û nivîskar Dr. Ergîn Opengîn û wergêr û nivîskar Ciwanmerd Kulek, ji beşdarên panelê re qala wergera Kurdî kirin.

> Beriya du salan me dest bi xebatê kir û hejmara xwe ya yekem di sala 2016an de derxist. Bi rastî jî derxistina hejmara yekem rastî gelek zehmetî û zordariyan hat. Îro ez li paş xwe dinêrim û dibînim ku me karekî baş kiriye û em ê her bidomînin jî.



FIRAT CEWERÎ

Serpêhatiya kitêbxaneyekê

Kitêbxaneya Îskenderyayê mezintirîn kitêbxaneya dema antîkê bû. Ji gelek aliyên dinyayê kitêb diçûn Îskenderyayê û ji bo jiberzêdekirina wan nivîskaran bi destxetên spehî ew kitêb li ser papîrusan dinivîsandin û bi wî awayî her ku diçû kitêbxane mezintir dibû û ji hemû ilm û marîfetên dinyayê re mazûbantî dikir. Lê ew kitêbxaneya navdar gelek caran hatiye hilweşandin û dîsa ji nû ve hatiye avakirin. Cara pêşî di dema Cesar de, (47 salan berî Îsa) kitêbxane hate şewitandin. Bermayên kitêbxaneyê heta 500 salî man, lê 400 sal piştî Îsa, fundamentalîstên xiristiyanan ew bermayî jî ji bin ve hilweşandin.

Bi qasî ku ew kitêbxane hêlîna ilm û zanînê bû, ew çend jî di çavên dîn û desthilatdariyên cihê de navenda tirs û tehdîdê bû. Kitêbxaneya Îskenderyayê, bi maneya kitêbxaneyên welatên demokratîk her celeb kitêb, kitêbên li ser her mijarê tê de hebûn. Lê wan kitêban cih li hin dîn û desthilatdariyan teng dikir, loma wan nedixwest ew celebên kitêban belav bibin, xelk wan bixwînin û bikaribin bi xwe bifikirin û bi xwe bibin xwediyên nêrîn an felsefeyekê.

Gelek nivîskarên antîkê di derbarê kitêbxaneya Îskenderyayê de bi awayên cihê nivîsandine. Di hin çavkaniyan de tê gotin ku Julius Caesar ne bi zanebûn agir bi kitêbxaneyê xistiye û bi hezaran kovikên kitêban şewitandine. Lê di çavkaniyên nivîskî de tê gotin ku di salên 48an yên berî Îsa de di navbera Cleopatra û birayê wê de şerekî dest pê kiribû û hingî Julius Caesar tê alîkariya Cleopatrayê. Ji bo ku Julius Caesar cih li dijminê Cleopatrayê teng bike, êgir bi keştiya misiriyan dixe. Gava agir bi gemiyê dikeve, alaviyên êgir dipengizin qesir û qonaxên nêzîk û ji wir jî xwe digihîne kitêbxaneyê. Kitêbxane dikeve ber alaviyên êgir û ew xezîneya mêjiyê mirovatiyê dibe xwelî.

Kitêbxaneya Îskenderyayê di pêvajoya demê de dîsa tê avakirin û dîsa ji her çar aliyên dinyayê û ji demên cihê bi hezaran kovikên kitêban li xwe dicivîne. Li gora hin çavkaniyan ew vê carê dikeve ber xezeba ereban. Gava di sedsala 6an de ereb Misirê dagir dikin, xelîfe qasidan dişîne ser kitêbxaneyê û dibêje binere ka bê çi tiştên ku di Quranê de nînin di wê kitêbxaneyê de hene?

Qasid tavilê xeberê digihîne xelîfe, dibêje ji xwe hemû tişt di Quranê de heye û loma hebûna kitêbxaneyê bêmane ye. Loma, bi biryara xelîfe, dest bi wêrankirina kitêbxaneyê tê kirin. Tê gotin ku şeş mehan temamên Îskenderyayê bi kitêbên (papyrus) hatine germkirin û bi wê yekê dawî li dîroka mirovahiyê ya nivîskî hatiye.

Ev tiştên ku di çavkaniyên nivîskî de li ser Kitêbxaneya Îskenderyayê hatine gotin rast in an ne rast in, propogandayên dîn û desthilatdariyan ên li dijî hev in, an na, em pê nizanin. Tiştê em dizanin û rastî ye ew e ku kitêbxaneya Îskenderyayê di dema xwe de dewlemendtirîn kitêbxaneya dinyayê ya dema xwe bûye. Di pêvajoya dîrokê de hatibe şewitandin û wêrankirin jî, dîsa ji nû ve hatiye avakirin û wek berê kitêbên xwe li xwe dicivîne.

Di destpêka salên 2000î de, bi însiyatîfa wergêrê alman Klaus-Jürgen Liedtke û Enstîtuya swêdî ya li Îskenderyayê, ji bo em şaîrê swêdî Gunnar Ekelöf wergerînin heft zimanan, em temsîlkarên heft zimanan li Îskenderyayê civiyan. Em ji aliyekî ketin cîhana vî şaîrê swêdî ku bi xwe gelekî di bin tesîra felsefe û mîstîsîzma rojavayî de bû, ji aliyê din ve jî em bi xwe li Kahîre û Îskenderyayê bi dû şopa Antîkê ketin. Piştî serdana cih û deverên Fîrewnan û muzexaneyên bermayên wan, me riya xwe bi Kîtêbxaneya Îskenderyayê xist. Ez bi xwe bi hazirî bûm. Min ji bo kitêbxaneya Îskenderyayê komek kitêbên kurdî di çentê xwe de bi cih kiribûn. Ez nizanim ka di dema antîkê de, an jî di dema xelîfeyên îslamê de di Kitêbxaneya Îskenderyayê de kitêbên kurdî hebûn an na, lê min xwest, qet nebe, di dema modern de, kitêbên kurdî jî têkevin Kitêbxaneya Îskenderyayê.

Gava ez bi heft wergêrên dinyayê û bi hemêzek kitêbên kurdî ketim hundirê Kitêbxaneya Îskenderyayê, hiseke xweş li ba min peyda bû. Berpirsiyarê Kitêbxaneyê bi dostane kitêb ji destên min girtin û ji dil spasiya min kir. Ez nizanim ka di dema kevn de kitêbên kurdî di nav wan kovikên papîrus de hebûn an na, lê ez zanim niha kitêbên kurdî jî li Kitêbxaneya Îskenderyayê hene. Heke rojekê riya we bi Kitêbxaneya Îskenderyayê bikeve, ji kerema xwe re derbasî Kitêbxaneyê bibin û di hundirê wê avahiya bi heybet de rûpelên kurdî di ser hev re biqulipînin…

# Mirazê Mizurî

**LORÎN DEMÎREL**

Rayîrê Dêrsimî...

Şima re sey rayanê bînan aseno la serva ma rayîrê azadîye, rayîrê Heqî, rayîrê Xizirî û rayîrê omedya yo...

Keştîya Pêrtage barajî ser ra şona, şima ke Pêrtaga peyê xo dima caverda endî rayê şima serê koyan ra vîyarenê . Gola Kurdan de sereyê Jêle vînenî. Sereyê şima ser ra asmên, verê şima de xozanî, gelî û koyî...

Dêrsim cîhan ser ra cîhan, cîhanekê nênasî.

*Şarîstanan ra şarîstan o ...*
*Ruhê hezar serran...*
*Erd û asmeno kewe...*
*Şahidê tîja şodirî...*
*Vengê awan...*
*Dêrsim, veyva Kurdîstanî...*

Rayîrê Dêrsimî de zerrîya xo teng megîrê. Xiziro Kal her dem hazir û nazir o. Embazê şima yo.

Eke şima amey restî Dêrsim Mizur/Munzur vînenê.

Mizur, domano bêkes. Henî girewto peyê bendî. Bermeno, naleno kes nêeşnaweno.

Mizur, xorto têrn. Vîyalan gilê xo rijnayî to ser. Vaje se bî, vaje. Zerrîya ma, ruhê ma to de ro. Wisar ke bi, ti xo dana kemer û kuçeyan ser. Vaje, zerrîya xo ma rê rake. Ma domanê to yîme. Ameyîme, nika verê çemî de nîştîme ro. O ke taa naye ra hezar serrî ver bîbî, ey vaje. Bêveng mevinde. Ti yî ke embazê bêkesan bîyî, o şarî yo kê Derê Laçî de serrî dem dayî serran ser de. Vaje, bêveng mevinde. Ti ke bêveng vindenî, serrî benê bêveng. Kelamî benê bêhes û bêveng . Duayî û zewtî benê bêveng. Ti kê bêveng vindenî Heq beno bêveng.

Mizur; qalo kokim. Çi destê to ra yeno, çi destê ma ra yeno. Vaje, ti domanê mi, ez maya to, ti xorto ciwan, ez kokima kale, ti kokimo kal, ez domanê azê to ya.

Mizur, xo resna Gola Çetu, şewa îneyî bî. Ma çilayê ke xo de ardîmê fîştîme ra. Nîyaz û qurbanê xo pare kerdîme. Şarê Dêrsimî pero ame cayê xo girewt. Rayberî amey cem na ro, veng da bi Heqî. Ma seba Xizir, Duzgin û Jêle çilayî ardîme. Ewro roja Mizurî bîye. Mizur ame, talîbanê xo, xo vîr ra nêkerd. Ma girewt bine pêrranê xo. Çewres çimeyan ra verdîme ra, ameyîme serê çimeyan. Çimeyî girîyayî, awe bîye sey şitê pêzî. Bîye sipîye, axme bîye kemer û kuçan ser ra.

*Ya Xizirê serê sodirî,*
*Ti wayirê pûk û vayî,*
*Ti bîya rayberê Musayî,*
*To ra desturê cemî,*

Rojê, roja payîz a. Endî daran de velgî, xozanan de vaş nêmendî. Karê înano payîz dewijan ver de ro. Her kes serba merdanê xo nanê payîz û xêrê merdeyan dano. Her çî giran-giran beno çeqer, vileşîno gineno hard ro. Germîya payîzî gineno asmenî ser.

Rojê, roja payîzî bîye. Ez, Mizur; şiwanê axayê Pulurî, her şodir hona ke tîjê xo nêeşta koyan ser, urzena ra xo ser û bê arayî malê xo bena koyan ser. Wexto ke şîya ko, uca de turîkê xo kena ra, verê cû para teyr û tûrî dana dima kî ez wena. A roje, roja ke şima behs kenê, tayê şima rastîya a roje nêzanenê. Coka ez nika qisey kena. Rind goş bîdê, xora ez kokim a, mi de teqet nêmendo, ez sey verê cû nîya, endî solixê mi ge-ge birîno. Neyse wakila xo ra vajî, tîje henî bîbî berz ke ti vana hamnan o, germîya hamnanî daya malî ser, pêro sey runo teze vileşîne ro. Mi xo bi xo va, no mal ewro çira nîya bîyo. Mi mal uca ra girewt û berd awe ser. Dormryê awe henî rindek o, ti vana beka Heq uca serva mi nimito ke linga kesî nêşîro uca. Malî, tayê awe şimite, xo da nahet û ohet ser. Daran ra çîyê perra û ver bi cêrî giran-giran ame. Verg o; boz o, deleverga xo kî peyê ey der o. Ameyî hemverê mi.

Vergî va; Mizur, emser ez qet qarişe malê to nêbîya. Nika kî payîz o, gerê ke ti heqê mi biderê mi.

Ez hem tersa hem kî şaş menda. Mi va, ti ke mi ra mal wazena, to ra vajî no mal, malê mi nîyo. Malê axayê min o.

Vergî va, de şo! Ez verê malî de vindena. Wayîra keyeyî ra destûr bîgê. Hard û dewrêş sahid bo ke ez malê to rê çîyê nêkena..

Ez xo bi xo fikirîya, mi çare nêdî. Mi xo resna keberê axayî. Mi venga ci da, axa hala bî têber ez to ra çîyê vana. Axa ame, mi va, axa verg amo mi ra heqê xo yê payîzî wazeno. Ti se vana?

Axa mi ra hêrs bî û va; Mizur ti bîyî xêx (xînt). Ti çitur/senî qiseyê verg û yabanî rê bawer kenî?

Axa venga çekdaranê xo da, înan ra va ke "ma pîya şîme lêyê malî. Axa û çekdaran dî kê verg sozê xo de vineto, malî rê çîye nêkerdo. Axayî xo bi xo va, ma no vergo yaban o ke sozê xo de vindeto gerê ma kî heqê ey bidîme ci. Naye ser o axayî girewt yew pês da vergî. Pey ra kî malê xo girewt xo ver û ma ameyîme serê dewe. Berîvanî ameyî uca de mal dit. Satilî kî da mi dest.Wexto ke axayê ma şîyo dewe, çi bîyo nêbîyo vato. Pîr û rayberan uca de vato ke "no kerametê Mizurî yo, endî pîrê ma Mizur o. Dewijî ginayê rayîr kê berê mi de keleyê xo bibirnê. Ez a feqîr çi zanena, mi senî ke dî şar ver bi mi vazda, ez kî tersa û vazdaya. Wexto ke ez ameya çimeyan ser, satilo kê destê mi de bî, gina waro, şit rişîya kemeran ser û bî awe. O wext verê mi de yew ber abî û ez kewta zereyî.

.O şar o ke kulê Heqî yo, ey mi rê rûmet na ro, nîyaz û kurbananê xo, loqmeyanê xo berê mi ra kêmî nêkerdêne. Nika kî ez peyê bendan de ameya verdana.

Çimanê ma ra hesirî ameyî war. Ma henî teyna yîme, henî nêçar mendîme ke...
Çend rey ma wina bêçare mendîme. Ti zanena ya Mizur! Hîris û heştî de çend kênekî û cinî, çend domanî xelesîya xo zereyê to de dîye. Ê ameyî dewanê ma ma kerdî tal, pey ra amey baraj viraşt. Honde çî bî. Ma hayîdarê xo nêbîme. Roje awa to girîyaye, girîyaye ameye mezelanê kal û pîyanê ma ser, zîyar û dîyarê ma binê awe de mendî. O wext ma zana ke endî her çî destê ma ra şîyo. Darî, kemerî, mezel û zîyarî pêro binê awa to de mendî. Omid şîkîya. Pîr, rayber û talib, ma pîya arê bîme û şîme serê zîyar û dîyaran. Ma dîme kê tilsimê zîyarê ma giran-giran ma ra dûrî şonê. Mi rîyê xo hetê Mizurî ro çarna û va: " ya Mizur, ma nika se bikerîme. Ti ma caverdana kata şona?

Mizurî cewab da û va; ney, ney!. Ma ez kata şêrî. Ruhê mi, welatê mi naca yo. Nika na bendan çokê mi şiknayî. La hona ruhê mi zereyê mi ra n^vejîyo. Nika rengê awa mi sey şodiranê mi lêl ola ciwanê Dêrsimî yanî şima ke Dêrsimî canêverda û nêşorê, ruhê şima yo ke nê rayan ra, nê koyan û deştan ra fetelîya rengê mi beno sipî û beno pak.



Mizur, xo resna Gola Çetu, şewa îneyî bî. Ma çilayê ke xo de ardîmê fîştîme ra. Nîyaz û qurbanê xo pare kerdîme. Şarê Dêrsimî pero ame cayê xo girewt. Rayberî amey cem na ro, veng da bi Heqî. Ma seba Xizir, Duzgin û Jêle çilayî ardîme.



**NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ**

## Fîlî û Çere

Tirkî de yew qise esto vanê "Filler tepişir çimenler ezilir." Yanî fîlan ke xo eştî we, çere bin de beno pan. Ez ney ser o zêde fikirîyaya mi va çitur bêro çarnayene ke manaya rastî bîvîno. Peynîye de mi va "Fîlî qine erzenê we çere bin de pan beno."

Halê ma eynî nîya ro. Wexto ke fîlanê corênan yewbînan de xeyr nêkerd şarê cêrî sey çereyî binê linganê nê fîlan de pan-puç beno. Nê fîlî kam ê, çirê yewbînan de xeyr nêkenê?

Wexto ke ez hîna wendekara unîversîte bîya (1984-88) qalê cemaatan bîyêne. O wext tayê kesê ke îmkanê xoyê ekonomîk çin bîyê şîyêne keyeyanê cemaatan de mendêne. Ê cayî vay nêbîy, belkî zî belaş bîy. Kênayê ke ê cayan de mendêne seregirewte bîy. O wext zî mabênê îdareyê unîversîte û nê seregirewteyan de tayê problemî bîy. Çiqas ke derbeya 12 êlule 1980î ra dima wext seba heme sîyasîyan zaf xirabin bo zî 12 êlule seba cemaatan atmosferode rind viraştîbî, coka halê cemaatanê dînî 12 êlule ra tepîya zaf rind bî, yanî derbe îmkanê înan zêdnay, kerdî wayîrê îtîbarî. Nê dîncîyan, derbekaran ra henî rî girewtîbî ke belkî zî raya verêne kênay bi turbanan ameyêne unîversîte. Tayê cayan da bi probleman bêrê têrî zî zîyadeyê xo raştê probleman nêameyêne. Ancî o wext Wan de serra 1987î de yew wendekarê unîversîte (Mehmet Şîrîn Tekîn) seba ke remezan de roje nêgirewtbî, ame kiştene. Anqara de, unîversîteya Gazî de kesê ke rojî bîy, hucumê herinda werdî kerd, day bi wendekaran ro. Welhasil no welat de cayê cematanê dînîyan tim hîra bî labelê hende nê serranê peyênan qet nêbî. Nê serranê peyênan de cayê xo henî (winî) hîra bî, îmkanê xo henî zaf bîy ke heta corê coran şîy. Bîy hukumat, bîy dewlete, bi kilmî bîy her çî. Êdî bê xebera înan teba nêbîyêne, dare nêlewîyayêne. Kamî ke waştêne yew kar bivîno, yew kar bikero înan ra îcazet girewtêne. Hukumat zî vatena înan de bî. Hukumatî zî bê îznê înan teba nêkerdêne. Seke bi xo zî vanê "Înan çi waşt ke ma nêda." Her çî daybî, kontrolê îqtîdarî bîle kewtîbî înan dest. Henî aseno ke ancî zî mird nêbî û waşt waşt waşt, ê corênan nîyada ke peynîya na waştişî nêna, belkî ge-ge sey vatena înan hereket nêkerd işte o wext serê sifreyî de, serê werdî de yewbînî girewt.

Fîlan, cayê xo, sifreyê werdê xo, îmkanê xo û îqtîdarê xo her ke şî kerd zêde, kerd girs, her ke kerd zêde, kerd girs yewbînan de xeyr nêkerd. Îtîbarê xo bi yewbînan kerd vîndî. O wext dest bi pêrodayîş kerd. Na rey binê yewbinî kinit, kinit ke para xo zêde bikerê, îqtîdarê ê bînî birijnê, îmkananê ê bînî bigîrê xo dest. Fîlî cor de her ke lewîyayî, cêr de zî erd kewt têser û têbin ra. Şarê cerî de huzur, rehetîye nêmende.

Tayê fîlan, vîndkerdişê îqtîdarî rê qet tehamul nêkerd û par 15ê temuze de teşebusê derbe kerd û esker fîşt re ray-olaxan, kesê sîvîlî amey kiştene. Seke şima zî zanê derbe mîyanê çend seatan de kontrol bîye û kesê ke sere wedardayî heme pêgirewtî eştî hepisxaneyan.

Heta tîya her çî normal aseno. Vera hukmatê meşruyî derbeya eskerî meşru nîya û heqê hukumatî û hemwelatîyan esto ke vera na derbe vinderê. Xora henî zî bî. Her kes (heme partîyê sîyasî, heme organîzasyonê sîvîlî yê komelî, şar) verê derbe de bîy. Çike kesî heta nika derbeyan ra xeyr nêdîyo. Çike derbeyan nêmdomokrasîyê Tirkîya peyser berdo, Tirkîya dinyaya averşîyayeye ra visna ra, cêra kerda. Coka kes leyê derbe de nêvinderto, coka derbe sernêkewte. Rind zî bîyo, rind ke derbe sernêkewte. Labelê teşebusê na derbe ra dima çîyanê normalan ra zaf çîyê anormalî ameyî ca. Mavajî, kesê ke eleqayê xo bi derbe çin o la muhalîfê hukmatî yê, kesê ke sey mensubanê hukmatî nefikirîyenê û fikrê xoyê sîyasî zowbîn o labelê demokrat ê, hurmeta xo bi demokrasî esta, verê zorî der ê, seba heqê merdiman mucadele kenê û seba her kesî edalet wazenê, heme binê tomete de mendî, heme sey sucdaran ameyî lanse kerdene. Tayêne karê xo kerd vîndî, tayêne xoserîya xo. Tayêne tersanê xo ver vengê xo birna, ancîyayî zereyê keyeyanê xo. Tayê remay şîy welatan de rêça xo kerde vîndî. Domanê tayêne orte de vêşan-têşan mendî. Ez nêzana se vaja! Fîlan cor de winî qine eşte ke çere cer de pan-puç bî.

Şarê nê welatî, kam beno wa bibo pêro zî verê cû muhtacê yew heyatê însanî yê. Dima zî muhtacê demokrasî yê. Şarê nê welatî êdî zor ra, tersê polîsî û eskerî ra, tersê hepisî ra, feqirîye ra, xo înkar ra, bêvengîye ra, teror ra bêzar bîyo. Ez hêvîdar a ke bêzar bîyo, qet nêbo ma bêzar bîy îme. Şarê nê welatî zî layiqê heyatêde însanî yo. Werrekna (kaşka) şarê nê welatî zî tena kar û gureyê xo ser o, weşîya xo ser o, kay-kelevît û keyfê xo ser o bifikrîyayenê. Seke şaîr vano: "… ciwîyayîş sey heskerdene zerrî ra bo, eke beno yew gerre o zî merdene ra bo."

nadirega@hotmail.com

# NewePel weşanê xo vindarneno


rojnameyo kulturi
NEWEPEL
Çele (Ocak) 2016 Hûmare: 83 Vaya / Fiyat: 1 TL
Serrgêrra 20. ya Grûba Xebate ya Vateyî Pîroz Bîye
"MA ESTÊ, ZIWANÊ MA ESTO"
Sergêrra 20. ya ronîyayîşê Grûba Xebate ya Vateyî, Dîyarbekir de, Merkezê Kulturî yê Cigerxwînî de, 02 Çele 2016 de sey şewe piroz bî. Qasê 400 kesî beşdarê na şewe bîyî.
Ronayoxanê Grûba Xebate ya Vateyî ra Mehemed Malmîsanijî derheqê ronayîşê grûbe de wina va:
"Ma seba ziwanê xo ameyî têhet û dest bi xebata na grûbe kerde. Grûba Xebate ya Vateyî wina virazîyaye. Yanî na grûbe, yew hereketê vatişê 'ney' a. Zulm û zuran û înkarî rê va 'ney!' Grûbe va 'Ma estê, ziwanê ma esto! Çîyo ke ma vajî esto, vateyê ma estê!'" 3
Xebere - Foto: Mutlu CAN
M. Malmîsanij
PAR WEŞANAYÎŞÊ KITABAN KEMÎYA
Emser, nîsbet bi parî, weşanayîşê kitabanê kirdkî kemîya. Qaso ke ma tesbît kerd, 2015 de 21 kitabê kirdkî (zazakî) weşanîyayî. Oxro ke serra 2014 de 46 kitabê kirdkî weşanîyaybî.
Par 21 kitabê ke weşanîyayê ra 6 hebî Weşanxaneyê Roşna ra, 3 hebî Weşanxaneyê Vateyî ra, 3 hebî Weşanxaneyê Famî ra, 2

Goreyê yew xebera Rûdaw Tvyî Rojnameyê NewePelî do hûmara xo ya 100. ra dima nêro weşanayenê. Qerar, hetê edîtor û redaktorê rojnameyî Roşan Lezgînî ra ame dîyarkerdiş. Lezgînî, beyanatê xo yo ke dayo Rûdaw tvyî de wina va: "Planê mi oyo ke ez hûmara 100. veja û dima weşanê rojnameyî bivindarna."

Goreyê xebera televîzyonî, NewePel problemanê madîyan ver û semedo ke heme karê ey milê Roşan Lezgînî de mendo weşanê xo rê nuqte roneno. Lezgînî zî qiseykerdişê xo wina domnayo: "Mi zor da îmkananê xo yê ferdkîyan û bi no qayde rojname ard nê rojan. Şar wexto ke wayîrîye nêkero, o nêkero o bîn nêkero o bîn nêkero qey eno ziwan, ziwanê babîyê mi tenya yo? Ziwanê kalikanê mi tenya yo? Ez tenî mesul a?"

Seke yeno zanayîş NewePel çarçewaya fealîyetanê ZIWAN-KOMî ke serra 2011 de Dîyarbekir de ronîyaybî de ameyêne weşanayene. Hûmara yewine ya Newepelî 15 adare 2011 de vejîyaybî û rojanê nêzdîyan de hûmara 100. ya ey ameye weşanayîş. NewePel rojnameyo tewr verên o ke safî bi kirmanckî vejîya. Nê rojnameyî, wendoxî û nuştoxîya kirmanckî de sînerjî vet meydan û averşîyayîşê pêserîya edebî û folklorîkî ya kirmanckî rê xizmeto pîl kerd. Aye ra wendoxê ey hêvî kenê ke înanê ke vejîyayîşê nê rojnameyî de ca girewto, çendê înan bêrê têhet û weşanê NewePelî bidomnê.

NewePel problemanê madîyan ver û semedo ke heme karê ey milê Roşan Lezgînî de mendo weşanê xo rê nuqte roneno. Qerar, hetê edîtor û redaktorê rojnameyê NewePelî Roşan Lezgînî ra ame dîyarkerdiş.

# Mesajê Referandumê Xoserîye-I

Wendoxê erjîyayeyî kurdî serranê peyênan de semedê azadî û xelasîyayîşî mucadele kenî. Çar parçeyê Kurdîstanî de goreyê şertanê ê welatî sîyaset domnenê. No semed ra ma zaf qurbanî day. Ê deshilatdaranê ke nika welatê ma kerdo parçê kêrdê nêwazenê kurdî bibê wayîrê erdê xo. Seba ke yew statuyê înan nêbo çi destê înan ra bero çi texsîr nêkênê. Goya ewnîyayîşê înan zitê yewbînan ê la la vera kurdan yenê têhet qeraran gênî, kurdan kişenî. Qetlîaman ra vîyarnenî, kîmyasalan erzenî ci. Dewan, bajaran xirabe kenî. No zulm û zordarîya înan çi rey nêqedîno. Hetanî ma kurdî nêbî wayîrê yew statu qetliam, kiştiş, malxirabî semedê ma ya rewa vînênî. Ma zanî ke no di-hîrê serrî yo yew şero giran Kurdîstan de beno. Bi nameyê Îslamî çeteyê terorîstî yê Daîşî hêrîşê Kurdîstani kerd, bi hezaran însanê ma qetil kerdî. Bi hezaran cinî, kênekê ma esîr girewtî û sey koleyan bikar ardî. Bazaran de pê peran rotî Ereban. Hêzê kurdan, peşmergeyê qehremanî bi alikarîya hêzê yewîya miletî pîya Daîş welat ra fetilnayî. Nika semedê kurdan yew firset ameyo beynate. Hukmatê Herêmê Başûrê Kurdistanî qerar girewt ke 25.09. 2017 de semedê xoserîya Kurdîstanî referandumê bero kerdene. Semedê naye ma dest ra çi bero ma gerê texsîr nêkerî. Belê eke rayê ma uca de bibê ma ray danê ci. Heyf ke rayê ma çin ê la sewbîna zaf kar keweno milê ma ser. Ma gerê sêy çimanê xo biewnî başûrê Kurdîstanî ra. Kar û xebat bikere. Bawer bikerên eke uca xelasîye bero tesîskerdiş, tesîrê xo dano heme cayê welatî ser o. Ma gerê bêveng nêvindîme, lobi virazîme, dinya pêbihesnîme. 50 milyon însanî nebeno ke wayîrê çiyêk nêbê. Bawer bikên ke 50 milyon kerg biyêne nika resaybî heq u huqûqê xo... Aye ra ma gerê destê xo bidê yewbînî, ma semedê statuyê kurdan xover bidîme ke ma zey miletanê bînan bibê wayîrê heq u huqûqî, welatê ma azad bo ma yetim nêmanê.

Ez mat manena tayê kurdî nêwazenê dewleta kurdan bero viraştiş. Vanê wext niyo. Inî teyna semedê referenduma wazenê astengîye vêjî beynate. No çiyo ke yeno hesabê dagirkeran o. Inî xizmetê kurd u Kurdîstanî niyo. Ê dewletî ke ma parçe kerdî, ê zî eynî çi vanê. Vanê wa kurdî mebe dewlete. Ez vana dewlete nêbo merg o, qetlîam, kiştiş, malxirabîye ma ser o kêmî nêbenê. Ma xo mexapîn. Dewletbîyayîş mafê ma wo ma gerê xo ver bidî. Xoverdayîş cuyayîş o.. Ez pê nê hîsan roja 25. 09. 2017î, referandumê Başûrê Kurdîstanî pîroz kena. Serkewtiş wazena. Bi selam û hurmete

**Rêzan Rezdar**
(Hunermend)


Rêzan Rezdar

# Romanê Kobanî Romanêko Serkewte yo?

WELAT RAMÎNAZAD

Epey wextî ra nata wendoxê kurmanckî weşanayîşê nê romanî pawitênî. Ez zî nê kesan ra yew a. Naye ra senî ke romana Kobanî ame weşanayîş mîyanê wendoxanê kurmanckî de vengêko berz da û Kobanî ra bi îdîya "romanêko serkewte" ame qalkerdiş û wîna ame nîşandayîş. Romano serkewte çi yo ? Cewabêkê sitatîk û objektîf yê nê persî çin o, cewab goreyê wendoxan û rexnekeran û dewiran bedilîyeno. Biraştî zî Kobanî romanêko serkewte yo? Mi zî goreyê perspektîfê nê persî no roman wend. Ez wazena derheqê nê persî de fikranê xo yê ke goreyê teorîyanê edebîyat nêamey teorîzekerdiş şima reyde pare bika.

Romanê Kobanî yê Jan Dostî di beşanê bingeyinan ra yeno pê. Beşo yewîn de Hecî Muslimê Hemziravê Macir û malbata ey ser o kemîlîyeno. Beşo dîyîn de zî raywanîya xeyalkerdiş û bînhîşê nuştoxî ser o kemîlîyeno. Her di beşî zî yewbînan ra xoser î la têreyde kemîlîyenî.

Roman de bîyayîşî goreyê zemanê xêza dûz nêamey munitiş, goreyê zemanê têmîyankewte yenî mûnitiş, zemano vîyarte beno zemano nikayin, zemano nikayîn beno zemano vîyarte, zemano ameyen de beno zemano vîyarte. Ez wazen goreyê zemano xêza dûzê de bîyayîşan xulasa bika.

Gilê romanê yewinê de Kurdîstanî de qirkerdiş û trajedîya bi hezaran keyeyî ra qirkediş û trajedîya malbata Hecî Muslimê Hemziravê Muhacirî estê. Nuştoxî, kontekstêkê tarixî ser ra qirkerdiş û trajedîya keyeyê Hecî Muslimê Hemziravê Muhacirî awan kerda. Se serrî verî senî ke keyeyê pîyê Hecî Muslimî qir bîya, se serrî pey zî keyeyê ey yeno qirkerdiş. Qederê pîyê xo yê lajî de tekerûr keno...

Romanê roja yenê de keyeyê Hecî Muslimê Hemziravê Muhacirî de seba nîmajê îneyî bi destmajgirewtişê Hecî Muslimî dest pêkeno. Wendox hidik-hidik dest bi şinasnayîşê Hecî Muslimî û keyeyê ey keno. Hecî Muslim keşêko dîndar o, yew dikanê ey esto debarê kulfetê xo zî pê nê dikanî keno. Hecî Muslim semedo ke gedeyê ey nêbîyê çar rey zewecîyayo la tenya cinîya ey a peyêne Xanê ra di kêne û panc zî lajî hewt gedeyê ey benî. Nameyê înan Mihemed Salih, Mustafa, Metîn, Xedîca, Lewend, Baran û Rewşen ê. Lajo tewr pîl Mihemed Salih, Eyşê reyde zewacnayeyo, yew kêna yew zî lajê ey estê...

Wexto ke 1915 û 1916 de mîyanê dewlata Osmanîyan û Rûsya de şer vejino, pîyê Hecî Muslimî, Hemzirav û maya xo Qersê ra merdimanê xo û her çîyê xo caverdanî û remenê yenî Xarpêt. Ê ke Xarpêtî de ca benî hama Hemzirav şîyês serreyî yo.Wexto ke Serêhewanayîşê Şêx Sêîdî ke dest pêkeno û hevalê ey erzenê Xarpêtî ser, Hemzirav zî tewlê hevalanê Şêx Sêîdî beno. Serêhewanayîşê Şêx Sêîdî ke binkeweno, seba Hemziravê zî cezaya îdamî yeno waştiş. Naye ra Hemziravê reyna remeno, yeno Binxet. Bînxet de nameyê Macir nîyeno pa. Hînî ne o ne zî lajê ey Hecî Muslimî nêşênê nameyê Muhacirî xo ra bixelisîyê. Semedo ke Hemzirav wayîrê eşire nîyo Bînxet de ci rê gelek muameleyê negatîfî benê û o sey o bîn yeno vînayene. Bi nameyê xo yo newe Hemziravê Macir Bînxetê de zewecîno, lajêkê ey beno, nameyê ey zî Muslim nano pa. Hemziravê Macir rojêk ver bi Xarpêtî dest bi raywanîyêk keno. Nuştox dîyayîşanê Hemziravê Macirî wîna mojneno;

" Ko, o ko bî, dare a dare bîye la bajar bajaro verên nêbî. Hemzirav wexto ke dî raywanê otobusî pêro bi tirkî qisey kenî zaf ecêb mend," (r.35) Wextê ke Hemziravê Macirî raywanîyê ver bi Xarpêtî keno serrê 1940in ê. Nuştox tîya de xetayêka anokranîk keno çimkî heta peynîya serranê 1990î zî Bakur de ziwanê mîyanê komelî kurdkî bî.

Hemziravo Macir wexto ke Bakurî ra agêreno, beno bêveng, ne selam dano kesî ne zî kesî ra selam gêno. Agêrayîşê xo dima ra wexto derg derbaz nêbeno mireno. O ke mireno Muslim çar serreyî yo...

Metîn heşt serrî yo ke şîyo ko. Wexto ke Kobanî de şer dest pêkeno, Metîn agêreyeno yeno Kobanî. Gama ke Hecî Muslimî û cinîya xo Xanê lajê xo heşt serran dima vînenî çimanê ma ver sehneyêko zerrîziz awan beno. Rewşen pancês serreyîya xo de tewlê YPG bena. A û birayê xo Metîn pîya vera DAÎŞî şer kenî. Rewşene wexto ke ha mîyanê girêgirê şerî de ya ma vînenî ke ha waştîyê xo rê mektuban nusena. Nuştox, tewlîbîyayîşê ciwananê qijan/senikan zaf rexne keno...

Qefleyêkê pêşmergeyan Başûrî ra derbazê Kobanî benî. Lewendê zî nê pêşmergeyan ra yew o.Vera DAÎŞê de perodayîşêk de şehîd keweno. Metîn netîceyê teqîyayîşê bombayêka ganîye ya DAÎŞî de, Rewşene zî perodayîşêk de şehîd kewenî.

Wexto ke DAÎŞı verê xo tadanê Kobanî ser, şarê Kobanî zî verê xo tadano hetê berê sînorî. Hecî Muslimî û veyva xo Eyşe û di tornê xo zî verê xo tadanî hetê berê sînorî. Dewlata Tirk berê sînorî padayo çi kes nêeşkeno derbazê Pirsûs bibo. Tradejîye tradejîyêka bîne mîyan de z tqewimîyena. Bi hewildayîşê rayamîyanneteweyî Tirkîya berê sînorî akena. Hecî Muslim û veyv û tornê ey kampa penaberan de konêkê de ca benî. Pirsûs de Hecî Muslimî her roj şono verê telan sînor û yeno. Rojêk Hecî Muslim reyna şîyo verê sînorî, Eyşe kona xo de hetê xebatkarê dezgeyê hetkarîya mîyanneteweyî ra zanclanê xo ya yena tacîzkerdiş. Dima tacîzbîyayîşê aye ma psîlojîyê Eyşe de çi texrîbat nêvînenê.. Eyşe ser o trawmayêk nevirazîyaya. Eyşê werzena payan ser, seke qet çîyêk nêbîyo cuya xo ramena la tenya tersena ke reyna bera tacîzkerdiş. Qey çimê nuştoxî de yew cinîye bêra tacîzkerdiş psîkolojîyê aye ser o zerar nêvejîno orte yan zî mavajî a cinîye trawma nevîyarnena? Rojêk Eyşê barê xo ronena. Eyşe rê yew kêneke bena. Nameyê aye zî Hêvî nana pa. A roje zî Kobanî rizgar beno.

Hecî Muslim seke aqilê xo pernayo mîyanê biaqilî û delûyî (xintî) de yeno şono. Her kes vano Hacî bîyo delû. Hemê û maya xo zî Kobanî de manenî. Mayê bombevarnayîşêk de binê banî de manena û mirena. Heme zî heta peynîya romanî zî ma nêzanî ganî yo yan nîyo.

**Aqubetê Hemê hîşê wendoxî de meçhûl maneno.**


Eyşê agêrena yena Kobanî la ka Kobanî cayê xo de mendo ke!.... Eyşe keye înan vînena. Ancax banê xo de şîyênî mitbaxe de ca bide xo. Heto bîn ra zî Eyşe, hêvî kena ke mêrdeyê aye tim rojêk bivejkîyo û bero. Serê şewdirê şewêk de keyeyê xo, Hecî Muslim û veyv û tornê ey yenê qetilkerdiş.

Ma beşê dîyîn yê romanî de xeyalkerdiş û hîşê xo de vîndibîyayîşê nuştoxî vînenê. Roman de şeştî û yew binbeşî estî. Vîstî û di binbeşî derheqê nê beşê romanî de yî. Kobanî seba nuştoxî yeno çi mana ? Şerê Kobanî nuştoxî ser o çi têsir kerdo? No beşê romanî nê di persanê bingeyînan ser o awan bîyo. Nuştoxî waşto ke binawno ke seba Kobanî çiqas dejayo û qehirîyayo, kewto çi psîkolojî. Beşo yewin de nuştox karakteranê xo teberê atmosfere înan ra dano şinasnayîş û înan reyde bi o hewa qisey keno. Zaf bi hawayo sînorkerde kewto zereyê dînyaya karakteran la nê beşî de teknîkê monologî û hîşê herîkbar (bilinçakışı) xebitnayo.

Serê sibayî/şewdirî nuştoxî rê mesajêk yeno şawitiş, biraye nuştoxî yo ke Îstanbul de nêweşxanê de yo xebara mergê birayê ey o. Nuştox, Almanya ra yeno Îstanbul. Îstanbul de raywanîya xeyalkerdiş û vîndibîyayîşê nuştoxî dest pêkena.

Nê beşê romanî de hîna zaf cuya nuştoxî ke o hema nêşîyo Almanya yanî serra 2000î ra verî ra qal beno. Ge-ge zî hewildayîşêko seba Kobanî dayî qalê înan keno. Nuştox mîyanê hîşê xo de vîndî beno, şono domanîya xo, xortîya xo, rojanê xo yê unîversîte û leşkerîya xo, têkilîyanê xo yê mîyanê keyeyî û teberî, însanê ke nê dewiran de cuya ey ca girewtê qalê nê însanan û xatirayanê xo keno.

Bi xeyalkerdişê mîyanê Kobanîyo xirabe de tikûtenya dest bi raywanîye keno. Hîşê xo de vîndibîyayîşê yew mekanî rastêrast çin o la xeyalkerdişê mekan bajarê Kobanî yo. Kûçeyanê û caddeyan, taxan, mizgeftan û goristanan û keyeyê înan mîyan de raywanîye keno. Goristanê de raştê yew merdimê xo yeno, wendox heta peynîya romanî cêser nêvejeno ke nuştox raştîye ney ha xeyalan mîyan de yo, peynîya romanî de xeyalî û raştî ceser vejîne.




## Mi gorê romanê Kobanî romanêko serkewte nîyo. Çira romanêko serkewte nîyo?


Kobanî herçiqas merkezê romanî de biaso zî Kobanî bi cîyayî û girîngîya xo merkezê romanî de nîyo. Merkezê romanî de Hecî Muslim, keyeyê ey û xeyalkerdiş û vîndîbîyayîşê hîşê nuştoxî estê. Şerê Kobanî nê keyeyî û nuştoxî ser o senî têsîr kerdo, o munîyayo. Romanê Kobanî nê di bîyayîşanê bingeyînan ser ra yeno vatenê. Merkezê romanî de Kobanî ca nêgêno, merdim şêno yewna bajaro ke tede şer derbaz bîyo ra zî roman bimuno. Ti nameyê romanî û zereyê romanî de cayê ke çekuya Kobanî tede vîyarenê bi nameyê yewna bajaro ke DAÎŞî eşto ser bibedilne zî roman de zaf çî nêbedilîno, roman hema-hema êynî sey şeklê xo yo verên bimano. Eke merkezê romanî bi cîyayîya bajarê Kobanî biameyêne awankerdiş o wext roman bi tu şekil nêamêne bedilnayîş, Çimkî heme bajaranê dinya mîyan de cîyayîya taybetî yê Kobanî esta. Eke roman de na cîyayîya Kobanî ser o biameyêne awankerdiş eserêkê orîjîn ma dest de bîyenê. Xulasa sedemo bingeyîn yê serkewtenebîyayîşê romanê Kobanî no xusus o. Aye ra romanê Kobanî serkewtê û orîjîn nêbîyo.

Kobanî çar parçeyanê Kurdistanî û kesayetîya kurdan ser o tesîrêko senîn kerdo, çi bedilînayo? Kitabî de cewabê sey persanê winasîyan çin ê. Ez wazena nînûmeya qije bida. Rojhelatî ra reyê ke embazêkê mi va " Rojhelat de kurdê şîa (şîî) ke gedeyê xo banderê kurdkî nêkerdênî, kurdkî ra şermayayênî, Kobanî ra pey dest kerdo gedeyê xo banderê kurdkî kenî". Wexto ke xebara rizgarîya Kobanî kewtê mîyanê Kurdistanî, Kurdistan de roşan bî, kurdî bextewarî ra firrayênî la nuştoxî bextewarîya rizgarîya Kobanî nêneqişnaya. Naye ra teber zî Kobanî ser o paragraf yan zî cumleyêk çîn a ke ruhê wendoxî de erdlerzêk bivirazo yan zî yew aforîzma peyda bikero.

Eke merdim romanî tede canêgirewtişê cîyayîya bajarê Kobanî ra teber zî bisenco romanê Kobanî ancîya zî serkewte nîyo. Jan Dostî waşto ke keyeyê Hecî Muslimî ser ra trajedîya kurdan a seserrine bîyaro çiman ver, romanê Kobanî hetêk ra fikrêko baş o la nuştox nêeşkayo nê fikrî baş, bi ziwanêkê dewlemend û xorîn bineqişno. Nêeşkayo atmosfer û xorînîya fikrê xo pirr bikero. Ziwanê nuştoxî herçiqas herikîyaye (akıcı) bibo zî yew wextî ra pey ez ti ra eciz bîya. Bitaybetî zî nuştox, hetê ziwanî ra xo zaf dubare keno. Nuştox, beşo yewin yê romanî de nêdekeweno binhîşê karakteranê xo, eke dekewo zî zaf sînorkerde û reqanê (yüzeysel) dekeweno bînhîşê karakteranê xo, bînhîşê karakteranê xo nêdano qisey kerdene, zafanê teberê karakteranê xo ra qisey keno.. Zafaneyê romanî de teswîrkerdişê xorînî çin ê, vatişêko duz esto. Beşo dîyin de xeyalkerdiş û hîşê xo de vîndîbîyayîşê nuştoxî dekeweno bînhîşê xo la no beş de nuştox bêsansûr û xorîn nîyo, wendox xorînîya bînhîşê nuştoxî ra çîyêk nêvîneno. Ti vanî qey tim ha pesnanê xo dano û gûfo dano xo ro...

Kobanî ser o yew kitab ney ganî bi hezaran kitabî bêrê nuştiş. Semedo ke ma kurdî xo bindestî rabixelisnê û azad bibê Kobanî awankerdişê diskuran xezîneyêka bêhempa ya. Ganî na xezîna cayê xo de nêro xovîrrakerdiş!.. Lazim o ma kurdî bieşkê na xezînaya bêhempa bikar bîyarî. Bi hêvîya bi hezaran kitabî ke do Kobanî ser o binusîye.

> Romanê Kobanî yê Jan Dostî di beşanê bingeyinan ra yeno pê. Beşo yewîn de Hecî Muslimê Hemziravê Macir û malbata ey ser o kemîlîyeno. Beşo dîyîn de zî raywanîya xeyalkerdiş û bînhîşê nuştoxî ser o kemîlîyeno. Her dî beşî zî yewbînan ra xoser î la têreyde kemîlîyenî.




## Kobanî & Jan Dost

Romanê çarin yê Jan Dostî Kobanî aşma gulane de Amed de hetê weşanxanêya Dara ra ame weşanayîş. Weşanxanêya Dara bi xo zî weşanxaneyêko newe yo û Kobanî zî kitabo weşanxanê yo tewr verên o.

Jan Dost, 1965 de Kobanî de maya xo ra bîyo, verî bi erebkî dest bi nuştiş kerdo la şîyês serrî yo xo ke agêrayo kurdkîya kurmanckî ser. Unîversîteya Helebî de dest bi beşê Bîyolojî kerdo la temam nêkerdo û caverdayo. Jan Dost hem keskêo zafhetin o hem zî dizîwan o: nuştox, şaîr, cigêrayox û açarnayox o. Hem bi kurmanckî hem zî erebkî nûseno. Heta nika Kobanî zî pa panc romanê ey bi kurmanckî , hîrê hebe zî bi erebkî ameyê weşanayîş. Gelek cigêrayîşê ey estî. Bitaybetî Ehmedê Xanî ser o sey pispor yeno qebulkerdiş. Ey çend kitabî erebkî ra çarnayî kurmanckî ser. Tayê kitabê ey zî çarnîyayê soranskî ser. Diwanê şîîran û destana ey zî estî. Serra 2000î ra nat Almanya da ciwîyeno.

# Zanyaran ra çend meselayî

**Hetê Heran ra Îdare Bîyayene**

Şarê Atîna, îdarekeranê xo ra zaf gerrekerdox bî la nêzanayêne ke înan îdareyî ra senî hawa dûrî bifîyê. Netîceyê munaqeşeyan de yew fikro muşexes (somut) nêvejîyêne orte. Rojêk Antîsthenes vejîya kursî ser û va:

"Atînayijî! Şima rê yew pêşnîyaza mi esta: Şima derhal yew qerarname bivejîn û bi nê qerarnameyî îlan bikîn ke heme herî estor ê. Û naye ra pey zî heran ra mevajîn her, tim vajîn estor/e"

Yewî perseno vano:

"Ma çi faydeyê ney ma rê bibo ke? Antîsthenesî wina cewab da ey:

"Senî çi faydeyê ney ma rê bibo? Oyo ke ma îdarekerdoxanê neweyan ser o pênêkenê, hetanî ke ma yew çare dî qet nêbo ma şermê hetê heran ra îdarebîyayîşî ra raxelisîyenê"

**Merg çi yo?**

Gama ke wendekaranê ey ra yewî Konfuçyusî ra persa va: "Merg çi yo?", cewabê Konfuçyusî wina bîyo: "Ti derheqê cuye (heyatî) de çi zanî ke ez to rê behsê mergî bika?"

**Wijdan**

Hukumdarêkê zalim û xedarî, yew fîlozofî ra persa va "Wijdan çîyî rê beno?"

Filozôfî cewabê ey wina da: "Çîyo ke ti nêzanî û to rê lazim nîyo, ey rê beno"

**Egîtîye**

Yewî Agesîlausî ke dewranê kehenan de qralîya Sparta kerdo ra pers kerdo vato: " Rastîye mezîyet a yan egîtîye (qehramanîye)?" Agesîlausî cewab dayo:

"Eke pêro merdimî rast bibîyêne, çi luzumê egîtîye estbî?"

**Edalet yan Cesaret?**

Îskendero pîl, mamostayê xo Arîstotelesî ra perseno vano "Seba lîderî edalet yan cesaret hîna muhîm o?"

Arîstoteles vano: Wexto ke edalet estbo cesaret îcab nêkeno.



Salman Rushdie

# Firarê dîn, mehkûmê edebiyatê



CIWANMERD KULEK

Ez dibêm sala 2005an bû. Li zanîngeheke li Enqerayê xwendekar bûm. Diviya min lêkolînek li ser romanekê bikira û meqaleyek di heqê wê de binivîsanda. Mamosteyê me yê dersa Romanê lîsteyek amade kiribû û ji bo ku em ji nav wan hilbijêrin navê bîst-sî kitêban tomar kiribû. Pirrên wan berhemên klasîk û nas ên edebiyata îngilîzî bûn. Yekê ji nav wan yekser bala min kişand: *Midnight's Children (Zarokên Nîvê Şevê)* / Salman Rushdie. Navê nivîskar û berhema wî berê li ciyekî, di xeberdanekê de, li ber guhê min ketibû, lê ne dihat bîra min li kû, çima, bi çi awayî derbas bûbû di nav xeberdanê de. Dîtina vî navî weke keşfeke teze gazî min dikir û min ji mamoste re got ku ez dixwazim li ser vê romanê bixebitim. Bersiva mamoste a yekser ew bû ku ew romaneke dijwar, giran û postkoloniyal bû, wî ew hema bi îlhameke ji nişka ve û çi bigire bê hemdî xistibû lîsteyê, ji ber wê yekê ji min re pêşniyaz kir ku yeke dî ji nav wan hilbijêrim. Gotinên mamoste hîn bêhtir ez sor kirim û min got wiha baştir e. Li hesabê min dihat ku berhemeke cuda bixwînim, nivîskarekî xerîb û nebihîstî nas bikim.

Ez dibêm qey heta wê rojê min nivîskarekî navê wî rojhilatî (Selman Ruşdî) lê zimanê edebiyata wî rojavayî (îngilîzî) nexwendibû. Çendak bû min biryar dabû bi kurdî binivîsim û bi qandî afirandin û edebiyata nivîskar meseleya wî ya bi nasnameyan re jî ji min re bûbû meraq. Min li kitêbfiroşê zanîngehê wê kitêba stûr peyda kir û berê xwe da qatê siséyan ê kitêbxaneya zanîngehê: Beşê ku edebiyat gişt li wir bû. Min kitêb dixwend û li qertên îndeksê ên ku mamoste ji bo nîşe-wergirtinê salixên wan ji me re dabûn qiyametek not dinivîsandin bo paşê li ser wan hûr bibim û di meqaleya xwe de bi kar bînim. Ev yekem û belkî dawîtirîn car bû di jiyana min de ku min ewqasî berfireh li ser nivîskarekî û kitêbekê lêkolîn dikir û dinivîsand: Çi bigire çi meqaleya di heqê kitêbê de li ser înternetê hebû û gotar û hevpeyvînên Rushdie ên li kitêbxaneya zanîngehê peyda dibûn, min barxaneyeke mezin ji wan ava kir û bi şev û bi roj dixwend. Min çi nivîsand, çawa nivîsand niha naye bîra min, lê bawer nakim wê demê xwedî wê behremendiyê bûm ku karibim bi agahî û zanyariyên ewqas zêde re serî derxim û ji wan meqaleyeke hevgirtî, saxlem û kûr dirist bikim.

***Zarokên Nîvê Şevê***

Di bîra min de ye dema min peyvên wek 'surahi', "sahib" di vê kitaba bi îngilîzî de didît çawa ecêbmayî dimam û dema min di hevpeyvînên wî de dixwend ku vî nivîskarê hindistanî li hember bertekên ku çima bi zimanê xwe yê dayikê nanivîse iddîa dikir ku zimanê resen jî dikare tevli zimanê ku pê dinivîse bibe û wî dewlemend bike, ez jî li ser rewş û helwesta xwe ya ziman diketim nav hizr û mitaleyan. Li Hindistanê, ku gelek ol û qewm û zimanên herêmî lê hebûn, du meh û çar roj berî ku ev welat ji bin dagirkeriya îngilîzan derkeve, li bajarê Bombayê ji dayik bûbû û dû re li Brîtanyayê jiyabû. Hizr û qisetên wî yên derbarê welatê wî, zarotiya wî, rabihuriya wî, qewm û nerîtên wan, di vê serdema nû a tevliheviya welat, netew û pênaseyan de çerxeke heqîqî dîtibû û li dor wê dizîvirîn: *Imaginary Homelands (Welatên Xeyalî)*. Cara pêşî di qadeke ji bilî siyasetê de rastî nîqaşkirin û sêwirandina van çemkên nasnavî dihatim û herçiqas min ji hişkiya xwe nedixwest hin tiştan qebûl bikim jî, divê mikur bêm ku kêfa min gelekî ji vî şêweyê hizirîn û derbirînê re hat.

*Zarokên Nîvê Şevê* di tekstên ku min dixwendin de ji alegoriya netewî bigire heta bi rasteqîniya efsûnî bi gelek rengan hatibû şîrovekirin. Salman Rushdie dema li Brîtanyayê di karê nivîsandina tekstên reklamê dikir, rojê sê-çar saetan li ser vê romanê xebitîbû û ew nivîsandibû. Evê romana duyem a Rushdie ji nişka ve gelekî populer bûbû û navê wî belav kiribû. Romanê çîroka hezar zarokên şeva ku serxwebûna Hindistanê hat îlankirin ji dayik bûn dikir behane û rismekî ji dîroka nû a vî welatî a piştî serdema kolonyal peşkeş dikir. Rojekê, heyama ku ez dixebitîm ku meqaleya xwe binivîsim, xwendekarekî di beşa me de lê salekê-duduyan di biniya me re, ev roman bi min re dît û keniya. Kurrikekî zirav î esmer bû, ne şaş bim kurdekî ji alî Serhedê bû; bavê wî mele bû û ê wî jî meraqa wî li ser kitêbên derbarê ateîzmê de bû. Rahişt romanê, hinekî li navê nerî û cardî danî şûna wê û tiştek got. Gotina wî wek îro di bîra min de ye: "Dizanî çawa, li gund dema em zarok bûn me digot "Selman Ruştî, qûn neşuştî!""

Nexwe heta bi zarokên nexwende ên gundên Kurdistanê jî nivîskarekî ku min hînê teze bi îngilîzî dixwend nas kiribûn! Çawa dibû?!

***Kitêb li dijî kitêbê***


Roja evîndaran (St. Valentin's Day) a 1989an ji BBCyê telefonek ji Salman Rushdie re hat. Kesê ku telefon dikir ji Salman Rushdie dipirsî ku gelo ew çawa his dike li hember cezayê kuştinê ê ku lê hatiye birrîn. Salman Rushdie şaş mabû û cara pêşî bi rastî tirs ketibû dilê wî. Wê rojê, 14ê Sibatê, Ayetullah Xumeynî fetwayek dabû û tê de ev ferman dida her Şi'îyekî xwedî bawerî: Kuştina Rushdie, weşangerê wî û herçî kesê beşdar bû di weşandina kitêba wî ya bi navê *Ayetên Şeytanî (The Satanic Verses)* de. Tiştekî ku kesî bawer nedikir pêk hatibû û bi fetwaya şîrovekarê kitêbekê fermana kitêbeke dî, nivîskarê wê û alîkarên wî hatibû rakirin.

Ne ku Rushdie xerîbê reaksiyonên tund ên li hember kitêbên xwe bû. Berê Serokwezîra Hindistanê Indira Gandhi doz lê vekiribû ji ber hin peyvên wî ên di *Zarokên Nîvê Şevê* de û Pakistanê jî romana wî ya bi navê *Rûreşî (Shame)* qedexe kiribû, a ku behsa jihevqetandina Hindistan û Pakistanê dikir. Lê ti yek ne bi vê ecêba romana wî ya dawî, Ayetên Şeytanî, bû. Rushdie pênc salan li ser vê romanê şixulîbû û dixwest bi qandî romana xwe ya pêşî, *Zarokên Nîvê Şevê*, deng bide. Fikra vê romanê hê ji salên wî yên ku li Cambridgeê beşa Xebatên Îslamî dixwend pê re çêbûbû. Wê demê di hin çavkaniyên Îslamî de dîtibû ku pêxemberê Îslamê di hin wehiyên pêşî de behsa hin xwedayên dî jî dikir ku wê demê li Mekkeyê dihatin hebandin û perestin û hebûna wan digel a 'Ellah' qebûl dikir. Lê piştre di hin wehiyên dî de ev yek hatibû redkirin û Mihemmed ev yek wiha şîrove kiribû: Di wan wehiyên pêşî de şeytan ketibû dilqê melekê Cibraîl û ew xapandibû. Lewma ew ayet ayetên şeytanî bûn û hatibûn jinavbirin. Rushdie vê bûyera ku hin zanayan neqil dikir bi wê yekê girêdida ku Mihemmed pêşî xwestibû ehlê Mekkeyê bi temamî ji xwe sil neke û berê malmezinên wan nexe xwe, ji bo wê yekê di destpêkê de cî dabû baweriya wan jî.

Salman Rushdie vî pelê kêm tê zanîn û axaftin ê di dîroka îslamê de hilbijart û kir mijareke romana xwe ya ku di esasê xwe de çîroka du aktorên Hindî ên ku ji welatên xwe reviyabûn vedigot. Mebesta Rushdie ji vê hilbijartinê ew bû ku du tabûyan bişikîne: Tabûya qalkirina jiyana pêxember wek kes, nebûna nîqaşê li ser dîroka îslamê. Rushdie di wê baweriyê de bû ku ji bo ku jiyaneke çandî a dînekî hebûya diviya nîqaşên rewşenbîrî tê de hebûna. Herçiqas roja piştî fetwayê Rushdie di televizyoneke Brîtanî de daxuyand ku xwezî ew di kitêba xwe de "hîn bêhtir rexnegir bûya" jî, kitêba wî ji nîqaşan bêhtir êrîş rakirin û pêleke tund dest pê kir.





> Ne ku Rushdie xerîbê reaksiyonên tund ên li hember kitêbên xwe bû. Berê Serokwezîra Hindistanê Indira Gandhi doz lê vekiribû ji ber hin peyvên wî ên di *Zarokên Nîvê Şevê* de û Pakistanê jî romana wî ya bi navê *Rûreşî (Shame)* qedexe kiribû, a ku behsa jihevqetandina Hindistan û Pakistanê dikir. Lê ti yek ne bi vê ecêba romana wî ya dawî, *Ayetên Şeytanî*, bû.











> *Zarokên Nîvê Şevê* di tekstên ku min dixwendin de ji alegoriya netewî bigire heta bi rasteqîniya efsûnî bi gelek rengan hatibû şîrovekirin. Salman Rushdie dema li Brîtanyayê di karê nivîsandina tekstên reklamê dikir, rojê sê-çar saetan li ser vê romanê xebitîbû û ew nivîsandibû. Evê romana duyem a Rushdie ji nişka ve gelekî populer bûbû û navê wî belav kiribû.



## Wan sê rojên ku naqedin

Ayetên Şeytanî 28ê Îlonê, ji alî weşanên Penguinê li Brîtanyayê çap bû. Digel ku şaxa vê weşanxaneyê li Hindistanê jî hebû ji ber fikaran kitêb li wir çap nebû û çapa Brîtanyayê şandin wir. Misilmanên ku li Brîtanyayê dijiyan û bi kitêbê hesiyan demildest ew yan fotokopiyên wê ji hevdu re, ji mizgeftan re, ji şêx û melayên xwe re, saziyên dînî û ayînî re şandin û giliyê wê kirin. Li Hindistanê jî nerazîbûnan dest pê kir û zûka veguherî bûyereke civakî. Serokwezîrê Hindistanê ji tirsa ku dengê 100 milyon misilmanên li welatê xwe di hilbijartina sala bê de winda bike kitêb qedexe kir û peyderpey li deh welatan kitêb hat qedexekirin. Li Pakistanê ji girseya nerazî a ku meşiya Konsulxaneya Amerîkî pênc kes mirin, bi sedan birîndar bûn. Li bajarên Îngiltereyê komên misilmanan derdiketin kolanan, kitêb dişewitandin û dirûşme didan ji bo qedexekirina kitêbê û qetilkirina Salman Rushdie. Piştî ku mesele hat di vir re derket Ayetullah Xumeynî jî bi kitêbê hesiya û fetwayek da ku bi wê re di çavê misilmanên protestoker de bû qehremanekî dînî ê li dijî cîhana Rojava.

Salman Rushdie wê rojê neçû malê. Jina wî ya Amerîkî eşyayên wî yên sivik girtin û tevî zarokê wan ê neh salî ji malê derketin. Asayiş û istîxbarata Brîtanyayê parastina pileyê bilind ji bo vî hevwelatiyê xwe derxist û jiyana wî ya veşartî dest pê kir. Rushdie jî wek gelek kesan di wê baweriyê de bû ku ewê komediya sedsala bîstan sê roj şûn de dê biqede, lê ew sê roj bûn 88 roj û di vê maweyê de 57 xanî guhertibûn ji bo ku xwe veşarta û şopa xwe winda bikira.Roj bi roj hêviyên wî jî qelstir dibûn. Dewleta Îranê bi kuştinên siyasî ên li welatê Ewropayê nav dabû, dê pey Rushdie jî bernedaya. Wergêrê kitêbê yê Îtalyanî bi kêran hat birîndarkirin, wergêrê wê yê japonî li ofîsa xwe bi kêran hate kuştin, weşangerê wê yê Norwecî sê derb ji pişta xwe xwarin û hate kuştin, serokê cemaetekê û melayekî li Belçîkayê ku li dijî fetwayê axivîn hatin kuştin. Rushdie derket televizyonê lêborîn xwest, careke dî derket li ber xelkê got ku hatiye ser baweriya îslamê û bi tiştên wê yên sereke ên mirovî re hemfikir e, lê ti yekê fêde nekir û fetwa li ciyê xwe ma, bi 3 milyon dolarên ku Xumeynî ji bo serê wî kiribû xelat.

## Dawî dawî ye gelo?

Rojek hat Xumeynî jî mir, lê kesî fahm nekir ku vê yekê rewşê baştir dikir yan xerabtir dikir. Piştre eyan bû ku bi mirina Xumeynî re hukmê fetwayê betal nedibû û fetwaya ku wî dabû ancaq wî xera bikira. Bi vî rengî jiyana wî 9 sal û 7 meh û 10 rojan bi rev, tirs û veşartinê derbas bû, heta roja ku wezîrê karên derve ê Îranê li Amerîkayê, piştî hewldanên dijwar ên dîplomatîk, ragihand ku gefa li hember nivîskar hatiye bidawîkirin û dewleta wan dê li dijî nivîskarê *Ayetên Şeytanî* nekeve tevgerê.

Vê mahkûmtiya bi rev û veşartinê tiştekî dî tev li nivîskariya Rushdie kir: Navekî dî. Rushdie vê maweyê bi navê Joseph Anton (*Joseph* Conrad – *Anton* Çehov) jiya û weku ew kesekî dî be bîranînên xwe nivîsand. Herçiqas îro S. Rushdie ji berê azadtir dijî û rihettir dikare bigere jî, gefên li ser kêm nabin. Di 2005an de Xamaney, Ayetullahê nû, ragihand ku fetwa hîn li ciyê xwe ye. Di 15ê Sibata 2016an de, di salvegera fermana serê wî de çil dezgehên çapemeniyê ên Îranê ragihandin ku wan 600 hezar dolar zêde kiriye li 3 milyonê ku Xumeynî kiribû xelat ji bo kuştina Rushdie.

# Pembûyê Rihayê bi qelîte û paqijbûna xwe balê dikişîne



GÖNÜL GÜN

Li bajarê Rihayê çandiniya gelek mehsûlan tê kirin. Cotkarên pembû yên Rihayê destnîşan dikin ku li Rihayê ji ber ku him pirsgirêka avê hinekî çareser bûye him jî cotkarî bi awayê profesyonel tê kirin, her ku diçe cotkariya pembû jî pêş dikeve. Em wek Heftenameya Basê bi cotkarê Kurd Diyar Badem re li ser çandiniya pembûyê Rihayê axivîn.

**Pembû mîna zarokan e û eleqeyê dixwaze**

Diyar Badem destnîşan dike ku ew ji zaroktiya xwe heta niha, di zeviyên pembûyê de mezin bûye û niha bi awayekî profesyonel cotkariya pembû dike. Badem di derheqê danîna pembû de wiha diaxive, "Pembû germê gelek hez dike. Riha li gorî pembû cihekî hinek sar e û ji ber vê jî heta ku hewa baş germ nebe pembû nayê danîn. Li gorî cî û deverên Rihayê destpêkirina danîna pembû ji hev cuda dibe û heta di nava deverên gelek nêzîk de ji aliyê germê ve ferq çêdibe. Di hin cihan de, serê meha Nîsanê di hin cihên din de jî di dawiya Nîsanê de pembû tê avêtin."

Badem dibêje li Rihayê hewa li gorî pembû dereng germ dibe û barîna şiliyê jî zû dest pê dike û ev yek bo cotkarên pembû zehmetiyê çêdike. Her wiha pembû an bi destan an jî bi makîneyên dirûnê tên berhevkirin. Ber bi dawiya meha Îlonê pembû tên derman kirin ku qozeyê pembûyê vebin û Badem wiha pê de diçe, "Ger hewa zû germ bibe ev yek dibe sedem ku pembû jî zû bigihêje. Ji ber vê, li hin deveran wekî 10 an 20 rojan berhevkirina pembû zû dest pê dike. Lê belê hema dora meha Îlon û Cotmehê pembû tê berhevkirin. Wekî din, di germê de ev buxikên ku zirarê didin pembûyê wek 'pîrhevoka sor, kurmê kesk û buxika trips' zêde nikarin nêzikî pembû bibin û bi vî awayî zirarê nadin pembû"

Li Rihayê ji bîlî gelek mehsûlan, cotkariya pembû jî tê kirin. Cotkarên Kurd dibêjin her ku diçe pembûyê Rihayê balê dikişîne û pembû ji derveyî bajêr re jî gelek tê firotin.

Badem tîne ziman ku berhevkirina pembû li Rihayê bi qasî mehekê dajo. Pembû bi du şiklî tê berhevkirin; yek bi riya kesan ya din jî bi riya makîneya dirûnê tê berhevkirin. Badem dibêje, bi destê merivan pembû bi awayekî paqij bê berhevkirin gelek baş e lê ger paqij neyê berhevkirin, ev yek dibe sedem ku di dema firotinê de, pembû erzan bê firotin. Lê belê makîneya dirûnê bi tenê nava pembû hildide û pembû dike balya ( her balyayekî pembû 10 ton e) û bi fanê dibe depoyê û bi makîneya dirûnê pembû gelek paqij tê berhevkirin.

Badem rave dike ku piştî pembû hat çandin ji pembû re eleqe pêwîst e. Ji ber ku pembû naşibe mehsûlên din, mîna zarokan eleqeyê dixwaze û divê hema her roj bikevî nav zêviyên pembû û avdana wê baş bikî, bo buxikan pembû derman bikî û gihayên din paqij bikî. Yanê cotkariya pembû wisa bê kirin, dê bikaribin hilberîneke baş bê bidesxistin. Piştî ku pembû hat berhevkirin dibin fabrîqayan. Ger pembû bê ecibandin û cotkar û xwediyê febrîqayê li hev bikin, pembû tê firotin an jî di febrîqayan de, bo demekê tê veşartin û heta hin cotkar pembûyê xwe heta salekê bi vî awayî vedişêrin. Badem amaje dike ku pembû li gor hisabê kîloyê tê firotin. Par kîloya pembû 3 Lire bûye. Cotkar hêvî dikin ku îsal kîloya pembû bibe 4 Lîre. Dîsa par tonek pembû ji 2,5an heta 5 hezar Lîreyan hatiye firotin û cotkar îsal jî li bendê ne ku tona pembû bibe 3-4 hezar Lîre. Badem dibêje ger cotkariya pembû baş bê kirin wê demê ji pembûyê meriv dikare him debara xwe bi rehetî bike him jî zêdetir pere qezenc bike.

**Cotkar li bendê ne ku îsal bihayê pembû zêde be**

Badem diyar dike piştî ku av hat Sirucê ( Pîrsûsê) li wir jî niha pembû tê çandin, li gel vê êdî her deverên Rihayê cotkariya pembû tê kirin. Berê li deşta Herranê pembû dihat çandin lê belê ji ber ku cotkarî bi awayekî baş nehat kirin, yanê av zêde dan pembû, zeviyên Herranê şorax bûne û li wir niha bi tenê genim û nîsk tê çandin.

Li gor cotkarê Kurd Badem, her ku diçe bo pembûyê Rihayê eleqe zêdetir dibe. Dê îsal jî bo pembûyê eleqeyek baş çêbibe û pembûyê Rihayê bo derveyî bajêr jî gelek tê firotin. Badem balê dikişîne ser cotkariya bi pisporî û dibêje her ku diçe cotkarên Rihayê baştir çandiniya pembû dikin. Bi vê yekê re pembûyê Rihayê baştir dibe û di pîyasayê de cihekî baş digire. Badem wisa axaftina xwe didomîne, "Pembûyê Rihayê him ji ber qelîteya xwe him jî ji ber paqijbûna xwe balê dikişîne û pembûyê Rihayê ji yê Edeneyê derbas kir. Ez bi xwe bi cotkarên pembû yên Edeneyê re di têkiliyê de me û ew jî têne pembûyên me dibînin û diecibînin." Badem dibêje niha li Rihayê herî zêde cotkariya pembûyê Rihayê, Kurd dikin û Kurd cotkariya pembû baş dikin.

Badem, li ser pirsgirêkên cotkarên Rihayê jî wiha diaxive, "Pirsgirêka herî mezin ji bo me ev e ku gelek caran av û ceyran tê birin. Ev yek jî ji bo me tiştekî ne baş e. Jixwe 3 roj ceyran nebe ji sedî 50î mehsûlên me zirarê dibînin û pembûyê me jî ji vê yekê zirarê dibîne. Ev rewş, me gelek aciz dike çimkî him em zêde kedê didin pembû him jî debara me ji pembû dibe. Ev nêzî 2 meh e ku ez beriya 12 şevan neçûme malê. Ger ku em keda heqê xwe nestînin em gelekî aciz dibin. "

## Îsal jî Şino paytexta gêlasên Îranê ye

DIYAR BUCAK

Salane nêzî 18 milyon ton gêlas li cîhanê têne berhemanîn. Îran bi qasî 225 hezar tonan ji wan 18 milyon tonan berhem tîne.

Tirkiye di asta yekemîn de ye û Amerîka jî di asta duyemîn de tê. Ev çendîn sal in ku ev amar û data berê dimînin. Herqasî ku Tirkiye, Amerîka û Îran di astên yekem heya sêyemîn de ne, lê hewlên wan ji bo pêşketinê xurttir jî dibin. Lê belê Îtalya û Spanya di astên çarem û pêncem de ne û dewsên xwe hin salan diguherin.

**Berhevkirina gêlasên Şinoyê rengekî din dide bajêr**

Bajarê Şinoyê li Rojhilatê Kurdistanê bi berhemanîna hezar û 148 tonên gêlasên klas yek, weke paytexta gêlasê li Îranê tê binavkirin. Di festîvala gêlasan de li bajarê Şinoyê, her sal gelek ji saziyên bazirganiyê yên gêlasan ji navçeyên cuda û hin berpirsên dewletê weke nûnerê taybet yê serokkomarê Îranê jî beşdar dibin. Di deh rojên derbasbûyî de jî li Şinoyê car din ew festîval bi germî hate pêşwazîkirin. Gelek geştiyar jî berê xwe didin wî bajarî û diyariya wir ku gêlas e, bi xwe re dibin.

Her sal di meha sêyem ya biharê û meha yekem ya havînê de gêlas têne berhevkirin. Berhevkirina gêlasên Şinoyê di 55 rojan de rengekî din dide bajêr. Ew gêlas ne tenê li Şinoyê û li parêzgeha Urmiyê tên firotin belkî ji bo tevahiya Îranê û welatên din jî têne henardekirin.

**5 hêlên berhemanînê tên avakirin**

Ji xeynî xwediyên bax û rezan, gêlasên Şinoyê ji bo 7 hezar kesan bi awayekî rasterast û ji 3 hezar kesan re bi rengekî nerasterast derfetên kar çê dikin. Esed Xizrî qayimqamê Şinoyê dibêje bajarê ku nêzîkî ji sedî 12 gêlasên hemû Îranê bi berhem tîne, hêjayî girîngiyeke zêdetir e. Ji bo vê armancê jî, wan soza avakirina navendeke taybet bi veqetandina cureyên gêlasê ji berpirsê nivîsîngeha serokkomariyê standiye. Biryar e ew navend, 5 hêlên berhemanînê li başûr, rojhilat û rojavayê Şinoyê li xwe bigire.

Axa Şinoyê taybetmendiyeke wê ji bo berhemanîna gêlasan heye. Hemû cureyên yek dindik, reş, penbeyî, zer, sor, huşî û



Her sal di meha sêyem ya biharê û meha yekem ya havînê de gêlas têne berhev kirin. Berhevkirina gêlasên Şinoyê di 55 rojan de rengekî din dide bajêr. Ew gêlas ne tenê li Şinoyê û li parêzgeha Urmiyê û bo derveyî Îranê jî tên hinarde kirin.

yên ku zû digêjin, li navçeyê bi hêsanî bi berhem tên û ev jî dibe sedem ku Şino bibe paytexta gêlasên Îranê.

Ji tevahiya 293 hektar ji bax û rezên gêlasan li Şinoyê, tenê 148 hektar ji wan têne bikaranîn. Sedem jî vedigere ser nebûna piştevaniya wezareta Çandiniyê. Di du salên derbasbûyî de asta berhemanînê li wir tenê ji sedî 6 zêde bûye. Lê niha Yekîtiya Berhemhênerên Gêlasan li Şinoyê 261 endam hene ku wezareta Çandiniyê hewl dide karûbarên wan organîze bike.

Niha ji her hektarek erd, bi qasî 8 tonan gêlas têne berhemanîn.

**"Xwarinên Kurdî, kinc û mûzîka Kurdan jî hebûn"**

Îsmaîl Kerîmzade rêveberê giştî yê saziya Hewlên ji bo Çandiniya Îranê di festîvalê de beşdar bû û ragihand ku parêzgeha Urmiyê bi berhemanîna zêdetirî 7 hezar tonên gêlasê di salekê de, ketiye dewsa Qezwînê ku çendîn salan weke paytexta gêlasên Îranê dihate binavkirin. Di festîvalê de herwisa odeyên taybet bi xwarinên Kurdî, kinc û mûzîka Kurdan jî hebûn.

Beriya niha Qezwîn, Simnan, Tewrêz, Tehran, Hemedan û Luristan şeş parêzgehên herî pêşiyê di warê berhemanîna gêlasan de bûn. Heya deh salan beriya niha Qezwînê asta yekemîn ji xwe re misoger kiribû lê niha dewsa xwe daye Şinoyê.

**Poyansiyel zêde ye, pêşketin lawaz e**

Tevî asta sêyemîn ku Îranê di cîhanê de di warê berhemanîna gêlasan de heye, lê pêşketinên wê gelek lawaz in. Tirkiye ku di asta yekemîn de ye, her sal jî bi pêş dikeve. 10 salan berî niha ku Îranê bi dijwarî karî asta sêyemîn car din ji xwe re misoger bike, Tirkiye bi qasî ji sedî 10 bi pêş ketibû û ev jî nîşan dide ku heke wezareta Çandiniyê ya Îranê hewlên xwe ji bo piştevaniya cotkar û xwediyên bax û rezên gêlasan xurttir neke, dibe ku asta sêyem ji dest bide. Sedem jî ev e ku asta pêşketina Îranê di warê berhemanîna gêlasan di wan 10 salan de tenê bi qasî ji sedî 50 bi pêş ketiye ku para hin salan gelek kêm bû û piraniya erdan jî vale mane.

Rast e ku Îran di asta sêyemîn ya cîhanê de ye, lê welatên din di her hektarekê de nêzîkî 20 tonan berhem tînin lê belê Îranê heya niha jî nekariye bigihêje wê astê.

Hilberînerên masiyan:

## Bo debarê em rêyên cuda diceribînin



DARA PORXELEK

Li Bakur, cotkar ji bo debara xwe rêyên cûr bi cûr diceribînin. Yek ji van cotkaran jî Tahir Erdal e ku li Sasona navçeya Batmanê tesîsa masiyan vekiriye û ev du sal e hilberandin û firotina wan dike. Tahir Erdal ji Heftenameya Basê re di derbarê tesîsa masiyan de axivî.

**"Bi bazar û hilberandina îro debar nabe"**


Tahir destnîşan dike ku tesîs di sala 2014an de ava kirine û ev proje ji bo dahatûyê ye û wiha pê de diçe: "Bi bazar û hilberandina îro debar nabe. Berê dewletê ji bo kîloyek masî lîreyek alîkarî dida, niha ew alîkariya xwe jî nîvî kiriye û êdî bi qurişan dide." Tahîr bersiva pirsa me ya gelo hilberandina masiyan çawa ye, wiha dide: "Di meha Mijdarê de em ji Bedlîs, Elezîzê têjikan tînin û heta meha Adarê di tesîsê de xwedî dikin. Ji ber ku di meha Hezîranê de ava me germ dibe em nikarin li vir hilberandina têjikan bikin. Dema gihîştin asta xwarinê em dest bi firotina masiyan dikin. Eger em di zik hev de bifiroşin mehane 7-8 ton masî difiroşin. Lê belê bi piranî em bi kîloyan diforişin mişteriyên kesane, ev yek jî hilberandina masiyan gelekî kêm dike."

**"Em daxwaza alîkariyê dikin"**

Tahir Erdal axaftina xwe wiha berdewam dike: "Em di heman demê de cotkariya titûnê jî dikin. Eger debara me tenê bi karekî bibûya me yê di ber da tade neda xwe û bi karên din re jî xwe neêşanda. Bi rastî jî dewlet dibêje em ji bo 'Pêşketina cotkariyê' alîkarî didin cotkaran lê bi vî awayî cotkaran jî dixe binê deynan û dev jê berdide. Cotkar bi neçarî li pey wî pereyê xwe ku xistiye van projeyan diçe û hin karan dike. Em ji dewletê daxwaza alîkariyê dikin. Bila piştgiriya xwe ya destpêkê bidomîne."

**"Rewşa siyasî xweş bibe, rewşa bazirganî û cotkariyê jî dê baş be"**

Erdal di dirêjiya axaftina xwe de dibêje ew bi malbata xwe ve bi vî karî mijûl in û radigihîne ku di dema proseya çareseriyê de rewşa wan jî baş bû. Erdal wiha dibêje: "Em bi malbatî (5 kes) pê re mijûl in. Bi zorê debara me dibe. Di dema proseya çareseriyê de rewş gelekî baş bû. Rojane ji tonekî zêdetir me firotina masiyan dikir. Kîloya masiyan, di zik hev de 8 lîra û kîlo bi kîlo jî bi 10 lîrayan em difiroşin. Eger rewşa siyasî xweş be rewşa bazirganî û cotkarî jî dê baş be. Em masiyên xwe dişînin Batman, Diyarbekir û Bedlîsê."



Qotê Berçem:

# Li ser milê çemê Dîcleyê dîrokeke bêhempa



JÎN MAZÎ

Dîrok rêberê pêşeroja netewan e. Ji bo pêşveçûnê divê ewil mirov xwedî dîrokekê be. Ji wan dîrokan yek jî Qotê Berçem e (Çayönü) ku gelek bermayiyên dîrokî li wê derê derketiye holê. Qotê Berçem 7 km dûrî navçeya Erxaniyê di sînorê gundê Hilarê de, li ser milê çemê Dîcleyê ye . Li gorî lêkolînên arkeolojîk di navbera salên 8.000-7.000î de di serdema neolîtîk de yekem gundê ku ji jiyana koçberiyê derbasî jiyana gundîtiye bûye ye . Di salên 1964î de Halet Çamlibel û Robert J.Braidwood di çarçoveya projeya bi navê "Beriya Dîroka Têkel Rojhilatê Başûr"' li Qotê Berçemê 17 salan vekolînên arkeolojîk kirine û di encama van vekolînan de ev dîroka bêhempa derketiye holê. Vê xebatê heta sala 1991an dom kiriye. Piştre ji ber sedemên ewlehiyê arkeologan navber dane xebatan lê di salên dawîn de dîsa dest bi vekolînan kirine. Ev lêkolînên arkeolojîk û encamên wê, ne tenê ji bo Mezopotamya ji bo çanda mirovahiyê û dîroka cîhanê jî cîhekî girîng digire.

Di heyamên ewil de komên li Qotê Berçem, komên nêçîrvan bûne. Li gor lêkolînan bi awayekî hindik be jî nebat tê dîtin û ji bo xwarinê tene hatiye çandin. Avahiyên ku weke Hûcre tên zanîn di qonaxa dawîn ya serdema Qir û qafên Neolîtîk de êdî ew kom derbasî qonaxa cotkariyê bûne, mîh, bizin, dewar û beraz û herwiha ajalên çewlîgan xwedî kirine û çandiniya genim, nîsk beqleyan kirine. Di encama lêkolînan de tê dîtin ku ji nêçîrvanî-berhevkariyê derbasî çêkirin û xwarinê ya gundîtiyê bûne.

**Gelên Qotê Berçem çawa derbasî jiyana gundîtiyê bûne ?**

Li gor zanyariyan dema demsal ji serdema qeşayî derbasî ya nermayî bûye demsala li Rojhilata Navîn tene û beqle û cûreyên wê li qadên fireh belav bûne. Herwiha nebatên nû şîn hatine  û ev yek li ser komên nêçîrvanî û koçberan bandor kiriye. Ev bûye sedem ku kesên li wir dijîn dev ji jiyana koçberiyê berdin û li wir bi cîh û war bibin. Destpêkê beqle û cûreyên wê teneyên kovî di embaran de hatine veşartin. Ev jî ji bo xwarina komên wiha cihekî girîng digire. Di heyama navîn de, tê dîtin ku beraz hatiye kedîkirin. Yekem ceribandina çandiniyê hatiye destpêkirin û herwiha mîh û bizin jî hatine kedîkirin.

Balkêştirîn tişta ku di encama lêkolînên li ser  Qotê Berçem de hatiye dîtin ev e; beriya ku qir û qaf bê dîtin, Beriya Mîladê di 9 hezarî de kesên wir dema ku fêm kirine baqir dema tê sincirandin mirov dikare şikil bide, alavên baqirî yên di cîhanê de herî kevn li Qotê Berçem hatine bikaranîn. Herwiha kevirê heste, obsidyenê ku ji çiyayên Çewlîgê anîne, alavên xemlê yên ku weke asta civakî tên nîşandan hatine çêkirin.

**Qotê Berçem di warê jiyanê de di pêşiya Ewropayê de bûye**

Li Qotê Berçem di serdema Neolîtîk Bê Qir û Qaf mirov dikare behsa çînên civakî bike. Cara yekem civakên Anatolîa çar demsalan li heman cîhî jiyane ev jî jiyana gundîtiyê bûye. Di heman dîrokê de hevçaxên mirovên Qotê Berçem jiyana xwe di şikeftan de didomandine, haya wan ji cîhûwarbûna gundan tunebûye. Di heyamên ewil yên Rojhilatanavîn û Ewropayê de gelên li vir, di warê çandê de her tim çend hezar sal li pêşiya Ewropayê bûn. Hîn di wan deman de civakên wê demê di pêşiya Ewropayiyan de bûn, lê niha cîhê ku jiyan lê dest pê kiriye çawa dibe li pêy Ewropa maye? Ev mijar jî divê mirov li ser hûr bibe û lêbikole.

Li Qotê Berçem jiyan, demsal û xweza ne wek niha bûn. Av, erdên bi bereket ji bo çandiniyê cîhekî gelekî baş bûne. Li gel ajalên ku li ser erdê dijîn herwiha di encama vekolînan de hestiyên masiyan jî hatine dîtin.

**626 hestiyên mirovan di encama lêkolînên arkeolojîk de hatine dîtin**

Bi saya lêkolînên ku heta salên 1992an dewam kirine, arkeologan xwe gihandine 626 hestiyên mirovan. Eger ku ji ber sedemên ewlehiyê lêkolîn nehatibana rawestandin ev hejmar dibe ku zêdetir bûya. Di nav van hestiyên hatine dîtin de, di her temenî de mirov hene. Li Qotê Berçem jinên ku beriya 30 saliyê jiyana xwe ji dest didin. Sedema vê jî wer tê texmîn kirin ku dema jin ducanî dibin û dema zarokan tînin dimirin. Di nav mêrên wê demê yên di heman temenî de jî metirsiya mirinê hebûye.

Li gor lêkolînan tê gotin ku mirovên ji Qotê Berçem ji Deryaya Spî bûne. Pozê wan teng û biniçik pişta pozê wan rast, rûyê wan jî teng û dirêj bûye. Herwiha mirovên zirav û nazik bûne. Di Heyama Kevirê Sîqalkirî, şoreşa kulturî de yekem civakên cihûwarbûna gundîtî, çandinî dane destpêkirin civakên Deryaya Spî ne.

**Gelên Qotê Berçem miriyên xwe çawa vedişartin ?**

Di qonaxên berê yên Qotê Berçem de kesên ku jiyana xwe ji dest didan di bin malên xwe de dihatin veşartin. Bi awayekî tewandî çongê wan dikişandin ber sînga wan, destên wan jî li ser rûyê wan bû. Di heyamên ewil de dema miriyên xwe binax dikirin ji bilî boyaxa derziya sor tiştek bi miriyan re binax nedikirin. Di heyamên pêş de meyt dîsa bi hawê tewandî hatine binaxkirin. Di heyama herî dawî de ji ber ku di avahiyekê de 70 qoqên serî hatine dîtin ev nav li vê heyamê kirine "Avahiya Qoqê Serî" .

Ji bo gelên Qotê Berçem mirin têgeheke cûda ye. Ev mirina ku em dizanin û ya wan gelekî cûda ye. Baweriya wan bi tiştên bêrih jî hebûye. Di heyama Neolîtîk de gelê vî gundî kesên ku ji malbata wan jiyana xwe ji dest didan bi ayînên pêşiyên xwe serê wan ji laşên wan jê dikirin û ew serê jêkirî bi boyaxê dixemilandin û li malê vedişartin. Ji ber ku di vekolînan  de qoqên serî di malan de hatine dîtin navê wan kirina avahiyên qoqê serî. Di qonaxa dawîn a Avahiya Kevirên Raxistî êdî meytên xwe kirine bin malên xwe. Di heyameke din de jî hatiye dîtin ku carinan miriyên xwe bi tenê binax kirine carinan jî goristanên komî çêkirine. Gelek caran jî bi diyariyan goristanên wan xemilandine.

Avahiyên Taybet yên Qotê Berçem

Yek ji avahiyên din ên li Qotê Berçem Avahiyên Gilover û bi plan in ku ev avahî di qonaxên pêş de bi sîstemeke taybet a lêkirina dîwaran bikar anîne; stûnê textînî û bi heriyê dîwar lêkirine, erdê xaniyên wan jî ser keviran şaxê daran pêçane û bi heriyê seyandine. Bi vî awayî di bin erdê re her tim hundirê malê wan hewadar bûye. Rewaya ku dibû sedema hewaya nexweş pêşî lê hatiye birîn bi vê sîstemê. Di qatên jor yên vê qonaxê de avahiyên bo miriyên wan hene.

Gelên li Qotê Berçem jiyane di heyama Avahiyên bi Heybet ên bi plan cara yekem dîwar bi kerpîçan seyandine. Herwiha di vê demê de di encama lêkolînan de tê dîtin ku bi kêlên xemilandî yekem qada bajêr ya 50 metreyî hatiye avakirin. Li gor texmînên arkeologan ev qada ku hatiye avakirin di heman demê de ji bo ayîn û merasîman jî hatine bikaranîn, herwiha dora qadê jî bi avahiyên bi heybet yên ku ji heyamên taybet mane hatiye dorpêçkirin.

## Şikeftên Hilarê

Şikeftên Hilarê jî nêzî Qotê Berçem e. Ev şikeft li Rojhilatê gundê Hilarê ye û 7 km dûrî Erxaniyê ye. Li dora şikeftan gor hene ku di zinaran de hatine çêkirin. Li ser van goran wêne hatine xêz kirin û ew wêne bi şêwazên eyaletên Romayê hatine çêkirin. Cil û bergên di wan wêneyan de li gor lêkolînan, weke yên Îranê ne. Ji nivîsên li ser mezelan hatine nivîsandin tê fêmkiirn ku ev nivîsên Samiyên Bakurê Suriyeyê ne. Her du nivîs jî di encama vekolînên di çarçoveya Qotê Berçem de hatine dîtin. Yek ji balkêştirîn cih jî Mabeda Şemsiyan a ku tavê pîroz qebûl dikin e. Ev mabed-zinarên kûr weke kevanê ne. Di navîna vê kevanê de cihên rûniştinê rêz bi rêz li kevir hatine kolan û bi vî awayî ev cih hatiye çêkirin. Ya girîng jî ev e; kesê ku li van cihan rûdinin her tim rûyê wan li tavê ye. Ji xeynî van cihan Şikeftên Xan, Gorên Vekirî û Gora Qralê Ermeniyan Sarkis jî heye. Ev cihên ku bi dîrokê hatine pêçandin divê teqez bên dîtin.

## Alavên hatine bikaranîn

Ji ber erdê deşta Erxaniyê gelek alavên ku hatine bikaranîn winda bûne û ketine nav axê. Lê di lêkolînên arkeolojîk de kevir, hestî, qalik, diran kevirên baqir hatine dîtin. Yekem niştecîhên vî gundî salyangozên ji nav avê berhev kirine berazên ku xwarine, diranê wan yê tûj yê pêş gilover kirine û xistine stûyê xwe weke alavên xemlê. Bi wextê re kevirên çargoşe û sêgoşe qul kirine, bêhtir şiklên geometrîk bikaranîne. Gogên ji kevir, peykerên ajal û mirovan jî çêkirine. Ya ku bala mirov dikişîne yek jê jî ev e; peykerên jinan jî hatine çêkirin. Arkeolog sedema vê jî wiha vedibêjin; Hebûna peykerên jinan nîşan dide ku hîn ji wê deme îbadetê ji xwedawenda serekî dikin. Ji bo zeftkirina masiyan jî torên xwe bi kevir girêdidane û carinan jî bi torên hestî masî girtine. Ji bo kolandina erdan jî bivirên ji kevir bikaranîne. Ji bo serma zivistanê jî ji bo germahiyê bi bivirên kevir êzing jê kirine. Ji darên ku jê kirine carinan jî alavên textîn çêkirine. Li malên dewlemendan kevirên lîstokê jî hatine dîtin.

## Nexweşiyên wê demê

Li gor lêkolînên ku li ser 402 kesî hatine kirin tê dîtin ku mirovên Qotê Berçem di temenên ciwan de mirine. Di wê demê de zarok pir zû dimirin, sedema wê jî ew bû ku nexweşiyên mîkrobîk zû belav dibûn. Yek ji nexweşiya ku hatiye dîtin tîmora guhan, ji van yek jê jin yek jî mêr bûye ji ber vê nexweşiyê mirine. Herwiha hin zarokên ku wê demê mirine, ji ber menenjîtê mirine. Bejna kesên wê demê jiyane ya mêran 170 cm ya jinan 157 cm bûye.

